# BERNAMEGEH

KOVARAKE AZAD, SERBIXWE, BÊTEREF Û XELKÎ



Çavdêriyên Rojnamevanekî
**HELÎM YÛSİV**

Destana Rizgan û Nûrê
**OCCO MAHABAD**

Zeynelabidîn Fanî
**SEÎD VEROJ**

SAL 1 HEJMAR 3 • 2021

# Dİ VÊ HEJMARÊ DE

## Jİ EDÎTOR

Di vê hejmarê de gellek nivîskar bi gotar û helbestên xwe yên rengîn ked dane kovarê. Divê em fêm bikin ku her kovar bi zehmetiyên mezin derdikevin û tên sifreya ber hişê we. Sed heyf û mixabin Kurdên me qedrê kovarên xwe nizanin û lê xwedî dernakevin. Nêzîkî 15 heb kovarên Kurdî îro ji bo pêşketina çand û hûnera Kurdî hewl didin. Ev bixwe serkeftinek e lazim e ku em van nirxên xwe biparêzin û lê xweyî derkevin.

Îro em dibînin ku dijminê Kurdan dîsa Kurd bixwe ne. Dibe ku fikr û armancên we ji hev cudatir bin lê ev nayê vê wateyê ku hûn ê dijminê hev bin. Kurdên me divê hev qebûl bikin û ji hev re rêz û hûrmet nîşan bidin.

Gerek e em pirsgirêkên xwe bêyî heqaret û biçûkxistinê bi rêya diyalogê çareser bikin. Heke di civatekê de şexsên kemilî tunebin civateke kemilî jî peyda nabe. Em wek Bernamegeh girîngiyê didin demokrasî û demokratîkbûnê ji ber ku di civatekê de demokrasî pêş nekeve em nikarin ji aliyê fikrî, hunerî, çandî, edebî, siyasî û civakî pêş bikevin. Divê her şexs bi rehetî fikrên xwe bêje, rexne bike, pêşniyarên xwe derbirîne, kêfnexweşiyên xwe bîne ziman.

**BERNAMEGEH**

Koordînatorê Giştî: Occo Mahabad

Edîtor: Mihemed Keskîn
Cîhan Soylu

Rûpelsazî: Mîtannî Ajans

bernamegeh@gmail.com

www.bernamegeh.org

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.



# NAVEROK

04
Helîm Yûsiv
Çavdêriyên Rojnamevanekî

12
Occo Mahabad
Destana Rizgan û Nûrê

16
Seîd Veroj
Zeynelabidîn Fanî

21
Remezan Bakur / Mîr Hesenê Dasînî

24
Têmûrê Xelîl / Eznîva Reşît

31
Ednan Dogan / Newroz, Welato

32
Newaf Mîro / Pirs û Tirs

34
Abdurrahman Bedir / Li Warên Firaran

35
Siraç Oguz / Îdrîsê Bidlîsî

38
Îhsan Bîrgul / Rastnivîs

40
Mervan Serhildan / Ew ê Me Qir Bikin

46
Îkram Oguz / Şer û Wêje

48
Sultan Yaray / Roja Wêje û Dengbêjiyê

50
Axa Kurdikî / Hesen û Mêranî

52
Zeynelabidîn Zinar / Zira Kerê û Lota Devê

55
Baranê Qereyaziyê / Şev Tarî Bû

56
Ciwan Serwer / Çi Yê Me Ma

57
Bahadîn Robar / Tu Yî

58
Farûqê Feroyî / Ji Min Gotin

60
M.Zahir Kayan / Êvar Tê

61
Soran Hemereş / Kurdgalnamek
Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr

65
Cemîl Îbrahîm / Werin Em Zimanê Xwe Biparêzin

67
Nîhat Gultekîn / Berxwedana Gilîdaxê

71
Lokman Polat / Helbestên Silêman Azer

74
Têngîz Siyabendî / Roja Azadiyê

75
Yucel Aslan / Piltan

76
Rostem Xamoş / Silavek

77
Îxlas Frensîs / Bêhrkirin, Wergêr: Mehmûd Badilî

78
Mihemed Hesko / Pêşberî

79
Umîd Demîrhan / Rewşa Giştî ya Bajarên Bazîd û Tûlayê

87
Çayan Okuduci / Ji We Re Çi Lazim e

88
Welat Bazîdî / Gazina Jinikê Li Mêrê Malê

89
Şefîq Îsa / Kurê Dêlan

90
Abdullah Yavuz / Halê Min e Ev

91
Kamran Simo Hedilî / Helbest û Felsefe

94
Seyfedînê Welekorî / Navê Min

95
Mehmûd Ronîdar / Berfîn

96
Bûbê Eser / Zindana Diyarbekirê û Enfal

98
Keyhan Mihemedînijad / Dildarê Helbestvan



# HEVDÎTİNA KU JİYANA MİN GUHERAND

# ÇAVDÊRİYÊN ROJNAMEVANEKÎ

HELÎM YÛSİV

Dem piştî 2011an bû. Sûriyê di nav hêz û komên çekdar de belav bibû. Ji artêşa rêjîmê bigire hetanî bi biçûktirîn koma çekdar, her aliyek ji hêla hin dewletan ve dihat desteserkirin. Dewletên ku rasterast destên wan dirêjî wir bibûn, Rûsya, Emerîka, Îran, Turkiyê, Qeter û hin dewletên din di bin navên hevbendiyê de bûn, hemû bi awayekî ji awayan li wir bûn. Wê gavê çav hemû li ser derûdora Helebê bûn. Bajarê ku ez çar salan ji bo xwendina 'wêjeya erebî' li zanîngeha wê, lê jiyabûm. Lê bîranînên min ên wekî çil salî lê jiyabim lê hebûn.




Di van salên dawiyê de, di nav gelemşeya şer û pevçûnan de gelek kar û bar li ber lingan çûn, yek ji wan karan jî karê min ê mamostetiyê bû. Ji bilî rojnamevaniyê û karê televizonê kêfa min ji ti karê din re nedihat, ji ber vê min hemû dema xwe dabû vî karî, da ku ji nav qirêjiya şer û cengê, ez karibim li gor derfet rê bide, wêneyê rast yê bûyeran ragihînim.



Baca vê yekê jî pir giran bû û carinan dibû jiyana mirov bixwe. Gelek rojnamevanan jiyana xwe di vê rêyê de dan. Ji bo min hêza hezkirina ragihandina rastiyê ji tirsa ji mirinê xurttir bû. Ji lew re min bi kelecan karê xwe berdewam dikir. Niha jî berê me li nav kom û komikên çekdar bû, yên bibûn mîna artêşan û dest danîbûn ser gelek deveran. Çav hemû li ser derûdora Helebê bûn û hewildanên kontrolkirina navenda bajêr.

Di nav serekên wan komên çekdar yên ku dest danîbûn ser wê derûdorê û hetanî beşekî ji bajêr jî, Ebûseyyaf Elhamwî bû. Ne kesekî wêneyê wî dîtibû û ne jî rojekê ji rojan derketibû ser ekranên televizyonekê, lê navdartirîn serekmucahidên wê herêmê bû. Bi mehan bû em li pey ragihandina rewşê bûn û me doza hevdîtinê ji hemû rêveber û serekmucahidan re şand. Ne yên biçûk û ne yên mezin ti kesekî bersiveke erênî neda me. Hinekan ji wan berdestk û hinekên din jî ji ber sedemên ewlehiyê, li gor ku digotin, çekdarên xwe dişandin ji bo hevdîtina me. Lê gava erêkirina Ebûseyyafê navdar, yê ku bi navê „qesabê seriyan" jî hatibû naskirin, gihişt destê min, ne ez tenê, lê ez û hemû kesên li derûdora min şaş man. Wî jî ne dem û ne jî cih nedabû destnîşankirin, lê erêkirina xwe ji bo ez hevdîtinê pê re bikim, diyar kiribû.

Hayê min jê hebû ku gelek nûçegihanên televizyonan ji her aliyê cîhanê, yên Ewrupayê jî di nav de, dixwestin xwe bigihînin wî û gelekan ji wan ji bo hevdîtinên bi vî rengî perene mezin veqetandibûn, lê kesekî ji wan ti bersiveke erênî ji Ebûseyyaf wernegirtibû. Ya rast ez bêjim, gava ev bersiva erênî gihişte min û kirinên wî û çekdarên wî yên ku xwe wekî artêşa pêxember didan naskirin hatin bîra min, di çend kêlîkan de, tirseke mezin kete dilê min. Mirin û laşên serjêkirî yên ku li her devera ku diçinê hatin bîra min û ez hinekî ponijîm:





Evî ne bi nêta kuştinê xwestibe min bikişîne ber bi xwe ve?
Wekî ku ji xewnekê şiyar bibim, mejiyê min ê şiyar diket dewrê û min ji xwe dipirsî:
-Di nav van rojnamevanan hemûyan de, ewê çima ji bo kuştinê min hilbijêre?. Na, na, divê ez bi temamî van sawêrên reş ji serê xwe bavêjim û vê derfeta zêrîn ji dest xwe nerevînim û herim hevdîtinê.
Gava min ev agahdarî ya ne ji bo belavkirinê da berpirsiyarê beşê nûçeyan yê televizyona min pêre kar dikir, gelekî kêfa wî hat. Wî ji min re piştrast kir ku ev erêkirin têkiliya wê bi navûdengê televizyonê bi xwe heye û teqez divê ez di zûtirîn dem de hevdîtina bi Ebûseyyaf re pêk bê û ew ji bo hemû cureyên alîkariyê amade ne. Vê yekê hinekî sawêrên mirinê û tirsa ku ev ji bo min xefkek be ji Ebûseyyaf, ji serê min dûrxist. Lê dîsa jî dilê min ne rehet bû û wekî ku deh kes di guhê min de bibêjin :
- Tiştek bi dû biryara erênî ya vê hevdîtinê de heye. Razeke veşartî heye, lê ew çi ye min dikir û nedikir, min nikarîbû nas bikim.
Sedemeke din jî hebû, dibe ku ew li pey vê biryara Ebûseyyaf be. Dibe wî xwestibe hin aliyên veşartî ji rewşa devera xistine bin destê xwe de ji bo çapemeniyê eşkere bike û ji ber vê bersiveke erênî şandibû. Lê gelek televizyonên ji vê televizyona min tê de kar dikir mezintir hebûn, wisa jî gelek nûçegihanên biyanî ji çar aliyên cîhanê, ewî çima ez hilbijartim?





Ez her û her li derûdora vê pirsa bê bersiv dizîvirîm. Agahdariya ku divabû em ber bi Helebê ve bi rê kevin ez ji nav hemû xeyal û gumanan derxistim. Min xwe sipart sê çekdarên wê min derbasî herêma berfireh ya di bin destê Ebûseyyaf de bikin û wê min vegerînin. Ji min xwestin ku kamîramanê xwe li wir bihêlim û ez tenê tev li alavên xwe yên tomarkirinê bi wan re herim. Min xatir ji ekîpa xwe xwest û bi kelecaneke mezin ketim rê. Rê ya ku di dema xwendinê de sê çar demjimêran bi tirênê yan bi tirmpêlê dirêj bû û derdora sêsed kîlometrî bû, vê carê bi ser duwazde demjimêran ketibû. Wê şevê  ez li maleke bêxwedî ku di destên çekdaran de bû de razam.

Ji saeta destê min û telefona min a destan bigre, hetanî bi hemû alavên min ên rojnamevaniyê ji min sitendibûn û soz dabûn, ewê roja din hemûyan li min vegerînin.

Adinî rojê serê sibehê zû hatin. Hersê çekdarên bi rih bûn. Yekî ji wan çayê çêkir, yê din mast û nan amade kir û yê dîtir bi sivikayiyeke berbiçav hêk qelandin. Wisa xuya bû ku demeke dirêje bi hev re ne, her wisa gelek caran li vî xaniyê mêvanan, wekî nav lê dikirin, mane. Me taştê bi lez û bez xwar û ji bilî peyva 'Bira' bi min re bi kar netanîn. Bi henekî li ber guhê min dixistin:

- Şêx wesiyeta te li me kiriye.

Wisa xuya bû ku di nav hev de Ebûseyyaf ne wekî serok, lê wekî Şêx  bi nav dikirin. Vê gotina wan, her çendî ji bo dilê min di cih xînin de bû, lê dîsa jî gumanên xerab bi min re çêkirin:

Çima wê “Şêx’’ wesiyeta min bi xwe li mucahidên xwe bike?

Li gor çavdêriyên min, ne Ebûseyyaf, ne jî hêzên çekdar ên din ne ewqasî li jiyana rojnamevanan miqate bûn.



Lê dibe cudayiya Ebûseyyaf û serkeftinên mezin yên hêzên wî ji wê yekê tê, ku ew berevajî komên din ên çekdar bi zanebûn tevdigere. Yekî ji çekdaran, bi rêzgirtineke mezin destûr ji min xwest, da ku çavên min bi paçikekî reş girêbidin. Hem ji bo cihê serekmucahidê mezin Ebûseyyaf neyê naskirin, hem jî ew neçar in ku fermanên mezinên xwe cih bi cih bikin.

Min têgihiştina xwe ji bo vê yekê nîşan da û min bi xwe alîkariya wî kir, da ku herdu çavên min bi paçikekî reş bêne girêdan. Piştî rêwîtiyeke kin em daketin. Yekî bi destê min girtibû û em meşiyan. Her gav ez li benda wê yekê bûm ku ji min re bêjin:
- Em gihiştin.
Pê re jî paçikê reş ji ser çavên min hilînin. Min dizanîbû ez di gelek deriyan re derbas bûm, lê min nizanîbû ev kolan e yan korîdor e, gund e yan jî bajar e. Wekî ku ew ên çekdar ji min bêhtir westiya bin, çavê min vekirin û mizgîniya gihiştina cihê ku berê me lê bû dan min. Min li dora xwe nerî, berevajî texmînên min, cihê ez lê ne şikeft bû û ne jî ewqas asê bû. Li gor ez têgihiştim ew ne devereke weha bû ku Şêx lê dimîne, lê ew hemû êdî li benda hatina wî bûn. Weha xuya ye, ewê hevdîtinê bi min re li vir çêke û wê dû re here cihekî din.

Diyar bû ku hetanî bi çekdarên wî nizanin êdî cihê wî li ku ye. Ji min re hat gotin, ku Şêx naxwaze rûyê wî li ber kamîreyan bê naskirin. Wan amadekariyên hevpeyvîneke weha kirine ku wê pişta Şêx Ebûseyyaf li kamîrê be. Ez hatim agahdarkirin ku oda li kêleka min ji bo hevpeyvînê amade ye û wê pisporên karên teknîkî bernamê wekî tê xwestin bikşînin û dawî bidin min. Wisa her tişt hatibû amadekirin, wekî ku mirov biçe dezgeheke ragihandinê û wê hevpeyvîn bi serokwezîrê wî welatî re bibe. Her kes di amadebaşiyê de bû û tenê yek tişt kêm mabû, ew jî hatina serekerkanê artêşa cîhadiyên ku seranserê wê herêmê xistibûn bin destên xwe. Libendemanê gelekî dirêj nekir.  Kêlîkên ku ev çend hefte li bendê bûm hatin. Yê ku wê ez derbasî cem Şêxê xwe yê mezin kiribama, ji min re got ku ewê piştî qedandina kar bên û wê min vegerînin cihê ku jê hatime. Da pêşiya min, derî vekir, ez derbasî odê kirim, derî li min girt û çû. Pişta Şêx li min bû û jipiya rawestiya bû. Gava zîvirî û desmala reş ji derdora serê xwe da alî, ez çi bibînim?

## Di wê kêlîkê de ez têgihiştim bê çima Ebûseyyaf, şêxê mucahidan yê navdar, tenê daxwaza mina hevdîtina pêre pejirandibû.

Ez rû bi rû li hember Mahmud, hevalê xwe yê zanîngehê, bûm. Dengekî mîna ku yek ji veciniqandinê rih bide ji min derket û min û wî me ziq li çavên hev nerî:
· Mahmud, ev tu yî?

Min nema dizanî bû ez çi bikim. Divabû ez wî hemêz bikim, lê di navbera min û wî de bi sedên laşên serjêkirî yên ku çekdarên Ebûseyyaf li pey xwe hiştibûn hebûn. Di nav min û Mahmud de Ebûseyyafê qesabê serê mirovan, bi şûrê xwe yê bixwîn rawestiya bû.

Dirêjbûna riha Mahmud diruvên wî neguherandibûn û di pişt wê riha dirêj de heman rû, rûyê Mahmud ê li zanîngehê di nav derdorên me de bi henekî wekî komunîstê 'Ixwan muslimîn' dihat binavkirin. Balkêş bû, ku Mahmud heta wê gavê jî paşnavê xwe neguhertibû û her mabû Alhamwî.


Lê, eger min bi çavên xwe nedîtiba ti caran minê bawer nekiriba, ku ev Ebûseyyaf Alhamwî, ew bixwe hevalê min ê mulayim, yê bêhnfireh û mervan Mahmud Alhamwî yê dema zanîngehê ye. Di wê kêlîkê de ez têgihiştim bê çima Ebûseyyaf, şêxê mucahidan yê navdar, tenê daxwaza mina hevdîtina pêre pejirandibû.



Xeyala min ez vegerandim berî serdema tofana 2011 an.
Di sala ku ez ji bo xwendina zanîngehê de ji Qamişlo çûm Helebê, Mahmud jî ji Hemayê hatibû ji bo heman fakulteyê bixwîne. Me ji roja yekem de hev naskir, lê hevaltiya min vê dawiyê pê re xurt bû. Piştî min xwe û wî dît ku em di yek derdoreke çepgir û siyasî de diçin û tên. Wisa jî ez û wî salekê bi hev re li taxeke Helebê bi navê 'Şêx maqsûd' ketin xaniyekî bi kirê. Mahmud xortekî jîr, serwext, cansivik û dilvekirî bû. Ji wan kesan bû, ewên di hevdîtina yekem de, tu pê dihisiya ku bi salan e tu wî nas dikî. Di dema bihevremana di xaniyê 'Şêx Maqsûd' de, ku wekî taxeke kurdan li Helebê dihat naskirin, bi henekî ji min re digot:

-Mala min li 'Şêx maqsûd' e, hevalên min hemû kurd in. Tenê ew kêm maye ku ez paşnavê xwe ji Alhamwi bikim Alkurdi û wê mesele temam bibe. Jixwe va ez fêrî kurdî jî dibim.
Di bûyerên Hemayê de 1982, yên rêjîmê li dijî Ixwanulmuslimîn tevkujiyên berfireh pêk anîn, malbata wî, dê û bavê wî jî bibûn qurbanî, bêyî ku têkiliya wan bi tiştekî hebe. Wî wisa behsa bûyera kuştina dê û bavê xwe dikir:
-Sûcê wan ew bû ku cîranekî wan 'Ixwan Muslimîn' bû.

Ji ber ku wê çaxê qenas û bombebara leşkerên rêjîmê bajar hemû dabûn ber xwe û dest bi qirkirin û jiholêrakirinê kiribûn, diya wî û bavê wî jî li ber wê pêla mirina bêserûber çûbûn:



> Xortekî vekirî, xwedî ramanên çepgir û humanîst û nerm bû.



Avahiya ku gulle jê derketiba bi temamî bi ser serê kesên ku tê de dihat hilweşandin. Wisa xuya ye gulle ji mala cîranê me derketibû, wan avahî bi ser serê dê û bavê min de hilweşandin. Tenê tesadufa ku ez wê kêlîkê ne li mal bûm ez ji mirinê xelas kirim.
Nasnavê wî yê 'komunîstê ixwançî' ji vir hatibû. Lê ew bixwe ne komunîstekî wisa rasterast ku endamê partiyan be û ne jî 'Ixwan' bû weku malbat. Xortekî vekirî, xwedî ramanên çepgir û humanîst û nerm bû. Yan jî min ew wisa nasdikir. Ji xwendinê pir hez dikir. Balkêş bû ku li oda wî wêneyê Kal Marks dalqandîbû, lê di nav pirtûkxana wî ya malê de bi dehan pirtûkên olî hebûn. Tê bîra min, carekê hevalekî me wêneyekî wî yê wisa girtibû; di bin wêneyê Marks de pirtûka 'Riyadulsalihîn' ku hemû hedîsên pêxember in, dixwend. Ji her kesî re tiştekî ne asayî bû, lê ji Mahmud re tiştekî gelekî asayî û normal bû. Dîtina xwe bi van çend gotinan rêz dikir:
Xwendina hedîsên pêxember jî û xwendina Marks jî dikeve çarçova gera li rastiyê.

Dîtina wêneyê 'Binladen' ê a niha li oda wî dalqandî bû ew wêneyê Marks yê li odeya wî ya Helebê ya demê xwendina li zanîngehê anîbû bîra min. Riha Karl Marks bi riha Osama Bin Laden hatibû guherandin. Rîtma dengê wî yê qebe ez ji nav xeyal û bîranînan derxistim û ez ji cem Mahmûd anîm cem serekmucahidê navdar Ebûseyyaf Alhamwî.

Ji seqaya du hevalên xort ên xwendekar derketim û ketim nav rastiya du mirovên navsere, ku bi ser pêncî salî ketine. Yek jê rojnamevan e û yek jî serekhêzeke çekdar e û armanca hevdîtinê axavtina li ser rewşa welatekî birîndar e û di nav hêz û aliyên çekdar de perçekirî ye. Bi dengekî qebe û bi kêfxweşî pêşwaziya min kir. Ji bo hatina min kêfxweşiya xwe eşkere kir, destê xwe da min, lê ew jî ji bo hemêzkirin û jihevnêzîkbûneke mîna du hevalan ne amade bû. Em li hember hev rûniştin. Dizanîbû ez veciniqîme û ji bo rewşê asayî bike li halê min pirsî û wekî ku her tişt asayî be tevgeriya. Mahmûd zêde nehatibû guhertin.

Hin tayên sipî di nav porê wî û riha wî de xuya dikirin, lê li ser xwe bû û bi baweriyeke mezin tevdigeriya.

Berî em dest bi axavtina ji kamîreyê re bikin, wekî ku ew bîranîn hemû li ba wî jî zindî bin, got:
-Belkî ji bo te hinekî rewşa mina niha xerîb xuyanî bike, lê ji bo min tiştekî din e. Ez bawer dikim te ji bîr nekiriye, ku ez niha şer bi qatilên dê û bavê xwe re dikim, ew dê û bavê bê sûc û bê sebeb di mala xwe de hatin kuştin.

Mahmud ew hêza xwe ya qanihkirinê winda nekiribû. Karê xwe bi bawerî dikir û karîzmayeke wî ya xurt ya birêxistin û birêvebirina mirovan hebû. Li paş kamîrayê Mahmud wekî hevalekî kevin hem li min guhdarî dikir û hem jî wekî serekhêzeke çekdar li ber kamîrayê bersivên têrtije dan hemû pirsên min. Piştî qedandina hevdîtinê Mahmud bi lez bû û wisa xuya bû ku divê bi rê bikeve.

Di kêlîkên xatirxwestinê de hinekî çavên wî şil bûn. Ew nîşanek bû ku di hundir kinc û çekên Ebûseyyaf de ew Mahmud ê ciwan bi temamî neqediya bû. Nizanim wan kêlîkên hestiyar yên xatirxwestinê ew di çi de difikirî, lê hindik mabû ku hêsir têkevin çavên min jî û ez xwe bavêjim hemêza wî hevalê xwe yê kevin û em têr bi ser hev de bigrîn. Lê berî hestên min ên keliyayî bifûrin, wî rahişte xwe û derket, bi dehan çekdarên ku ew diparastin pê ve hatin û bi lez çû. Bi çûna wî re pirseke weha vekirî li holê ma:
-Xweda, em ji ku….. hatin ku…..?




Lê ne wî tiştê di dilê xwe de got û ne jî min. Êdî dereng bû. Dem ne dema axavtin û gotina gilî û gazinan bû. Dem dema kuştin û mirinê bû û divabû her kes ya xwe di dilê xwe de bihêle û ti armancên din, ji bilî mana li jiyanê, li pêşiya mirovên wî welatî nemabû. Her sê çekdarên ku li benda min bûn, hatin. Em ketin rêya vegerê. Her sê çekdaran ez gihandim wî cihê ku em jê bi rê ketibûn. Min sipasiya wan kir û çûm cihê karê xwe. Yekser berpirsiyarê televizyonê li hevdîtinê pirsî û pêşwaziya min bi vê pirsê kir:
-Çawa derbas bû?
-Hevdîtineke wisa bû, ku jiyana min berî wê û piştî wê, wê ne wekî hev be. Hevdîtineke wisa bû, ku jiyana min guherand.
Şer hevalê min Mahmud qulipandibû, ew kiribû Ebûseyyaf, qesabê serê mirovan. Wisa jî hevdîtina Mahmud ez qulipandim, ez kirim tiştekî din. Ew tişt çibû, min jî nizanîbû çi navî lê bikim.

# Occo Mahabad

## DESTANA RIZGAN Û NÛRÊ

Hîma vê destanê li ser evîneke negihîştî û azarkêş hatiye afirandin. Aliyekî hezkirineke mezin û fedakar lê li aliyekî din bedbextbûneke kesernak û wêranker tê dîtin. Çavkaniya vê destanê jiyana me ya rojane ye ku her ro li herêmekê rastî me tê. Di vê destana klasîk û xelkî de motîfên sereke eşq, evîn, hevnegihiştin, êşkişandin, bêrî, hêvî, fedakarî, berxwedan, tirs û mirin in.
Di destanê de em dibînin ku çînên serdest, hêzdar û dewlemend çînên bindest û kedkar biçûk dibînin, qîzên xwe layiqî wan nabînin.
Dengbêjên me vê destanê di meqama klamkî de û bi awayekî kurt vedibêjin lê çîrokbêjên me ji gellek aliyan û bi detayî ji me re neqil dikin. Rehmetî meta min çîrokbêjek pirr jêhatî bû, dikaribû bi saetan ji we re qala destan û çîrokên curecur bikira. Ez ê hewl bidim ku ji devê meta xwe vê destanê ji we re binivîsim.
Rizgan û Nûrê aşiqê hev in û bi salan e hev hez dikin lê Rizgan şivanê gund e, feqîr e, belengaz e, bê mal û milk e, xortekî camêr û dilsoz e. Ne neheqiyê dike ne jî neheqiyê qebûl dike, merivekî dilgeş û adil e.
Nûrê qîzeke bedew û xweşxûy bû, husn û cemaleke wisa lê hebû dema meriv çav pê diket te digot qey horî ye ji bihûştê reviyaye hatiye li kêleka Rizgan rûniştiye. Meriv dêna xwe bida wek ava kevserê bû, dilê xortan pê tev kûl û birîn bûn.

Bavê Nûrê serdestê gund e, dewlemend e, dixwaze qîza xwe bide mirovekî zengîn û wekî xwe bi nav û deng. Li ber çavê wî, merivên feqîr rût û tazî bûn, xêr jê nedihatin, ew xwe bikuşta jî qîza xwe nedida feqîrekî.



Occo kurapê Nûrê ye, girêdayî erf û edetên xwe ne, herî zehf nêçîran hez dike bi taybetî nêçîra kêvroşkan. Occo jî wekî apê xwe merivekî dewletî û hêzdar e. Ji zartiyê heta xortaniya xwe bi Nûrê re mezin bûye, bi salan e dil berdaye Nûrê. Sibê zû radibe ji vê deştê bigire heta vê qûntarê, Nûrê berê xwe bide kuderê şev û roj li pey Nûrê mîna siyekê digere, bi dizîka çavdêriya wê dike. Occo naxwaze ku Nûrê bi Rizgan re bizewice. Merivekî çavsor, hesûd û zalim e.







Çend caran malbata Rizgan ji bo xwezginiyê diçin mala bavê Nûrê lê di her çûyînê de bi destvala vedigerin. Bavê Nûrê Rizgan biçûk dibîne, dilê wî tune ku qîza xwe bi şivanekî re mêr bike. Rizganê belengaz çi dike çi nake nikare bigihîje miradên xwe.

Rizgan bi rojan difikire, dawiyê biryar dide ku wê Nûrê birevîne şikefta Qûlî. Biryara xwe dibêje Nûrê lê Nûrê naxwaze Rizgan wisa bike ji ber ku qîzrevandin işê namûsê bû li gorî kevneşopiyên civakî dawiya revê kuştin û mirin bû.

Nûrê bi lavayî bang dike Rizgan:

Bê de lolo lolo lolo…
Rizgan ez bi qurban nizanim bextê min bû yan talihê te bû?
Berfanî berfa nerm e.
Heyrano rûkê erdê kiriye wekê çerm e.
De tu were min porkura Xwedê nerevîne, nebe Şikefta Qulî.
Şikefta Qulî şikeftekî cihê bê warî, cangê kurapê min nêçirvan e.
Sibê zû radibe, pey kevrûşka digerine.
Ax Rizgano ez bi qurban, tu were îzê bîne ser me, min bikuje.
Lo te jî ser da axx?"
Bê de lolo lolo lolo…lolo Rizgano Bê de lolo lolo lolo…

Rizgan guh nade Nûrê, bi hespê xwe yê qemer û qewî wê direvîne şikefta Qûlî. Şikefta Qûlî cihê aşiq û evîndaran e, ji gund dûr e, ewle ye. Her evdê Xwedê nikare derkeve serê şikeftê, li ser zinarekî bilind û asê ye.
Piştî revê herdu dilketî û evîndar diwestin, Rizgan gazî Nûrê dike:

Rizgan go Nûrê,  wa Nûre, were qasekî çoka xwe bide erdê,
Ezê serê xwe bidim ser çokê ye.
Nûre çoka xwe dide erdê, Rizgan serê xwe dide ser çokê ye.
Kete xewê û xewnê ye.
Ji xewa şêrîn bazda go Nûrê, wa Nûrê!  Mala bavê lê xerab bûyê!
De rabe minê xewnekî dîtiye.
Ezê xewna xwe bibêjim, tu porkura Xwedê xewna min şirove bike axx.
Ê de go; "min dîtibû darekî li derê mala bavê te şîn bûye.
Wê darê du çiqil, her çiqil sêvekî, her sêvê kewekî gozel li ser e.
Minê bala xwe dayê teyrê qereqûşê jor de li serê herdû kewa gozel difirî ax."



Rizgan bi tirs ji carekê ve behsa xewna xwe dike, Nûrê xewna wî dibihîse diricife, tirs û xofeke mezin û bêhempa dikeve dilê wê. Qîzrevandin karê mêran e lê dawiyê kuştin û mirin e. Dizane ku bavê wî niha ji bo dîtin û kuştina wan, kurapê wê Occo peywirdar kiriye. Occo zalim e çavsor e, ew ê xwîna wan birijîne bo namûs û mêraniyê.

Bang dike Rizgan, tirsa xwe jê re şîrove dike:

Nûrê go; Rizgan ez bi qurban, Xwedê xewna te bi xêr ke.
Dara derê mala bavê min ji bejna min e.
Herdû çiqilê pêva bext û mirazê min û te ne.
Herdû sêvê li ser, memikên min in.
Herdû kewê gozel eslê rihê me ne.
Teyrê qereqûçê Occo'yê kurmamê min ê nêçîrvan e.
Sibê zû radibe, pey kevrûşka digerîne.
Ax Rizgano ez bi qurban, tu were îzê bîne ser me, min bikuje.
Lo te jî ser da axx.
Bê de lolo lolo lolo…lolo Rizgano… Bê de lolo lolo lolo…

Rizgan dibê netirse Nûrê aş be, heke Occo mêr be ez jê mêrtir im. Çima destê Occo bi çek e yê me bi text e.

Nûrê tê cem Rizgan, dikeve hembêza wî ya êgir, dilê xwe dike nermenerm. Lêvên xwe datîne ber qeraxa devê Rizgan laşê xwe dike germegerm. Hev şa dibin pev şa dibin kelekel. Dikevin xew û xewneke giran heya ber sibê. Nûrê bi qebqeba kewan hişyar dibe.

Sibe bû, kubara sibê ye.
Nûrê derdikeve ber derê şikeftê ye.
Dinêre Occo xuya ye jêr de tê ye.
Nûrê diçe pêşiyê Occo.
– "Occo ezê bextê te de me,
Were Rizgar nekuje xortek heyf e, take tenê ye.
Were min porkura Xwedê bikuje,
Poz û guhê min jê ke, têke cêva xwe de.
Sibê ro nava eşîrê derxe. Him te re nav e, lo him namûs e ax."
Bê de lolo lolo lolo…lolo Rizgano…

Teyrê qereqûşê Occoyê zilimkar, bi fermana bavê Nûrê hatiye ji bo kuştina herduyan. Occo Nûrê guhdar nake, bi sîle û şeqamên nexêr canê wê diêşîne, berê Nûrê dikuje pişt re Rizganê di xew û xewnê de ye....

Destana Rizgan û Nûrê bi trajediyeke mezin bi dawî dibe. Nahêlin herdu evîndar bigihîjin miradên xwe û bi bextewarî jiyanek ava bikin. Di destanên evînî de taybetiya sereke hevnegihîştina aşiq û dildaran e. Tucarî derfeteke gengaz peyda nabe ku pevre emrê xwe derbas bikin.

Cudahiyên çînî, civakî û takekesî di vê destanê de pirsgirêkên herî mezin in. Malbatên dewlemend merivên kedkar, karker û feqîr biçûk dibînin naxwazin qîzên xwe bidin wan. Ji ber vê yekê her meh bi dehan civanên Kurd ji bo mehneya namûsê tên kuştin.

Heke em derdora xwe baş mêze bikin em ê bibînin ku li Kurdistanê bûyerên bi vî şiklî her ro diqewîmin, gellek Rizgan û Nûrê di civaka me de bi pisgirêkên wisa re rû bi rû dimînin.



## Zeynelabidîn Fanî (Îrfanî):
## Sekreterê Dawî yê Cemîyeta Tealîya Kurdistanê

# SEÎD VEROJ



Zeynelabidîn Fanîzade yan jî Zeynelabidîn Îrfanî, di sala 1884an de ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navendî li cîyê ji dayikbûna xwe, li navçeya Qadirlîyê û ji wê şûn ve li Edenayê temam kirîye. Paşê Darûlfunûnê bi dereca yekemîn xelas kirîye û ji wê şûn ve jî li Îstenbulê Mekteba Hiqûqê xwendîye.
Sala 1911an di Partîya Hurîyet û Îtilafê de dest bi sîyaseta aktîf kirîye. Bi rûtbeya bînbaşîtî tevlî şerê Balqan bûye…Piştî îmzekirina Peymana Mondrosê, dema ku CTKê hatîye avakirin ew, yek ji endamê îdarî û kesayetîyek girîng ê CTKê bû. Ji parçebûna CTKê (Hezîrana 1920an) şûn ve Zeynelabidîn Fanîzade, ji
ber vê parçebûnê îstifa dike û di daxuyanîya xwe ya îstifakirinê de dibêje: "Ji ber ku di navbera endamên cemîyetê de îxtilaf û cudayîya fikrî çêbûye, min ji endametîya CTKê îstifa kirîye. Li gor dîtina min qenaet û şexsê Seyid Abdulqadir Efendî gelek muhterem e. Ji ber vê yekê, sebebê îstifaya min ne dijberîya cenabê Hezretî Seyid Efendî ye û li gor agahîya min wan hevalên rêzdarên din ên ku îstifa kirine, qenaeta wan jî di vê çarçoveyê de ye. Esasen netîce, wê di hilbijartinên yekşema hefteya pêşîya me de dîyar bibe."[1] ….

Ber bi dawîya sala 1922an de ku Îstenbul dikeve bin hukma M. Kemal û hevalên wî, gelek mixalif ji bêgavîyê terka Îstenbulê kirine. Di ser de destpêkirina hevdîtin û pêkhatina Peymana Lozanê jî, rewşeke nû derxistîye meydanê û firsenda nefîkirin/sirgûnkirin û derxistina ji hemwelatîyî ya mixalifan daye M. Kemal. Ji xeynî yên berê derçûyî û reviyayî, bi navê "Lîsteya 150an", beşekê din ê mixalifan hatin sirgûnkirin û ji mafê hemwelatîbûnê ji dest wan hate girtin.

[1] Serbestî, Kurd Tealî Cemîyetî, no: 595, Sêşema 20 Nîsana 1920, r. 2

Ji endam û rêvebirên Cemîyeta Tealîya Kurdistanê (CTKê), heşt (8) kes di nav lîsteya 150an de hebûn: “Hemdî Paşayê (kevne Wezîrê Behrîyeyê), Xelîl Rehmîyê Bedirxanî (kevne miteserrifê Melatîyê), Mistefa Paşayê Kurd/Yamûlkî (kevne serokê Mehkema Dîwanê Herb), Mesûd Fanî (keven miteserrifê Cebelî Berekat), Zeynelabîdî (kâtibe umûmî yê Partîya Hurîyet û Îtilafê), Mewlanzade Rifat (xwedîyê rojnameya Serbestî), Fanîzade Elî Îlmî (xwedîyê rojnameya Ferda) û Kurd Heqî yê Silêmanî.”

Seyid Mihemedê lawê Seyid Abdulqadirê serokê CTKê, sala 1925an di dema mehkemekirinê de ji bo Zeynelabidîn dibêje:
“Ew katibê Umûmî yê CTKê bû, ala kesk a li ser wereqeyên huwîyeta CTKê, ji alîyê Katibê Umûmî Zeynelabidînê Fanî ve hatîye amadekirin/çêkirin.[1]
“Ala osmanî vemirî, me ala kurdan çêkir ku digel wê wekî roj biçirûse. Ev hêvîyek e.”[2]

Ew jî wekî her du birayê xwe yên din, ji ber xebata xwe ya sîyasî ya mixalif, di sala 1924an de dikeve lîsteya “Sirgunên 150an”, di vê lîsteyê de navê wî di rêza 37an de hatîye lêkirin. “Zeynelabidîn berdevk û sekreterê giştî yê Partîya Hurîyet û Îtilafê bû, dema hatîye sirgûnkirin, pêşîyê çûye Misrê ji wir ve çûye Mekkeyê ji bo pêşwazîkirina Wahdetîn”[1] û paşê ji wir ve jî derbasê başûrê Kurdistanê bûye. Li wê derê jî peywendîya wî û malbata Nehrîyan berdewam kirîye. Wî di Kerkûkê de dest bi kar kirîye û sala 1926an ji bo hewa gorrînê çûye bajarê Rewandizê.

[1] Nurşen Mazıcı, Belgelerle Atatürk Döneminde Muhalefet (1919-1926), Dilmen Kitabevi, İstanbul-1984, r. 147 [1] Şevket Beysanoğlu, Anıtlar ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi (Cumhuriyet Dönemi), Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları, 2001, 3. Cilt, r. 951
[2] Seyid Mihemed, Kürd Cemiyetinde Kimler İstiklal (Bağımsızlık), Kimler Muhtariyet (Otonomi) Taraftarıymış? Vakit Gazetesi, 19 Mayıs 1925, r. 1-2

Di hejmara sêyemîn (3) a Zarê Kirmancî de li ser hatina wî ya Rewandizê, weha hatîye nivîsandin: Cenabî milletperwerî wetten xway xeyur Zeynelabidîn Beg musenefzade le Kerkûkewe bo hewa gorrrîn û ziyaret hate şarman, le hesret gewre û piştîwan qayimqam mîwanin, be xêrhatinî dekeyin.”[1]
Li gorî raportek îsixbarata Îngiliz, “Di meha Sibata 1927an de, li Kerkûkê di navbera layengirên tevgera kurd û layengirên tirkan de propagandeyek bi qewet hebûye. Zeynel Abidîn wekî wekîlêt Seyid Tehayê Nehrî ye û dij bi Şêx Mehmûdê Hefîd.”[2]
Di kitêba navborî de, behsa raportekî din a taybet ji Erbîlê hatîye şandin di roja 02.02.1930an de dibêje; “Zeynelabidîn mudirê pêştir ê mektebê bûye li Kerkûk, li meha Eylûlê kurê Seyid Teha ew li gel xwe birîye Tehranê. Wextê ji Tehranê zivirîye, bi rêya Erbîlê di roja 23.11.1930an de çûye Bexdayê.”[3]
Dema ku ew li başûrê Kurdistanê dijîya, çav û dêna asayîş û îstixbarata Tirkêyê li ser wî bûye. Di destpêka sala 1938an de ji alîyê Muduriyeta Asayîşa Giştî ya Tirkîyê ve li ser rewşa sirgûnên 150an, raportek tête amadekirin û li gorî dîyarkirina vê raportê, “Zeynelabidînê Sekreterê Giştî yê Partiya Hurrîyet û Îtilafê, li Iraqê û di bajarê Rewandizê de dimîne.”[4]

[1] Zarê Kirmancî, J.: 3, 14yê Sefer 1345 (1926)
[2] Nayif Hemudî, Al Qadiye al Kurdîye we Herekat El Şêx Mehmûd El Hefîd, r. 359 (Wergera: Sidîq Salih)
[3] Nayif Hemudî, Al Qadiye al Kurdîye we Herekat El Şêx Mehmûd El Hefîd, r. 607 (Wergera: Sidîq Salih)
[4] İlhami Soysal, 150’likler, 2. Baskı, Gür Yayınları (Ji Arşîva Lûtfî Baksî)

## 3.1. HEWLDANA DERXİSTİNA CERÎDEYA SORAN Lİ HEWLÊRÊ

MİN GOT: NİHA JÎ HER NEXOŞÎYA SİLÊMANÎYÊ Lİ MİN HEYE Û HÊJ HALÊ MİN BAŞ NEBÛYE KU BİKARİM HÊVÎMENDÎYA XWE PÊŞKÊŞÎ WE BİKİM, Jİ BER HENDÊ BİBÛRÎNİN.

Dr. Kurdistan Mukiryanî ya birazîya Husên Huznî Mukriyanî, di berga dûyemîn a pirtûka Sercemê Berhemên Husên Huznî de, di bin sernavê "Çûna Hewlêrim û Metbee Damezrandinim û Cerîdey Ronakî Derxistinim Le Hewlêr" [Çûna Min a Hewlêrê, Damezrandina Metbee û Derxistina Rojnameya Ronakî] de, ji destnivîsên mamê xwe neqil dike û behsa hevdîtina Husên Hûznî û Zeynelabidîn û Ehmed Begê muteserrifê Hewlêrê dike û dibêje:



"Dema min bihîst ku Ehmed Beg bûye muteserrifê Hewlêrê û dest bi hukmê kirîye li wê lîwayê, her kes bi nivîs û têlgraf bi xêrhatina wî dikir û diçûn zîyareta wî. Ez wekî kesekî nenas û neşareza, bêdeng mam û li mal rûniştim û neçûm. Piştî muddeteke ez her li mal bûm û derneketim. Qaymeqamê Rewandizê dû-sê caran ji min re got ku Ehmed Beg hatîye, min deng nekir, hetta rojekî hat Rewandizê û bû mêvanê mala Murad Begê qaymeqam. Gazî min kir, dema ez çûm kesek bi navê Zeynelabidîn li ba wî bû ku mensûbê Seyid Tehayî bû. Ew rûniştîbûn, muteserrifî got: Niha min behsa we dikir, ev çend meh e ku ez hatime lîwaya we, min ta niha we nedîye.
Min got: Niha jî her nexoşîya Silêmanîyê li min heye û hêj halê min baş nebûye ku bikarim hêvîmendîya xwe pêşkêşî we bikim, ji ber hendê bibûrînin. Min nezanî bû berî ku ez biçim wir giftûgo hatbû kirin, şertekî wisa danîbûn ku lazime ez rojnameyekê derxim û Zeynelabidîn efendîyê kurê Xaqî[1] Efendî bibe midurê mesulê min. Min got: Ev jî weke çûna min a Silêmanîye ye. Min guh neda, wan zor da min. Ez jî mezlûmê destê îstîbdadê me û tu qewetekî din ê min nîne. Ew zehmetî û jarî û perêşanîya ku li Silêmanîyê bi serê min hat, heta mirinê besê min e. Ehmed Beg bi zorê ez digel xwe birim Hewlêrê û digel Zeynelabidîn Efendî çend rojekî em li wir mayin.

[1] Navê bavê Zeynelabidîn Bakî (Baqî) ye, ne Xakî ye. Bawer dikim li vê derê Baqî bi xeletî wekî "Xaqî" hatîye nivîsandin. (S. V.)



Roja dûşema 25ê Mayîsa 1935ê ya beramberî 21ê Sefera 1353an, me bi hev ra daxwazî pêşkêş kir ji bo îmtiyaza rojnameyek bi navê “Soran” ku du car di hefteyê da derkeve. Me daxwazname da muteserrifî. Ewraq ketin nav muameleyê, lêbelê min di nav wê karê da lîstik didî û ji bo min nedihate aşkerakrin û min ji wê lîstik û yarîyê fêm nedkir. Ewraq xwestina îmtiyazê bû dawî, sê-çar memûrê Hewlêr ku di eslê xwe de xelkê Silêmanîyê bûn û mensûbê muteserrif bûn, wan bi wereqe ez haydar kirim ku baştir e Zeynelabidîn nebe midurmesûlê vî rojnameyê. Mebest çi bû, ez nazanim! Çima berê Ehmed Beg ez bi zorî kirim hevalê wî û niha çi qewimîye? Nazanim. Bi rastî min mebest û armanca muteserrif û memûr nedizanî, lê min fêm kir ku ev kare çê nabe.

Gerçî yek-dû mehan li Hewlêrê ez rastî mesref û zehmetîyê hatim. Li Rewandizê min malbat bi perêşanî bi cî hêlabû.

Rojekî li dayrê ez çûme ba muteserrif û min behs kir ku armanc ji hatina min û negihîştina bi arezûya min, gelo tiştekî qanûnî ye yan cenabê we poşman bûne? Wî jî got ez ji dil hez dikim û wezareta karê hindr jî dixwaze îcazeyê bidete hewe. Lê şert û şirûtê qanûnî yê we netemam e.

Min got: Çawa?


Got: Ji bo damezrandina metbeeyê lazime xudîyê wî ji medresa alîye mezûn be.

Mecbûr ez vegeriyam û min gelek hewil da qanûnê çapxanan ku ji dewra osmanîyan ve li Iraqê mabû, min ew qanûn peyda kir û min bire ba muteserrifî û li wir hatibû beyan kirin ku ew kesê bixwaze metbeeyek li cihekî dabimezrîne tenê pêwîste beyana damezrandin û navê metbeeyê bide memûrê îdareya merkezê wî cihê û tenê ev û tiştekî din nebû.

Îcar got: We digel Zeynelabidîn îttifaq kirîye?
Min got: Belê, we ez hildam ba wî, lêbelê Ehmed Xoce Efendî û Hîkmet Emîn ji min ra gotin em wisa bi baş dizanin ku Zeynelabidîn neke hevalê xwe. Min jî axaftinên wan bi axaftina we dizanî, min dixwest evê ji we re bibêjim.
Wî go: Ez jî bi başî nazanim, çima? Bê sebeb ma.
Piştî gelek gengeşe û giftûgoyan ji dayîrê derketim. Min got; ezê bizivirim Rewandizê û destê xwe li vê karê pir zehmetî berdim. Ez ketim nav fikr û xeyalan, yek-dû roj wekî gêjan mam, dihatim û diçûm."[1]
Ji xeynî van agahîyan, di derbarê jîyan û xebata wî ya li başûrê Kurdistanê pirr agahî li ber destê me nîne. Gelo ew li wê derê zewicîye û zarokên wî hene yan na, em vê nazanin. Qasê ku tê zanîn wî, di destpêka salên 1940an de jî li bajarê Kerkûk û Daquqê kar kirîye.
Di derbarê dîroka mirina wî de, di çapemenîya Tirkîyê de agahîyên nerast belav bûne û ev nerastî ji alîyê gelek çavkanîyan ve hatîye dubarekirin. Qanûna efû ya ji bo Sirgûnên 150an, "Di roja 1 Hezîran 1938an de ji alîyê meclîsê ve hatîye erêkirin."[2]
Taha Toros dibêje: "Zeynelabidin berîya derçûna efûya 150an li Bexdadê mirîye."[3]
Ev agahî nerast e, lewra wî di 31ê Cotmeha 1940an de, ji Riza Tefîk re nameyek şandîye. Ji nameya wî ya ku bi navê Zeynelabidîn Îrfanî di sala 1940an de hatîye nivîsandin, weha dîyar dibe ku ew, wê demê Katibê Tehrîrat ê Kerûk û qeza Daquqê bûye.[4]
Di derheqê nivîsandin û berhemên wî de, tu agahîyek li ber destê me nîne. Lêbelê di kovara Zarê Kirmancî de behsa berhevoke wî ya li ser tarîxa kurdan dike ku pêkhatîye ji nivîsên nivîskarên îngiliz, alman, rus û fransizan.[5]
Zeynelabidînê sekreterê dewra dawî ya Cemîyeta Tealîya Kurdistanê û Partîya Huriyet û Îtilafê, jîyana xwe bi têkoşîna bidestxistina mafê neteweyî yê miletê kurd û mixalefetkirina li dijî Îtihad-Teraqî û tevgera M. Kemal derbas kirîye.
Lêbelê heta vê gavê dîroka rastîn a koça dawî ya Zeynelabidîn Fanî nayê zanîn, ne dîyare.

[1] Kurdistan
Mukrîyanî, Sercemî Berhemî Husên Huznî
Mukrîyanî (Bergê Duwem), Çûna Hewlêrim û Metbee Damezrandinim û Cerîdey
Ronakî Derxistinim Le Hewlêr, Weşanên Aras, 2007, r. 606-607 (Wergera ji soranî: Hêmin Omer)
[2] Ayşe Hür, Resmi Tarihin Hainleri: 150'likler, Radikal Gazetesi
[3] Taha Toros, Mesut Fanî Üzerine, Tarih ve Toplum, sayı: 61, İletişim Yayınları, Ocak 1989, r. 50
[4] Abdullah Uçman, Bir 150'liğin Mektupları Ali İlmî
Fânî'den Rıza Tevfik'e Mektuplar, Kitabevi, 2. Baskı, İstanbul, 2012, r.159
[5] Zarê Kirmancî, J.: 4, sala yekem, Duşeme 19ê Rebiulewel 1345, r. 21





# Mêrxasî Ehda Mir Hesenê Dasinî

REMEZAN BAKUR

Dema dibêjin dasinî bajarê Duhokê tê bira mirov, bajarê Duhokê, Duhoka dasinîya tê bi navkirin.

Dasinî kî ne çima Duhoka dasinîya?

Dasinî herêmeke dinav herêma behdîna de, ji bajarê Dihokê heta navçeya Akrê û navçeya Şêxan, herêma dasinîya tê binavkirin, ji alîyê rojhilat û herêma navçeya Akrê re dibêjin dasinîya jor û ji herêma bajarê Duhokê re dibêjin dasinîya jêr, demên berê; niştecihên herêma dasinîya, piranî ji bawerya ezdayetîyê bûn.

Mala mîra (mîrên kurdên êzidî) xelkê herêma dasinîya ne. Çawa bajarê Duhokê bi dasinîya tê binavkirin wisa gelek cih û war hene bi navê dasinîya tên bi navkirin wekî peyarêka dasinîya, kora dasinîya û hew. Peyarêka dasinîya; rêyeke dasinîya jibo karwanên xwe çêkirî, peyarêk li ser sînorê başûrê Kurdistanê dikeve rojhilatê çemê xabûr û herêma eşîreta qeşûrîya, demên berê karwanên wan, ji bajarê Duhokê di vê rêyê re derbaz dibûna alîyê herêma navçeya Elki û zozanên feraşînê, rêyeke bi asteng û asê ye.

Di serê çîyayên herêma qeşûra re desbas dibe, rizde lat û astengên rê tê re derbaz dibe, bi kevirên mezin dîwar kirîne. Kora dasinîya dema diçûne zozana, banehîyên wan didanînê û cihê bêhnvedanên wan bû.

Serdema dewleta emewîya, Mîr Hesenê dasinî mîrê êzîdxanê bû, wê serdemê desthilatdarîya emewîya zext û zorîyeke mezin li neteweyên ola islamê qabûl nekiri dikirin, neteweyên herêmê Asûrî û Kurdên ji bawerîya ezdayetîyê ketîbûne ber wê zexta giran. Pêşîyê şert avêtin ber asûrî û Kurdên ji bawerya ezdayetîyê, gotin yan hûn dê bêne ser bawerya Îslamê yan jî hûn dê bacê bidin. Mir Hesenê dasinî zanî daxwaza wan dagirkirin û talan e, hizrên xwe kirin û şertên wan gengeşe kirin, qebûlkirina îslamê; têkçûna çandeke qedîm ya bi hezaran sala bû, û ketina ber tora netewa ereban bû.

Bac dan: rê li ber talan û şelandinê vekirin bû. Lê bac dan dev ji eslê xwe berdanê bi rûmetir bû û bac dan qebûl kir, lê ereba bi hêceta bacê dest didanî ser hemû mîr û malê wan, piştî bac dan kete vê rewşê, Mîr Hesenê Dasinî derkete holê û bac nedana ereba.

Arîşe mezin bû, erebên emewî bi leşkerekî giran hatin ser êzîdxanê, ji heftêûçar fermana herî giran bû, bi hezaran leşker hate ser Kurdistanê.

Di şoreşa Libyayê de, bi filîmê akterê navdar Antonyo Quwin, Her kesekê dîtîye ka çawa leşkerê Emer mûxtar li dijî dagirkerîya Îtalîya de dema ketin tengasîyê da nerevin, çongên xwe digirêdan û heta mirinê li berxwe didan. Mir Hesenê dasinî jî bi leşkerê xwe wisa bi mêranî berxwedanek kiribû, leşkerê dewleta emewîya deh cara ji yê Mir Hesenê dasinî zêdetir bû, mezina gotîye hejmara zêde ji mêranîyê derketîye, bi wê rewşê jî Mîr Hesenê dasinî û leşkerê wî rûmeta xwe parastin.

Pêşîyê Mîr Hesenê dasinî ehd kir, ehda wî heta mirinê berxwedan bû, xêzek li dora xwe kêşa, ehd kir heta mirinê ji xêza dora xwe dernekeve û li berxwe bide, şûşa jehrê xiste di berûka xwe de, heke nehat kûştin, da jehra di şûşê de vexwe û bi saxî nekeve destê dagirkeran. Piştî wî ehd kir û xêz li dora xwe kêşa, leşkerê wî jî tev ehd kirin û xêz li dora xwe kêşan, hejmara wan gelek ji ya dagirkeran kêmtir bû, lêşkerê eraba wekî lehîyekê bi ser wan de hat, şerekî bê mohlet bi dûjminekî bê bextre kirin.

Mir Hesenê dasînî û leşkerê wî ji xeleka xêza xwe derneketin û ehda xwe xirab ne kirin, bi wêrekî û mêranî heta mirinê li ber xwe dan, fermana giran bi wêranîyeke mezin û qetl û xwinekê giran bi dawî bû.

Van salên borî  li herêma Elihê zaroka dema zarokekî ezidî didîtin, xêzeke xelek li dorê çêdikirin, zarokê ezidî heçkû te sûrek li dora wî çêkirî di ma asê û ji xêzê dernediket.

Hêj heta niha jî dema kesek xêzekê xelk li dora Kurdekî ji bawerya ezdayetîyê bikêşe ji xêzê dernakeve, heta kesek ji derva xêza xelek xirab bike û rê li ber veke, ev ehd û soza Mîr Hesenê dasinî ye ji alîyê Kurdên êzidî nehatîye xirabkirin û ne hatîye jibîrkirin,  hatîye parastin.

Berxwedana Emer mûxtar bû filîmekî navdar, akterê navdar Antonio Quine rola Emer mûxtar leyîst, berxwedana Mîr Hesenê dasinî ji ya Omer mûxtar mezintir e lê mixabin kêm kes dizanin.
Evdï ji bawerîya ezdayetîyê bû bi darê zorê baweriya islamê qebûl kiribû, li diwanxana mîrê bohta xizmet dikir, ji ber Mir Hesenê dasinî ji baweriya ezdayetîyê bû, li diwanxana mîrê bohta digotin Mîr Hesenê batinî, lehengê dîrokî bi hişmendîyeke batinî tawanbar dikir, dilê Evdî dişewitî û digirîya, lê ji kesekê re nedigot ka ji ber çi digirîya,

Ev gotina xirab di strana Cizîre, bi van hevoka tê gotin:

Cizîre cizîre way


Mîr Hesenê batinî

Evdê çima tu digirî

Heçkû xelkê yara te birî

Mîr Hesenê dasinî di dîroka Kurdistanê de yek ji wan kesa ye, yê xwe bi saxî ne xistîye destê dagirkera.

Heta em kurd hemû ol û bawerîya nêdin alîyekê û li hişmendîya netewatîyê xwedî dernekevin dê her rûbirûyî komkûjîya bibin.



"

Wek tê zanîn Xelîlê Çaçan mêrê Eznîva Reşîd e. Herdu bi qasî nîv sedsalek bi hev re xebitîne, bi gorî çavkanîyan, dora 1800 kilam berhev kirine, di radyoyê de qeyd kirine û xistine milkê miletê xwe.


Têmûrê Xelîl

## Kerem bikin fikirên Kemal Burkay, Rohat Alakom, Nura Şane, Zerduşt Öztürk, Mehmed Salih Bedirxan û Husên Hebeş:

**Kemal Burkay**

**Radyoya Rewanê û Eznîva Reşît**

Wek duh îro jî, di dilê min da ji bo Kurdên Sowyêt şa û hezkirinek heye. Ev şa û hezkirin ji xortanîya min tê, ji radyoya Rewanê dest pê dike. Me radyoyek kirîbû û kêfxweşîya herî mezin ji bo me guhdarîya radyoya Rewanê bû. Gundî cara pêşîn ku pê hesîyan radyoyek jî bi zmanê wan qise dike û kilaman dibêje, him ecêb man, him jî gelek kêfa wan hat. Klamên radyoyê dilê Kurdan disot. Dema diçûn bajêr û ji xwe ra radyoyek dikirîn, ji dikandar ra digotin "radyoyeke usan ku, bila radyoya Rewanê bikişîne!"
Dengê spîkera radyoyê ji bîra min naçe. Yeke jin bû. Bi dengê xwe yê nerm û şîrîn xeberên rojê û şirove dixwendin. Bi axaftina wê ya zelal em tê gihîştin ku bi zmanê Kurdî jî meriv dikare xweş qise bike, merama xwe bêje, pirsan şirove bike… Navê xwe Eznîva Reşît bû. Dîya hevalê me ê delal, Têmurê Xelîl e, ku me bi salan şunda naskir. Ji tiştên xweşik yên ji berhemên radyoya Rewanê yek jî berhemên folklorî, destan û çîrokên Kurdî bûn. Yek ji bîra min naçe: Çîroka "Memê û Eyşê". Mêrê Eznîva Reşît, Xelîlê Çaçan ew çîrok bi zmanê şiêr wek destan careke din nivîsandibû, ango kiribû menzûm. Piştra hînbûm ku ew berhemê delal jî ya Xelîlê Çaçan Muradov e, mêre Eznîva Reşît, bavê Têmur, ku ew destan kiribû pîês. Xelîlê Çaçan nivîskar bû û bi salan jî serkarê Radyoya Rewanê bû. Xuya ye malbateke welatparêz, hunermend, jîr û jêhatî...



## Rohat Alakom


### Eznîva Reşîd berî 58 salan bi kurdî nivîsîye...

Nivîseke Eznîva Reşîd ku di roja 8/3 1962an de di rojnameya Rya teze de hatiye weşandin ji çend aliyan ve balkêş e. Eznîva Reşîd (1924-2000) 27 salan wek bêjer (spîker) di Radîyoya Rewanê de kar kiriye. Di salên xwe yên dawîn de di fîlma“Kilamek ji bo Beko” (1992) de jî cîh girtiye. Li ser koçkirina Eznîva Reşîd re îsal bîst sal derbas dibin. Ew, jina Xelîlê Çaçan Mûradov û dayîka rojnamevan Têmûrê Xelîl e. Ev nivîsa ku berî 58 salan hatiye weşandin wek mesajek, peyamekê jî dikare bê hesibîn. Nivîs di warê dîroka pîrozkirina Roja Jinan ya Navneteweyî de dokumenteke balkêş e. Ez qet têkilî zimanê vê nivîsê nebûm, li jêr latînîya tekstê wek xwe diweşînim.

### Dotêd k'urda derheqa roja xweye îroyîne bextewarda distrên

**Eznîva R'eşîd**
**(Dîktora xeberdanêd r'adîoêye p'ara k'urdî)**

“Çiqas r'oje p'êlêd r'adîoê ser deşt û zozanar'a, gelî û gebozar'a, ç'ya û banîyar'a bi hezara kîlomêtra r'ê dibir'in û dengê dîktor û dengbêjêd me dighînine welatêd dûr û nêzîk, r'adîoguhdarêd me.
Nava dengê wan dengbêja da nin usa jî dengê qîz û k'ulfetêd k'urd, kulfeta k'urd, ya ku berî qeydê sovetîê nava belangazîê û zelûlîêda bû û îro welatê sovêtîêda bûye uzva mexluqetîêye t'am, xweya r'isqet û îzna xwe.
Ji guhdarvanêd me k'ê Sûsîka Simo, Belga Qado, K'ubara Xudo, Zadîna Şekir, Asa Avdel, Naza Kokil, Seyrana Musa û gelekêd mayîn nas nake, yêd ku bûne h'izkirîê guhdarvana. Çiqas h'eftêye ji r'adîoguhdara bi deha name têne stendinê, wekî dengbêjêd qîz wanar'a k'lama bistrên.
Ewana k'lamêd derheqa Lenînê mezin, Partîa Komunîstîeye azadar, derheqa emrê xweyî îroyînî bextewar, derheqa xebatêda, merivêd xebatkarda, qeydê kolxozîêda distrên û usa jî k'lamêd bengîtîê, govenda, mêranîê dibêjin.







Gelo ji r'adîoguhdarêd me k'ê k'lama "Kolxozêd me kanîne" nebîhistiye, ya ku koma qîza distrê. Vira qîzêd k'urd derheqa e'mrê xweyî t'êr û t'ijîda, derheqa emrê kolxozîêda distrên û dibêjin, wekî kolxozêd wan kanîne, li deşt û zozana danîne, kîlerê wan t'ijîne, xebatçîêd wan jî cindîne.

Îro r'oja 8-ê martê em çawa h'emû jinar'a, usa jî omidêd xweye dengbêjr'a açixîêd xebatê dixwazin û dibêjin: derheqa emrê meyî bextewarda dha kubar û blind bistrên dotêd k'urd... Bra dengê we çar qulbê dinê belabe û her yek bizanbe, wekî cimae'ta sovêtîê çawa dixebite, dijî û ax'riya merivayêye nûr-komunîzmê çêdike"

(Ji tîpên kirilî: R. Alakom)

**Nûra Şane ser Eznîva Reşîd**

Wexta di mekteba seretayî da bûm ji min ra wisa dihat hemû dayîk kinik, qelew, laçik spî û rûgeş in, hemû bav jî zeîf, dirêj, mehd tehl û pircaran jî tilî di pozê da wek ku li xezîneya Nebî Silêman digerîyan bûn. Û ne Dê ne jî Bav ticar mekteban naxwînin...

Min berî çendekê nivîsek gelek xweş xwend behsa xanimek bedew û kurdewar dikir ku ne carek, lê 27 salan her ro di radyoyê da: "Yerevan xeber dide... Guhdarên ezîz! Pey deng û behsan ra hûnê şirovekirinê bibihisîn, dû ra jî em ê çend kilamên cimaeta kurda ji dengê Şeroyê Biro, Efoyê Esed û Zadîna Şekir bidin...".

Wexta min vê nivîsê xwend bêhemdê xwe min herdû rewşa da berhev, ew bîranîya min berî 15-17salan bû ku ez ewqas heyîrî dimam; wexta dê û bavê keseke xwendî bûna... û ew xanim di sala 1926an ji dayîk bûye û di wê zemanê da zanistgeh xelas kirîye. Çiqas heyf ku bi bihorîna dem û demsalan va rewşa meya perwerdehîye her û her paşva çûye. Ew xanim Eznîva Reşîd e, sala 2000î çûye dilovanîya xwedê, wexta duh nivîs xwend min dît ku rojbûna wê 18.05.1926 bi vê riyê rojbûna wê li me hemûyan pîroz be, ji ber ku hişyarkirina miletekî da rolek wisa sereke da bi serfirazî cîh girtîye... înşela ji vir pê da di nav gelê kurd da hêjmara jinên wisa wêrek û xebatkar zêde bin ku ew rewşa mina berî 16 salan cardin li ser tu zarokek kurd dubare nebe!

**Zerdüşt ÖZTÜRK**

**Ezîza ber dilê guhdaran: Eznîva Reşîd**

“Yêrêvan xeber dide... Guhdarên ezîz, niha deng û behsên teze bibihên... ”




Dengek nerm, zelal, dengê dost û hevalan, dengê xwedîyan, xwûşk û birayan, bi zimanê Kurmancan... hêvî ev nebe, çîye?

“Guhdarên ezîz, dengê Radyoya Rewanê kilamên cimaeta Kurda pêşkeşî we dike.... ”

Di sala 1955an de, gava wê radyo vebe, ji bo bêjerîyê (spîkêr) ji nav civakê, ji mêra û ji jina namzet tên xwestin. Gelek kes serîyan lêdixe. Ji wan yek jî Eznîva Reşîd e. Wî çaxî bîst û neh, sî salî bûye. Wî çaxî bîst û neh, sî salî bûye. Ji ber ku Kurdî baş zanibûye û baş bikar aniye, dengê wê nerm, zelal û xweş bûye, di nav gelek namzetan de tenê ew tê jibartin.

# EZNÎVA REŞÎD, YEK Jİ WAN JİNAN E KU KETÎYE DİL Û DEFTERA KURDAN.

Eznîva Reşîd, her wiha dibe bêjera yekemîn ya radyoya fermî ya dewletê û heta salên 1982an, bi qasî 27 salan, dengê xwe digîhîne guhdarên xwe yên ezîz. Îro kesên ku emrê wan ji çil salî zêdetir be, hema bêje herkesê ji wan, qet nebe carek bûye guhdarê Eznîva Reşîd û bi anonsên wê gelek dengbêj nas kirine û ji wan hez kirine.

Radyo, du sala weşana test dike. Di wan herd salan de xebatkarên radyoyê tenê Eznîva Reşîd û Casîmê Celîl bûne. Piştî du salê radyoyê temam dibe, Hikumeta Ermenîstanê û Yekitîya Sovyetê, di sala 1957an de ji bo rêvebirîya radyoyê komîsyonek ava dikin û serkarîya radyoyê didin Xelîlê Çaçan (Xelîl Muradov). Xelîlê Çaçan evî karî heta sala 1981an bi rê ve dibe. Her çiqas Dewleta Sovyetê hinek şert û astengîya derxistine pêş wan jî, radyo bi serkarîya serketî ya Xelîlê Çaçan ve, folklora Kurdî bi hemû taybetîyèn xwe ve gîhandiye miletê xwe.

Her wiha Xelîlê Çaçan bîst û çar sal kar û barê radyoyê dike, ne hêsan e. Di sala 1981an de jî diçe ser dilovanîya xwe. Wek tê zanîn Xelîlê Çaçan mêrê Eznîva Reşîd e.

Herdu bi qasî nîv sedsalek bi hev re xebitîne, bi gorî çavkanîyan, dora 1800 kilam berhev kirine, di radyoyê de qeyd kirine û xistine milkê miletê xwe. Her wiha ev herd kesê qedirbilind, kar, ked û qencîyên gelek biqîmet gîhandine radyoyê. Eznîva Reşîd, di 18ê Gulana sala 1926an de li Camûşvanê ya Ermenîstanê hatîye dinyayê. Navê bavê wê Reşîdê Ecem e. Reşîdê Ecem, di dema şoreşa Ûris de, wek Erebê Şemo ku em bi saya romanên wî nas dikin, Bolşevîkek bi dilê we bûye. Xêncî Eznîvê, sê kurên wî hebûne û ji hezkirina Lenîn, navê wan wek Vîladîmîr, Îlîç û Ûlyan ku nav, paşnavê Lenîn û navê bavê Lenîn in, li wan kirîye.

Kurmanca gotîye, “Mêr hene mêrok in, jin hene wêrek in.” Eznîva Reşîd, yek ji wan jinan e ku ketîye dil û deftera Kurdan.

**Mehmed Salih Bedirxan**

Bi mîlyonan kurd bi dengê wê şîyar bûn
Me hemûyan navê Eznîva Reşîd, yekem spîkera Radyoya Rewanê û mêrê wê Xelîlê Çaçanê Serokê Radyoya Rewanê bihîstiye.

Em ji hin lêkolînên derbarê Radyoya Rewanê têdigihên ku nifşên kurdan ê salên 1960 – 1970yî beriya her stranê, her piyes û her bernameya Radyoya Rewanê banga Eznîva Reşîd a ”Guhdarên Ezîz! Yêrêvan xeber dide…! „ bihîstîne û li ber meqama dengê wê kesereke kur kişandine.
Beriya bi çend rojan Doç. Dr. Yekta Uzunoglu (Yekta Geylanî) di malpera Riataza de bi sernava ”Milyaketên parêzkar ên muzîka kurdî” bîranîneke xwe ya ligel xanima kedkar Eznîva Reşîd û mêrê wê Xelîlê Çeçan nivîsandibû. Bi xwendina wê bîranîna Uzunoglu re haya me ji gelek tiştên nû derbarê Radyoya Rewanê û keda Eznîva Reşîd û Xelîlê Çeçan de çêdibe.
Di nezera me de hêja Uzunoglu divê wan bîranînên xwe bidomîne û zanyariyên nû derbarê malbata Çaçan de bi rayagiştî ya kurdan re parve bike.

**Helbesteke dr. Husên Hebeş bi kurdî û almanî ser Eznîva Reşîd**

Helbest bi du zimanan – bi kurdî û almanî – di pirtûka Huseyn Hebeş a bi sernavê “Ronahiyê birîn meke” (bi almanî: “Verletze das Licht nicht”) da , di rûpelên 42 û 43 an da çap bûye. Mêze bikin, kurdekî ji Efrîna Kurdistana Rojava bûye mêvanê bêjera radyoya kurdî a Rewanê, behsa girara destê bêjerê-dayîkê dike, dibêje ku ewê bi dengê xwe “ewir zîndanî dikir” û hezkirina xwe ya di hindava dayîkê da bi van xetan va bi dawî tîne: ”Gava Eznîva dê em bicarekê li şûna xwe hêştin, kevir û kuçikên Kurdistanê jî melûl bûn û şîn girêdan”.



**Husên Hebeş**

Eznîva Reşîd : Rojnamevana kurde rehmetî
Porê Yêrêvanê bi tava tebaxî qijilî bû
ew gêj bûbû xwe davêt bextê hunikiyê
dengê ji zû de bi zimanê me li Kurdistanê
mizgîn û stiran lûs dikirin di dema ewir jî zîndanî dikirin
eger guh li awazên kurdî bigirtana û di ber re hilperyana
bi min re dipeyivî vê carê wek dê
girar ji min ra datanî û nanê sêlê li ser sifrê rêz dikir
ez kedî dikirim bi dilovaniya dayîktîyê
gava Eznîva dê em bicarekê li şûna xwe hêştin
kevir û kuçikên Kurdistanê jî melûl bûn û şîn girêdan.

Ezê çend gotinan ser wê yekê bêjim, ku çawa hinek kes – bi zanebûn an bê zanebûn – hewil didin karê Radyoya Kurdî a Rewanê reş bikin, keda wan kesan pûç bikin, ku bi saya wan weke du hezaran kilamên kurdî û ji 40î zêdetir pîês-şanoyên kurdî bûne milkê gelê me.
Nimûneyek: li Stembolê ji alîyê weşanxaneya Weqfa Îsmaîl Bêşikçî da pirtûka Zerî Înançê çap bûye bi sernivîsa ”DI RADYOYA ÊRÎVANÊ DE DENGÊ KURDÎ”. Înformatorê vê pirtûkê Celîlê Celîl e.
Texmîn bikin, ku me ewqas behsa Eznîva Reşîd kir, lê li vê pirtûkê behsa wê nayê kirinê, heta navê wê jî tune.

Ez nikarim bêjim ku di vê pirtûkê da şaşî hene, lê dikarim bêjim ku tê da rastî tune. C. Celîl bêy ku rojekê jî di Radyoyê da kar bike, bi zanebûn tevaya karê Radyoya Kurdî a Rewanê bi navê bavê xwe Casimê Celîl û neferên mala xwe va daye girêdan. Lê a rast ew e, ku ji wê malbetê ew bi xwe, diya wî û xûşkeke wî Zînê tu rojekê jî li wir kar nekirine, heta belkî riya Radyoyê jî nizanibûne. Bavê wî û xûşka wî – Cemîla Celîl çend salan ber destê serok û berpirsyarê radyoyê Xelîlê Çaçan wek bersivdarê beşa mûzîkê kar kirine, ew jî ne bo wê yekê, ku ji mûzîkê fêm kirine, lê bo dengbêjan peyda bikin, wana bi sazbendan ra bînine cem hev, studyoya bo qeydkirina kilaman kirê bikin û h.w.d.

Radyoya Rewanê çi ye? Stiran û pîês-miqam-şanoyên wê ne. Û ew hemû jî di dema serokatîya 24 salan ya Xelîlê Çaçan, bi redaktorîya wî, bi biryara wî û bi cesareta wî hatine qeydkirin, belavkirin û bûne milkê gelê kurd. Piştî mirina wî tu kilamek û pîêsek nehatîye qeydkirin. Û di wê pirtûkê da behsa Xelîlê Çaçan jî nayê kirinê. Ango, jin û mêr zêdeyî nîv qurneyî ew karê pîroz meşandine û navê wan di pirtûka ser dîroka Radyoya Êrîvanê da tune. Ez bi xwe jî 3 salan, piştî mirina bavê xwe bûme redaktorê beşê yê wê radyoyê û, hilbet, navê min jî tune.

Ew pirtûk bi reng, ciddî çap bûye. Xwendevan jî lê dinêrin, ku pirtûk bi bergê bedew e, nivîskar keseke navdar e, weşanxane ser navê kesekî binavûdeng e, înformator kesekî naskirî ye û yekser dikirin. Pirtûkfiroş jî kêf dikin, ku zêde difiroşin, bêy ku ew û xwendevan bizanibin ew pirtûk mînanî dermanekî ye, ku ji navê wî xuya dibe, ku her nexweşîyan qenc dike, bêy ku haya wan hebe, ku di hundurê wê jehr e û dikare her kesî bikuje.



# EDNAN DOGAN

## NEWROZ

Ez ê hîna çend bedenan bişewitînim,
Bi agirê te û
Çend Dehaqan gêr bikim
Di Newrozan de..?
Çiyayên bênewal agir in û
Newalên bêbinî tijî Dehaq in û
Her roj NEWROZ e!

## WELATO..!

Ji deştan hêsir,
Ji newalên te xwîn diherike.
Çemandî ne bejna berfînkan,
Di quntara çiyayên te de...
Zarok li şopa lingên dayikên xwe digerin,
Li çol û beyaran
Û va ye dîsa bihar hat...
Kakul, mijank mijank êşê diniqutînin
Bi ser rûçikan de...



# Newaf Mîro

## Pirs û Tirs

Ciyê pirs lê nebe tirs lê heye, yan ciyê tirs lê hebe pirs girtiye.
Jiyanê bi pirsê destpêkir, hebûna Xwedê û tunebûna Xwedê jî pirs e.
Hebûn û xwebûna me jî lêger û pirse.
Azadî di mejî de çirûske, Çirûsk pirse, bersiv gava ber bi azadiyê ve ye, lê azadî ne sekan e, di herike, bi demê re diherike, bi demê re xwe nû dike, gava xwe nû neke, ne azadiye, dibe ava baş neherike, û şêlû ye.
Mirov di xweza xwe de nêçîrvane, di pîleya yekem de mêr/nêr. Şêlûbûn, tarî, alozî û şer dibe ewrê reş, xeta sor, xeta Xwedê, xeta dewlet û yasa, ya hizrî û her car bi cûreyekî din û babetekî din, dikeve pêş pirsê. Pirs bi tirsê, tê kuştin, tê pêçan, tê girtin.

***Mirov bi bend û dîwarên toreya, hizr, û şerefê têne kuştin.***

Tevî ku hizr bêsînore, lê sînorên di hişê mirovan de hatine sazkirin, yên herî tund, kujer û dijwar in. Di civaka bêmaf de, yê herî bi bandor û berdest, ew bendên mejî ne. Mirov bi bend û dîwarên toreya, hizr, û şerefê têne kuştin. Ew tore û bend dibin navekî din yê xwekuştinê yên tebeqa herî lawaz û bêmaf.

Wezîrek, generalek, serok û karbidestên navdar, nabin kujerên namûsê. Jinên navdar, yên serdesta nabin "deqa bênamûsiyê", tenê yên mafên wan di yasayan de eyan nebûye û ne xwedî heman mafî ne, dibin qurbanî.



Çima xelkên herî kêm di dewletekê de, yan di nav civakekên herî xizan de diqewimin ev tundrewî?
Navên; nezan, xayîn, hemal, terorîst, rêbir, tundrew, çîprût, pêxwas û navên din dibin yê kêmnetew, ol û çînên qels?
Maf, Heq navê Xwedê ye, jiyan û azadî pirse, ne tirse. Ciyê maf, azadiya ramanê, mafê wekheviyê nebe tirs desthilatdar e.
Mirov bi qasî mafê xwe heye û mirove. Dinya mirova bi qasî hizrên wan mezin, yan biçûke. Yê mafê wan nebe, bi saxî, yan bi hizrî, yan jî bi gelek cûreyên di tê kuştin.
Ciyê totem, tabû, û hizrên bi çarçove, qaşe û maşekirî hebin, pirs kufire, bêbawerîye, bê Xwedîtiyê, bê pîvantiye, bê exlaqiye, bê ûjdanîye, xayîntiye.
Zilm, yan pergala kolonyalîstan weke kevirên pîramîdan ne, yên herî zêde dihecigin yên ne di rêzê de xuya ne. Rêza herî binî, û ya hemû kevir li ser avabûne, dîsa li ser yên bê nav, rêz û ne xuya ye.
Ango; meriv dikare hemû rêzên xuya, yê pyramîda weke qatên serdesta, yên bi navê, ol, netew, ziman, dîrok, çand, ferasat, helbet wêje û felsefe, çep, rast, heta serdestên bindestan û hemû qadên din li  ser yê tune tê hesibandin ava bûne.
Şer, tekoşîn, yan hevrikiya herî dijwar, ya di nav bêmaf û xelkê bindest de ye. Axaftina herî asayî, hizrê herî asayî, yê meriv dikare bi serdest û kolonyalîstan re bike, meriv nikare bi kes û rayedarên bindesta re bike. Tevî yê herî zêde pêwîstiyê bi hizr, xwîn û nêrînên nû heye ew in, lê ew jî xwedî bend û totem in.
Azadîya bêsînor nîne, lê sînorên azadiyê jî nine, ew weke jiyanê û bi demê re xwe nû dike. Azadî me tişteke, her tişt e. Azadî ne tirse, pirs e.
Azadiya pirsê nebe, azadiya tirsê heye.
Her weha azadî tenê dikare bi wekheviya di yasa û zagonan de bête parastin. Ciyê parastina lawaz, sîvîl û hindika nebe, tirs maka hemû xirabiya ye.

# Abdurrahman Bedir

## LI WARÊN FIRARAN

1-
xemên şêh...
Û belgên çûrr li ser kirasê payîzê.
û kilên kujer, li çevên neyaran...
(kilên li awirê kujer, li dora çevên neyaran...)
û porşêrtînin zarrên li ber sungiyan.
û li çevan, kilên xemên şêh...

(li dora çevan, (xeta) kil, rêya kadiz...
li dora çevan, kilên şêh... kilên xemê, xemên şêh...)
qeda payîzeke şêh li me hat.
nifirên şêh li pey me bûn. nifir,
li ser belgên peyîzê nivîsî, çûrr nivîsî..
-me li ser belgên şêh de xwend, nifirên basko, pepûkên remildar in.

2-
û li wê zomê,(qirşek kêm bû )ji hêlûna pepûkê...
/qirşek ji hêlûnê kêm bû.
qirşek, bû stûna nifiran.
tewna kon, dilê jinekî de, bi axîniyê lidardiket.
di dile jinekê de demsal, payîz bû!
xem, di dil de şêhên orxe bûn. pel zêrrîn bûn, nifir kej...

3-
Zîlan...
di nav perên vê çîrokê de,
li deşta zozanî,
bi miradê qewma destşikestî,
sîya keriyek pez dikeve ser êlê.
hedad, li moriyan digerin li ser tirbên siyaran. siyarên hespkuj...
/ka were zoma jêrîn,
li nav berxvanan,
li ber gurê benda kozê,
pêjeka li ber avê,
pûşê li ber bayê,
bûye zengil ji stûyê payîzê re.
lê, tu bi şev mezin dibî. (mezin dibî dergûşê!) li zoma jêrê, nalê hespekî ketibû.
li ser nal,
rûyê danzdeh êlî, danzdeh zozanî...

4-
jinekî zarra xwe bi laçika xwe kefen kir.
kêr zivirî, zendên hedad jêkir.
ba, bû fesad li navbera payîz û zivistanê de. ketibû kincan ew kêvroşka serê çilan.



# Sıraç Oğuz

## ÎDRÎSÊ BİDLÎSÎ

Li ser Îdrîsê Bidlîsî, gelek lêkolîn û nivîs hene. Kurd bi pirranî ji wan lêkolîn û nivîsan bêhayîdar in. Lê Kurd, bi taybetî Kurdên çepgir bi çavkorî li Îdrîsê Bidlîsî dinerin. Bêguman Îdrîsê Bidlîsî jî ji rexneyên çê û xerab azad nîne. Lê Kurd di derbarê wî da rexneyên xwe bi neyartî tînin ziman. Hemû kirin û kiryarên wî şaş dibînin. Halbûkî yên ku Îdrîsê Bidlîsî rexne dikin ne ji dîroka wî ne jî ji kirinên wî hayîdarin. Divê ew dîroka Îdrisê Bidlîsî baş bê zanîn. Ji ber ku kirin û jiyana wî herdem Kurda eleqeder dike. Di dema xwe da kêm an jî zêde, ji bo Kurda gelek xebat kiriyê. Bi padişahê Osmanî ra li ser rêvebirîyeke xweserî û ziman peymanên bi du alî çêkiriye.

Esil navê wî Îdrîs e û ji Bidlîsê ye. Ji bo wê wek Îdrîsê Bidlîsî hatîye binavkirin. Di gelek çavkanîyan da bi navê bavê wî û bi navê bêşekariya (kariyer) wî tê binav kirin. Di hinek çavkanîyan da tê gotin navê wî Mewlâna Hekîmeddîn Îdrîs, Mewlâna Hûsameddin Elî-ûl Bidlîsî bûye. Di hinek çavkanîyan da jî, Mewlâna Hekîmeddîn Îdrîs an Mewlâna Hûsameddîn bîn Îdrîs El-Hekîmeddin hatîye binavkirin. Bûyîna Îdrîsê Bidlîsî sedî sed nayê zanîn. Lê di gelek çavkanîyan cîh digre ku, di sala 1452 ya jî 1457 da li Bitlîsê ji dayîk bûye. Di dema deshilatîya Akkoyunîyan da wek katibê diwanê dest bi kar kiriye.

Cara yekem bi navê Rîsalê-î Hazâniyye berhemek nivîsandiye. Paşê bûye Lelê yê zarokên paşa û sultanan. Dû ra wek mûdderîsek zana û pîroz di nav gelda tê naskirin. Cara ewil bi navê heştî bêşt, li pey wê jî bi navên cûda û bi Kurdî, Farsî û Erebî bîst û pênç berhemin wî bi xwe nivîsandiye, hene. Di dema Padişah Yavuz Selim de hûrmetek mezin dibîne. Di sala 1514 da li dijî Şah Îsmail dikeve nav şerê Çaldiranê. Piştî şer sedem alîkari û zanyarîya Îdrîsê Bidlîsî, Yavuz Selim wî dike şewirmendê xwe. Dema Tebrêz dikeve destê Osmanîyan, Bidlîsî li Tebrizê di mizgeftan da weez dide û li ser hêzê çavdêrî dibe Fermandar û rêveberê bajarê Tebrîzê. Bidlîsî piştî serkeftina Şerê Çildiranê, vedigere Kurdistanê û bîstûpênç Mîr û Begê Kurdistanê tîne bahev. Di navbera wan û Yavuz Selim da peymanê çêdike û xweserî ji bo kurdan dide ragihandin.

Yavuz Sultan Selim, di sala 1516dan da navenda Amedê radestî Bitlîsî dike. Bi nîşana Osmanî ya herî bilind a bi navê Kazaskerlik dide xelat kirin. Bi mûnasebeta vî xelatî hemû îdara wîlayetên Kurdistanê dikeve destê Îdrîsê Bidlîsî.

Divê dîroknas û lêkolînerên Kurd, bûyerên dema Îdrîs ê Bidlîsî bûne, bi zelalî bînin ziman. Gelek kirinên wî pir bi rûmet in. Jibo vê yeke divê Kurd Bidlîsî baş nas bikin, li ser kirinên wî nîqaş bikin û bi çavên neyarên xwe, li dîroka xwe nenêrin. Ji ber kû, milletek dîroka xwe nizanibe û neşopîne nikare xwe biparêze.



Gelek Kurd bi zanayî ya jî bi nezanî, dibêjin, Bidlîsî di dema xweda ji Osmanîyan ra xebatên serkeftî, li Kurdan jî îxanetekî mezin kiriye. Ji ber ku firsendên mezin ketine desten wî, lê wî ew firsend ji bo milletê xwe bi kar ne aniye. Û wê demê dewletek ji bo Kurda ava nekiriye.

Hê jî gelek sîyasetvanên Kurd, nivîskar û rewşenbîr fikren xwe yên salan bere didomînin. Ew kesên ku destkeftinên Bidlîsî hê wek îxanet bin av dikin, ew di mercên îro da jî ji bo Kurdan otonomîyê dixwezin, ku daxwazên wan ji destkeftinên pêncsed sal berê jî şundanin. Mînak, li Bakûrê Kurdîstanê, partiyên ji bo Kurdan ferederasyon, otonomî û xweserîyê dixwazin, gelo ferqa wan û Îdrîsê Bidlîsî çi ye? Heta evên belengaz hê jî nikarin bi zimanê xwe bipeyvin û siyaset bikin. Lê Bidlîsî wê demê bi zimanê xwe tevgeriya ye û siyaset kirîye. Qasî Kurdî Erebî û Farsî jî di qadekî bilind da bi kar anîye. Wekî din bi Padişahi Osmanî ra ji bo Milletê Kurd xweserî û mafê ziman bi dest xistiyê. Lê ew belengazên îro jî Bidlîsî xayîn binav dikin, hê zimanê xwe jî nizanin. Pir an jî hindik, ew zimanê xweşik û delal, îro Kurd pê di peyvin xêr û keda Bidlîsî têda geleke.

Têbinî: Min ji salan bere xwest ku rojek tirba Îdrîsê Bidlîsî bibînim û li ser tirba wî çend vêne bikişînim

Sala 2017an da roja 20ê Tîrmehê li Stenbolê bûm. Kek Nimettulah Atal navnîşana Tirb Îdrîsê Bidlîsî di malpera xweda parvekiribû, (İdris Köşkü Cad. Kerim Ağa Sokak- Fatih), ez û Kek Nevzat Yeşilbagdan em çûn ser tirba Bidlîsî û me jê ra dua kir û çend wêne kişand.

# Feqiyê Teyran



Axîna te nalîna min
Erd û asîman pir şîn e
Gulê ez canê te karvan
Mame wek kalek hilhile
Ez digerim li vê dinê
Sebra dilê xwe nabînim
Ka delala min bidin min
Min bi tiştan nexapînin
Geh dikevim geh radibim
Ez pêşiya xwe nabînim
Dil birîn e dil axîn e
Bidin roniya çavên min
Bidin roniya çavên min.

Gelo çima hûn serdest in
Em bindest in li vê dinê
Ez digerim li vê dinê
Sebra dilê xwe nabînim
Ka delala min bidin min
Min bi tiştan nexapînin
Geh dikevim geh radibim
Ez pêşiya xwe nabînim
Dil birîn e dil axîn e
Bidin roniya çavên min
Bidin roniya çavên min.

Feqiyê Teyran  yek ji fîlozof û helbestvanekî Kurd yê mezin û klasîk e. Feqıyê Teyran di sala Hîcrî 971 / Miladi1563/1564an de li Miksa ku girêdayî Colemêrgê ye ji dayîk bûye. Lê Miks, niha li ser Wanê ye. Feqiyê Teyran  H. 1041 / M. 1631/1632ê de di 70 saliya xwe de çûye li ser dilovaniya Xwedê û li gundê Şandisê yê Xîzana Bêdlisê hatiye veşartin.

# ÎHSAN BÎRGUL

## RASTNIVÎS XÎMÊ ZIMAN Ê RAST E



Me di nivîsa beriya vê de qala "Kurdiya standart ango Kurdiya akamedîk" kiribû. Îro jî berê tîrê rexneyan li xemsariya hemberî rastnivîsê ye. Dibe gotinên vê nivîsê li gorî nivîsa din wekî paradoks xuya bikin lê rastiyeke me jî ev e.

Em gotina dawiyê di serî de bêjin. Rast e, divê em ziman di nava gerîneka "zimanê akademîk" de nefetisînin lê divê em qasî wê jî ji bo nivîsa rast ango rast bikaranîna ziman hewl bidin. Çimkî diwarê li ser xîmê xwar rast naçe serî. Ancax bi avakirina hevsengiyeke di navbera "zimanê akademîk" û xemsariya li hemberî nivîsa rast de ziman xurt û pêş dikeve...

Piraniya vê xemsariyê jî mixabin gelek "stranbêj, hunermend û helbestvan" dikin. Vî zimanî najîn, nabêjin. Bes "bikartînin". Gelo zimanekî him ji dê û bavan mîras bimîne him jî meriv jê nan bixwe (di vir de qesta me ne tenê nanxwarina maddî ye, her wiha gelek kes bi xêra ziman dibin xwedî nasname û derûdorekî jî) layiqê zehmetê çend mehan nabe! Helbet tu kes ne mecbûre bibe zimanzan an jî mamoste lê peywira me hemûyan e ku em zimanê xwe bi rêk û pêk bi kar bînin.




Hunera xwe jî zimanekî rast û fesîh pêk bînin. Helbest ancax bi Kurdiyeke rast û rihê Kurdî dibe xwedîçêj, stran ancax bi Kurdiyeke têkûz li guhan xweş tê, hunera bi zimanekî xurt zèdetir hîtabê gel dike û gel ber bi ziman dikişîne. Wekî tê zanîn gel hemû liv û tevgerên xwedîhuner û ehlênivîsan ji xwe wekî mînak ango model dibîne û bi wî awayî tevdigere. Teşegirtina zimanê civakê piranî girêdayî zimanê zanayên civakê ye. Ev jî barê wan girantir dike...

Me dixwest em kevanekekî ji bo siyasetmedaran jî vekin lê ew mijar tena serê xwe dibe mijara nivîsekê. Dibe ku wê mijara me ber bi cihekî din ve jî bibe.

Tenê em dikarin vê bêjin; têkiliya siyasetmedarên "bêziman" û gelên ew nûnertiya wan dikin, dişibe zeviyeke li beyarekî ne av lê disekine ne jî tav...

Eger em derûdora nivîsa xwe bidin hev, wekî encam em van çend gotinan daynîn vir; helwesta me ya rast ya li hemberî ziman ne minneta me ye li ser ziman e berovajî sûdwergirtina me ye. Ziman kaniyek e, eger em bixwazin ji vê kaniyê çengek ava zelal vexwin, dibe em heriya navê paqij bikin. Wekî pêşiyên me jî gotî "dest destan dişo, dest vedigere xweyê rûyan dişo"....

Nişe: Her çiqas zextên li ser ziman zêde dibin, qasî wê jî derfetê pêşxistina ziman zêde dibin. Em di serdema teknolojîk de dijin. Dinya li ber destê me ye.



# EW Ê ME QİR BİKİN; XWELÎ Lİ SERÊ ME BE

## MERVAN SERHILDAN



Li dijî dagirkeriya ereb, ecem û tirkan heta sed sal berê jî helwesteke zelal a kurdan tune bû, yan jî hebû lê biryardariyeke bêveger tune bû; her çi hîkmet e, destê kurdan ji hevalbendiya van serweran nedibû, te digot qey hatibûn efsûnkirin, devê kurdan nedigeriya ji ew dagirkerên ku di bin rûpoşa Îslamê de Kurdistan perçeparî kiribûn û îradeya gelê kurd di bin nigan ve kiribûn re bibêjin “êdî bes e, em ji hev diqetin!”. Kêmasiyek, şaşitiyek hebû, lê gelo çi bû?.. Pêvajoya netewebûnê li nav welatên cîran bi bez û bazdan encam dabû, lê di Kurdistanê re bi çarpiyan meşiyabû; tevgirêdana netewebûn û serxwebûnê hêdî, giran, sist û sar; adetî 'bi zikişkê' pêşve çûbû... Her ku serhildanên kurd digihîştin asteke bilind; ji ber ku di warê hişmendiyê de ne zelal bûn, ji ber ku li ser nirxên biryardariyeke neteweyî rûneniştibûn, ji ber ku di qada navneteweyî de dostên qewîn wernegirtibûn, dîsa û ji nişka ve pêlên serhildanan berjêr dadiketin, îradeya serhildêran jar, lawaz û bêtaqet diket, keleka daxwaz û şîarên ku di serê dijrabûnê de dihatin jenîn, bi carekê noqî bin avê dibûn, pêşengên serhildanan di nav derb û delkên têkçûnan de dişewişîn; xwebaweriya serhildêran ditewiya, dinermijîn û ji neçarî li rê û rêbazên hevrejiyana gel û civakan digeriyan. Sed sal berê, belkî di vê lêgerînê de, hinek sedemên mafdar ên kurdan hebûn. Lewra hîn çawaniya qirker û komkujer a dagirkeriya Rojhilata Navîn ewqasî kifş û zelal nebûbû: Hîn, Serhildana Qoçgiriyê neşikestibû, Erzîncan û Sêwaz ji dest neçûbûn, kurdî qedexe nebûbû û li gelek herêman êl û eşîrên tirk, tirkmen û yoruk bi kurdî dipeyivîn; hîn salnameyên demê 1921 nedîtibûn.



Hîn 1925 serî ranekiribû, Serhildana Şêx Seîd têk neçûbû; hîn ji ber ku kurd bûn, gelek mirovên bêguneh bi biryara 'dadgehên taybet' nehatibûn înfazkirin. Hîn çavdêran nîşeyên navbera salên 1928 û 1930î nenivîsîbûn; Agirî çiqasî bi hêstrên xwînî giriyabû, li Geliyê Zîlan ji bo komkujiya gelê berxwedêr çend ton jehrên kîmyewî hatibûn bikaranîn, hîn ne diyar bûn. Hîn tu kesan li ser dîroka 1937an ramîn, hizirîn û sêwirîn nekiribû; hîn Serhildana Dêrsimê li sêdaran asê nebûbû... Îro em ji her çar perçeyan 'malbeteke çarbira' ne, lê çi sosret e ke her birayek, xwe dispêre dawleteke dagirker a Kurdistanê û lê çi gosirmet e ku her çar dewletên dagirker jî êrîşên qira mezin a kurd di nav şêwr û tifaqekê de, di nav ahengsaziyekê de dimeşînin, diceribînin, disepînin. Dagirkerên Rojhilata Navîn rêxistinkirî, rêzankirî û bi biryardariyeke teqezkirî tevdigerin; ango em hişê xwe nedin serê xwe, ew ê me bi kerî û parî bikin; ew ê bi risteke bêperwa me qir bikin, yan jî ji ber bêîdraqiya xwe, em ê qir bibin. Tirkiye cîhana rojava dixapîne û bi teknolojiya wan êrîş dike, Îran çavên hêzên kurewî yên rojhilatî girêdide; Rûsya jî li bende ye ku tax û kolan tevlihev bibin, war û welat li nav hev kevin, alozî gur bibin, da ku şûna nigên xwe fireh bike... Ger em vê heqîqetê fêhm nekin û şaşitiyên kal û pîrên xwe dubare bikin, em ê xerabtir têk herin; ger em parametreyên heqîqeta kurd esas negirin, em ê li gosirmetên dijwartir asê bibin.

Di navbera heyam û serdeman de, fitlek û badbadokên dîrokî hene ku tije qul û qulêsek in, serobinbûnên tofanî bi xwe re tînin; mişt derz, qelş û çavî ne, cih bi cih jî çahl û hezazên bêbinî ne. Piştî derbaskirina van fitlek û badbadokan, hingê li ber gelan deriyê dika çarenûsê vedibe. Ev bextewariya dîrokî jî diyar e ku amadeyî û rêxistinbûniyeke civakî û siyasî dixwaze, ahengsazî û plansaziyê dixwaze; serkaniyeke ku bi nirxên stratejiyê hatibe hûnandin dixwaze. Gel û civakên ku ji dem û dewrên kevn de xwe ji bo derbaskirina karesat û tofanên mirovî, civakî, gerdûnî û çarenûsî amadeyî nekiribin, di nezar û newalên 'neqeba dîrokê' de dişikên, dixeriqin...

Wek işareteke tofana nû, Şerê Cîhanê ya Sêyan didome ku ev, ji bo kurdan neqeba man û nemanê ye; ger hîn jî fêrek, waneyek, aqilek ji dîroka hezarên salan wernegirtibin; ger di ev pêjvajoya çarenûsî de jî bi serî û qiloçan li hevxin; li cihekî binivîsin, dagirkerên herêmê, ango birayên me yên muslimîn wê me hûrikhûrikî û qîtikqîtikî bikin; ew ê me qir bikin!.. Di gelek kevnedeman de kurd pev ketibûn, vayê niha jî pev dikevin û parametreyên berbiçav nîşan didin ku ew ê di dahatûyê de jî pev bikevin. Ger em bi sir û razeke efsûnî ji xewa mirinê şiyar nebin, ger em qeyd û bendên binikiyê neşikînin; em ê bibin nêçîra gur, hirç û keftarên herêmê; ew ê hestiyên me jî bikeritînin, ew ê me qir bikin; em xwe qir dikin, em ê qir bibin: Xwelî li serê me be!

Piştî bi dehan sosret, bextreşî, karesat û gosirmetên sed salî, berxwedanên kurd ger îro di ew cuh û xetan kevn re bimeşin, gelo li naverastê pirsgirêkeke kronîk cit nabe; gelo zingîniya sedsalan di bin guhên kurdan de dengekî venade?.. Li Rojhilata Navîn xetereya her cure hovîtî û rûxîneriyê heye; lewra serdestên herêmê ji sedsala huvdehan û vir de, li dijî nirxên mirovahiyê di nav hewldanan de ne; tirk, ereb û eceman di riya serweriyê de azwerî û bengîniyeke bêsînor nîşan dane; îro li ser axa Kurdistanê, li dijî hebûna gelê kurd tifaqeke qirker û dagirker pêk anîne.

Ger kurd li vê çerxê hayê nebin, ger ligel ewqas gef, tehdît û xetereyên li ser hebûna xwe jî, ji xewa mirinê şiyar nebin, ger li heqîqeta xwe venegerin, ger tavilê û bi awayekî lezgîn bergiriyên xwe negirin, li ber pêla êrîşên dagirkeriya Rojhilata Navîn a sedsaleke din, gelo ew ê karibin xwe ragirin; di bin ev çerx û birekên qirkerên heyamê de gelo ew ê karibin sed salên din bidebirin?.. Sed sal berê, pêşiyên me şaşitî kirin, mixabin ku li hemberî çerxên heyamê bêbergirî man, ji heqîqeta kurd û Kurdistanê re bersiveke mayînde neafirandin; lê bextê wan çê bû, krediya wan hebû, bi civaka xwe ewle bûn û bawer dikirin ku ligel şaşitiyên wan jî dê kurd karibin hebûna xwe bidomînin! Lewra dizanibûn ku zimanekî wan a qerase heye; dizanibûn ku jiyana kurd a taybet, ji çerxên dagirkeran gelekî dûr in; dizanibûn ku bişaftin û xwebişaftin ji xanî û sitariyên wargehên gelê kurd dûr in; dizanibûn ku dema xeter giran bibe, dê neviyên wan bersiveke dîrokî vejinin. Vayê îro tam û tekmîl, kurd di wê kertê de ne; xeter di asteke jiyanî de dijwar û giran e, birîn xedar e, rewş karesat e; karesat, li ser devê şûrekî dudev, çîroka hebûn û nebûna kurdan vedibêje… Li hemberî çerxên dagirkeriya Rojhilata Navîn jiyana taybet a kurd, herwiha ziman, çand û hunera kurd, wargehên kurd, erdnîgariya kurd; gund, navçe  û bajarên kurd îro bêmertal mane, bêsitar mane, bêdebar mane. Cîranên hêzdar, lê ne rêzdar ku derfetên teknîk û elektronîkê bi kar tînin tevahiya qalik û qewlikên jiyana xwerû ya kurdan bi kêr û xençerên elektronîkê qelş û derz kirine, birîne, şikandine; gelemperiya hebûna gelê kurd şax bi şax, gulî bi gulî û serî bi serî li ber çerxên qirkirinê danîne; hew yek kom, êl, eşîr, gund, navçe û bajar nemaye ku bi ser çerxên pergala qirker ve dahf nedane… Gelî xwişk û birayên ezîz, dagirkerên Rojhilata Navîn, ango birayên me yên muslimîn kêlî bi kêlî, derî bi derî û herêm bi herêm em ji ber hev de xistin, em qetqetî û qutqutî kirin; em qir kirin, me qir dikin û ew ê me qir bikin. Ger em kronîzma sed sal berê dewrî sedsala ku bê bikin; ger em kêr û şûrên ser stûyên xwe tavilê def nekin û temaşevaniya ev çerxa xwînî bikin, em ê qir bibin!..

Berê di nav kurdan de dayik û zarok wekî dînamîkên misogerkirina hebûnê dihatin nîşandan, lê jixwe dagirker jî ji bo ku van stûnan rûxînin, diyar e ku gelekî xebitîne û dixebitin. Di salên 1970yî de hinek bajariyên kurd digotin, “em li malê bi zarokên xwe re bi tirkî dipeyivin, çawa be li kuçeyan hînî kurdî dibin.” Niha li kuçe û taxên bajaran kurdî nayê axaftin, çend malbatên hestyar ku di malên xwe de bi zarokên xwe re bi kurdî dipeyivin jî, ji çar salî pê ve venêrîna zarokên xwe ji dest direvînin; lewra zarokên wan êdî di kuçeyên bajêr de û di dibistanên bişaftinê de, hînî tirkî dibin û dema vedigerin malê, bi dê û bavên xwe re jî bi tirkî dipeyivin, ango dê û bavan dibişivînin.

Dewran çi xayîn e ku di van salên dawîn de xetereyeke dijwartir rû daye, êdî li gelek gundan jî zarok li kuçeyan bi tirkî dipeyivin û dilîzin; jinên kurd êdî li ber televîzyonan, bi kelecan li rêzefîlmên zimanê serdest temaşe dikin ku ew rêzefîlm roleke hişbir dilîzin. Kurdiya ku dê bi saya serê jinên kurd û zarokên kurd bi zimanên serdest re qayîş bikişanda, îro sêwî, bêxwedî û bêsitarî maye. Ev parametre gelo çi nîşan didin? Beriya her tiştî, divê kurd rastiya xwe qebûl bikin; teknîk û elektronîkê masûniyeta civaka kurd, ragihandina taybet a navbera dînamîkên kurd ji bajaran û heta gundan kifş kiriye û bi plan û konseptên taybet û bênavber destwerdanê li diyalektîka gelê kurd dike. Ligel dagirkirina axa Kurdistanê ya bi hêzên leşkerî; bi derfetên radyo, telefon, televîzyon û înternetê hemû dînamîkên jiyana kurd dorpêç kirine û li ser ev qewmê qedîm adetî dagirkeriyeke çarqor ava kirine…

Bi armanca ku ji ber ev çerxa qirbûnê bifilitin, di serê kurdan de her çiqas aqil, kakil, dêhn û mejî hebe; divê bi ahengsazî, bi rêxistinbûnî û bi serkaniyeke stratejîk seferber bikin; hemû enerjiya dînamîkên neteweyî bicivînin, tomar bikin, veguherînin sînerjiyê û li ser dika berxwedanê harmonîze û senfonîze bikin; divê kurd di zûtirîn demê de hevdu hemêz bikin, li hev bicivin, pev bikelijin, nirxên şênber li pêş bigirin, asasê hevrejiyaneke azad, demokratîk û neteweyî deynin, her wiha rêgezên hevpar bi avahî û baniya xwe kin; na ku nexwe, bila xwe ji tofana qirbûnê re amade bikin!
Gelo kurd çi dikin, çima bêkeys dimînin? Gelo li kîjan perçeyê Kurdistanê yekitî ava kirine; li kîjan aliyî rêgezên yekitiya kurd pratîze kirine; li kîjan deverê demokrasiya navxweyî ferikandine; li kîjan nirxên xwe bi dilsozî xwedî derketine; di qada siyasî de, di jiyana civakî de, di qada çand û zimanî de yekitiyeke çawa afirandine?.. Em wek pênûseke azad dipirsin: Ka yekitiya siyasî; partiyên kurd, rêxistinên kurd û siyasetmedarên kurd çima heta vê çirkê yekitiya siyasî ava nekirine; ger vêya ne xema wan e, gelo ne li ser xeteke şaş in? Herî pir li Başûr nîvyekitiyek hatiye afirandin ku ew jî bi navbênkariya Amerîkayê ava bûye; lê mixabin ku di rastiya xwe de ev, ne hevrejiyaneke li ser nirxên siyasî û neteweyî ye; lewra duserî ye, duberî ye, duparî ye û dumejî ye; ma yekitiyeke wiha dibe? Ev nêzî sî salî ye ku li Başûr kurd di çarçoveya federaliyê de xwe bi rê ve dibin û ev nêzî sî salî ye ku Şerê Cîhanê ya Sêyan didome, diviyabû ku Başûriyan sî carî yekitiya xwe zexm û qewîn kiribûna. Mixabin, heta îro hertim hewl dane ku xwe bi sipartina dewletên dagirker ên herêmê û bi wergirtina alîkariya dîplomatîk a navneteweyî, serweriyeke teng û yekalî û dijdemokratîk li ser hevdu ferz bikin. Di hemû têkçûnan de jî, hevdu sûcdar dikin... Rojhilat di nav rewşeke şolî, kaotîk û perçeparî de ye; ligel ku faşîzma Îranê di bin tecrîdeke giran a navneteweyî de ye jî, partî û rêxistinên Rojhilat hem bi kêrî avakirina yekitiyê nehatine, hem jî ji bo kurtepêvajoyekê, hêviyeke afirandina yekitiya neteweyî nadin... Partî û rêxistinên Rojava dema ku serkeftina berxwedana wan li tevahiya cîhanê deng veda, diviyabû peymaneke ku mafên gelê kurd misoger bikira, bi Bişar Esad dabana îmzekirin. Lewra wê demê, Esad di rewşa herî jar, lawaz û bêdebar de bû. Piştî çend salan Tirkiye, Îran û Rûsya îro ji her demê bêtir destwerdanê li hebûn û destkeftinên gelê kurd dikin. Avakirina yekitiya neteweyî, ligel hevdîtinên yekitiyê jî ne hêsan e... Li Bakur hêz heye, girse heye, partiyek ku bi milyonan dengê gel werdigire heye; lê çawaniya ku ber û berhemên encamekê biafirîne nîn e. Partî, rêxistin û siyasetmedarên Bakur jî di warê avakirina yekitiya neteweyî de, bêkeys mane. Piraniya partî û rêxistinên Bakur, hebûna xwe di nebûna HDPê de dibînin. HDP jî zûde ye ku ji rêgezên Modernîteya Demokratîk qetiyaye, bi feraseta çîna navîn a taşeron û mutehîdan dimeşe ku nigekî vê çînê di navendên dewletê de ye û yê din di nav tevgera azadiyê de ye. Heta îro ligel bi sedan rapor, rexne û hişyariyên dostane jî mixabin ku HDP bi hişmendiyeke navendî, elîtîst, eklektîst û pragmatîst dibeze; lewma di warê avakirina yekitiya neteweyî de heta îro peywira xwe bi cih neaniye, bi vî aqilî nikare bîne jî; lewra xwedîderketina li rêgezan wê de dide û pifdanka populîzmê dinepixîne...

Kurd, ji dêlva ku rêgezên yekitiyê diyar bikin, makeqanûna yekitiya neteweyî ava bikin, sazîbûn û rêxistinbûnên neteweyî biafirînin; destwerdanê li alfabe, rêziman û rastnivîsa zimanê xwe bikin; gol û gewmên sînerjiya heyî jî biteqînin; her çar (yan jî çardeh) kurd li ku komcivînekê pêk bînin û xwe wekî rêber raber bikin û stûnên zimanê xwe birûxînin; bergiya kurd û Kurdistanê mij û moran e.


Hinek kurd çend birak û hevalan li xwe bicivînin û bibêjin; “Madem Celadet Elî Bedirxan alfabe, rêziman û rastnivîsa kurdî afirandiye û kurdan îtiraz nekiriye, mafê me jî heye ku em bi alfabe, rêziman û rastnivîsa Celadet Elî Bedirxan bilîzin, biguherînin”; piştre lê vegerin û bibêjin, “Eyy bêkeysê di gorê de, te digot kêmasiyên min hebin sererast bikin, a vayê me avakeriya te revîze kir, binihêre rastnivîs û rêzimana me ya nûjen, ji rastnivîs û rêzimana te ya nûjen bedewtir e; tu dixwî ji ev e, naxwî jî ev e!...” Li me jî dikeve ku nîşeyekê li pêşiya baneşanekê deynin: Ji xêra Xwedê û ji nirxên zimanê pîroz re, devê Celadet Elî Bedirxan bigeriya, wê çaxê me yê derbên damezrîneran bidîta!..

Xwedê şahid e ku tu gelan, tu olan, tu baweriyan û tu neteweyan bi qeysa kurdan pêşeng û serokên xwe weha hêsan, weha bêdad û weha bêwijdan neavêtine, nexistine û înfaz nekirine... Welo gorbihuşt got 'ger kêmasiyên min hebin, hûn ê sererast bikin' jî, gelo ji kê re got û kî şahid e ku gotiye “li ku derê çar (an jî çardeh) zimanzan gihîştin ser hev, bila komxebatekê pêk bînin û li gorî xwe teşeyekê bidin alfabe, rêziman û rastnivîsa kurdî?” Ma di hiş û mejiyan hiltê ku qaşo pisporên kurd û kurdî dubendîbûn, duserîbûn û perçeparîbûnê têxin nav dînamîkên kurd û Kurdistanê; ma nizanin ku encama vê helwestê kaos û qeyran e? Divê zanibûna, lê madem ewqasî bêperwa dimeşin, hinek kurdan jî mecbûr dikin ku ji wan re bibêjin, “Efendîno, li pişt Celadet Elî Bedirxan ji tevahiya beşên jiyana Kurdistanê desteka civakî û îradeya siyasî hebû; di bêrîka wî de, îradeya avaker û damezrîner hebû; berawirdkirina we û wî, heqareta li heqîqetê ye, lewra wî kurd û Kurdistan temsîl dikir; ew ne karmendê ereb, tirk, ecem û uris bû; ew sembola îradeya azad bû, ne di bin venêrîna dawleta dagirker de bû, weqfa wî bi dewleta dagirker ve ne girêdayî bû; ew kesên ku ji bo sererastkirinê işaret pê dikir jî, gelo piştî nifşên ku Kurdistanê azad bikin, îradeya avaker bigihînin felatê û kesên xwedîbawernameyên ku ji dibistanên Kurdistana azad mezûn bibin bûn, an hûn bûn?..

Hûn çiqasî zana û pispor bin jî, hûn ne nûnerên îradeya gelê kurd in; lê Celadet Elî Bedirxan hem pispor û zimanzan bû, hem nûnerê îradeyê bû, hem jî damezrîner bû; hûn li ku û Celadet Elî Bedirxan li ku!...” Dagirkerên Rojhilata Navîn siyaseta kurd, civaka kurd, jiyana kurd û erdnîgariya kurd perçeparî kiribûn, lê li Bakur di destê me de wekî stûneke Xwedayî hevgirtî, şidyayî, stûr û badayî zimanê kurdî mabû; heywax li min ev çi tofan e ku di bin rûpoşa zimanzaniyê de komikeke kurd ev sitariya hevgirtî ya gelê kurd jî dirûxîne, ruhê kurd û Kurdistanê ji heqîqeta wê diqetîne, qutedarekî din di noqa me kurdan de dikute, îşk û tîşkên qir û qiyamê dijidîne, direqîne, bêhnê li me diçikîne. Gelo dê kîjan sir û raza efsûnî me ji ev 'taya mirinê' rizgar bike?..

Em careke din bibîr bînin, dewletên dagirker ên Rojhilata Navîn her tim di nav şêwr û tifaqekê de ne; bi aqileke stratejîk dimeşin; hebûna gelê kurd wekî kelemeke çavên xwe dibînin. Li gorî şerd û mercên şerê cîhanê gavan davêjin, li gorî pêngavên hêzên kurewî, bi lezgînî û bi giştî ji nû ve bicih dibin; ango dînamîk in, pratîk in û bi biryardarî dimeşin. Mînakên vê rastiyê pir in, mesela Tirkiyeyê di hilbijartinên li Amerîkayê de heta roja dawîn alîkarî da birêz Trump, lê çawa ku Biden bi ser ket, dev guherand û ket nav liv û tevgerê ku xwe li gorî geşedanên nû bi cih bike. Îran û Iraq jî di nav hewldanan de ne.






Hedefa dagirkeriya Rojhilata Navîn destkeftinên gelê kurd e, hebûna neteweya kurd e û domandina çerxa qirker e. Ger kurd destên xwe daneynin ser serê xwe, ger kurd baskên xwe venekin û hevdu hemêz nekin, ger kurd ji viyalî û ji wiyalî de piştgirî û piştevaniya hevdu nekin, ger kurd Elîşêran, C.Elî Bedirxanan nestrînin û herwiha ger kurd tevahiya van bûyerên dîrokî rast nexwînin; piştre bila nebêjin kesî negot, vayê belengazekî jar û xemxur dibêje û dibilîne: Dîrok şahid e, gelên ku sosret û gosirmetên heqîqeta xwe nedidîtin û ji rastiya xwe diqetiyan pir bûn; lê îro navên wan li ser kevirên goristana qirbûyiyan qeydkirî ne; ezbenî, êdî bes bi qoç û qiloçan êrîşî ser nirxên xwe yên pîroz bikin, êdî bes serê dînamîkên kurd û Kurdistanê li bin guhên hevxin; Xwedê şahid e ger çepilê me ev çepil be, ger serê me ewqasî hişk û ji serkaniyê bêrî be, ger hişê me ewqasî rijî be, ger berê çeka me li doqa eniya xwişk û birayên me be; dê çarenûsa me li gopalên dagirkeran bigere û ew ê me qir bikin, em xwe qir dikin: Xwelî li serê me be!..

## ŞER Û WÊJE

# İkram Oguz



***Heps û zindan jî, sirgûn û koçberî jî ji bo bêdengmayîna wêjekar e. Bêdengî, ji bo wêjekar mirin e.***

Şer û şîn, du peyvên wekhev û bi hev ra girêdayî.
Du peyvên reş û tarî.
Bi xwîn û girî…
Bi êş û derd…
Jiber ku şer komkujî ye.
Kuştin û mirin e…
Terbîyekirina bi tîbûn û birçîbûnê ye.
Talankirina mal û mulk e…
Sirgûn û koçberî ye…
Trajedîya mirovahîyê ye.
Şer, wêrankirina gund û bajaran, xerabkirin û şewitandina xwezayê ye.
Di qada şer da, xwîn dirije û bi rengê xwe yê sor û gewez mîna ava çem û kanîyan diherike.
Xwîna xortên simêlxwîdayî, zavayên dest bi hine û bavên zarokên çav li rê…
Kujer jî, kuştî jî ew bixwe ne.
Ji bo çi û ji bo kê dikujin û tên kuştin, pirrîcaran ew bi xwe jî nizanin.
Dengê dile xwe nabihîzin, li denge zordar û tîranên xwe guhdarî dikin.
Ji xofa dengen wan fam û feraseta xwe wenda dikin.
Gund û bajaran wêran dikin, dar û daristanan dişewitînin.
Di bin kavilên gund û bajarên wêrankirî da jinên bî û zarokên sêwî, kal û pîrên stûxwar dimînin. Jiber vê yeke ye ku dibêjin, di encama şer da ne tene mirov, mirovahî û şaristanî jî dimire.
Nivîskara Belarûsî Svetlana Aleksiyeviç, ku xwedîyê Xelata Nobelê ya 2015an e. Aleksiyeviç di merasima xelatgirtinê da qala Şerê Cîhanê yê duyemîn dike û di derbarê encama wê da wiha dibêje:
'Di zarokatîya xwe da ez li gund dijîyam. Min ji lîstika di nav kuçeyan da dihat lîstin, pir hez dikir. Êvaran, jinebîyên gund, jinebîyên westyayî yên li ser sedirên dar rûdiniştin, weke miqnatis me ber bi xwe dikişandin. Bav û birayên wan, mêrên wan hemû hatibûn kuştin. Jixwe piştî şer nayê bîra min ku, di gundê me da jî mêr hebin. Di dema şer da, ji her çar mêrên Belarûsî yek, li enîya şer, yan jî di şerê partîzanan da hatibûn kuştin.

Dinya me ya piştî şer, tenê dinyayek ji jinan bû. Tiştên ku zêde di bîra min da ma ne, jinan qet qala mirinê nedikirin, tenê qala hezkirinê dikirin. Roja dawîyê, çawa ji hezkirîyên xwe qetîyabûn, demeke çiqas dirêj û bi hesteke çawa li benda wan sekinîbûn, çawa hê disekinîn... Sal û demsal derbas bibûn, hê jî li benda bav û bira û mêrên xwe bûn. Digotin: 'Bes ku vegerin, bê dest û bê pî bin jî, emê wan li ser pişta xwe bigerînin, Bê dest û bê pî...'
Wek gotinên nivîskara Belarûsî, wêje, ya jî wêjekar neynûkê li rûyê şer, ew rûyê wî yê qirêj digre û qirêjîya wî nîşan dide.
Heger ku xwedî tesir be, wêjekar dikare rê li ber mirina mirovahîyê bigre. Jiber ku, di jîyana wêjekar da şer cîh nagre. Bi xewn û xeyalên xwe, di dinyayek bê şer û kuştin, bê xwîn û girî da jîyaneke nû dixemilîne. Karê wî/wê fikr û afirandin e. Afirandina ji bo jîyeneke bextewar...

Loma, wêjekar di berhemên xwe da li rê û dirban digere, dixwaze ji gul û sosinên rengîn gulîstanek ava bike. Gulîstana xwe, bi peyv û hevokên ku di hemahengîya jîyana rojane da hatine jibîrkirin, dixemilîne û bi wan jîyanek nû jîndar dike. Di wê jîyanê da rê û rêbazên evîndarî û bextewarîyê nîşan dide.
Sedem vê yeke ye ku mîna kesên hunermend û zanyar, wêjakar jî mirovhiz û aştûxwaz e. Dijberê şer û pevçûnê, dijberê kuştin û mirina mirovahîyê ye.
Di jîyana wêjekar da hovîtî, di meclîsa hovîyan da jî wêje û wêjekar cîh nagre. Dengê wêjekar naçe guhê tîran û zordaran. Ji sûr û çeperên ku li çarnikalên koşk û serayên wan hatine çikandin, dengê wêjekar derbas nabe. Li dîwar û pencereyên wan dikeve û şûnda vedigere. Loma li welatên di bin desthilatîya tîran û zordaran da, warê wêjekar pirî caran heps û zindan, sirgûn û koçberî ye.
Heps û zindan jî, sirgûn û koçberî jî ji bo bêdengmayîna wêjekar e. Bêdengî, ji bo wêjekar mirin e. Zordar û tîran nizanibin ji, wêjekar vê yekê baş dizane û loma di bin her şert û mercan da deng dide û tu car bêdeng namîne.
Jiber ku amûrên wî/wê peyv û hevok, kare wî/we jî, bi xewn û xeyalên ji bo jîyanek bê şer û pevçûn, afirandin e.
Heta ku di berikê da peyv û di serî da jî hiş û hişmendî hebe, wêjekar deng dide û diafirîne...

# Sultan Yaray

## ROLA WÊJE Û DENGBÊJİYÊ



Wêje, ya ku ziman bi pêş dixe, teşeyê dide civakê û hiş û bîra civakê qewîn dike wêje bi xwe ye. Ji aliyê bîrdozî, ramanî, hêstiyarî û têgihîştina civak û neteweyan ve girîng û pêwîst e. Dîroka nivîsandina zilamê kurd zêdeyî hezar salan e, lê ya jina kurd ji ber ku ji nivîsê bêpar hatine hiştin, ji bo heman dîrokê meriv nikare behsa nivîsa jinan bike. Jinên kurd bêtir di wêjeya kurdî ya devkî de cih girtine. Jina ku ewqas di nav jiyanê de di têr û tijebûna serpêhatiyan de bûye, ne mumkun e ku nikaribe berhemên nivîskî biafirîne. Lê mixabin ji ber bêparbûna xwendin û nivîsê berhemên nivîskî ya jina kurd a dîrokê tune ye.

Wêjeya devkî di wêjeya kurdî de xwedî cihekî taybet e. Dixwazim li ser wêjeya devkî çend gotinan bi we re parve bikim. Tevî ku meriv nikare tam bibêje ku dengbejiyê kengî dest pê kiriye, li ku derê, ji aliyê kê ve û bi çi awayî cara yekemîn hatiye gotin, bi çi sedemî derketiye jî diyar e ku xwedî dîrokeke gelekî kevnar e. Peyva dengbêjiyê peyvekê hevdûdanî ye, ji deng û bêjeyê pêk tê. Her wiha wêjeya devkî gelekî beriya wêjeya nivîskî hebûye. Dengbejî tenê ne stranbêjî ye. Dengbêj, ew kesên ku serpêhatî, destan, çîrok, çîrçîrok, şer, êş, evîn, mesele, gotinên pêşiyan û buyerên dîrokî bi awayekî zindî gihandine nivşên nû ne.

Di dîwanxaneyan de, li odeyên mîr û began dengbêj xwedî cihekî taybet bûne. Yên ku zimanê kurdî zindî hiştine û parastine jî dengbêj bi xwe ne. Dengbêjî axîn û nalîna dilê dayikan, kela dilê mirovan e. Ew, kevneşopî û şerdên civaka xwe baş dizanin û binbîra wan gelekî xwirt e. Di ferhenga civaknasiyê de gotineke wisa heye. "Peyv difire, nivîs dimîne", lê belê kurdan bi saya dengbêjan, ev gotin vala derxistine. Lewra tiştên ku di dîrokê de qewimîne bi saya dengbêjan heta roja me ya îro hatine.

Di dengbêjiyê de rengê jinê çi ye?

Armanca min ne ew e ku wêjeyê bi nasnameya zayendî nîqaş bikim. Lê her çiqasî ku jin ji wêjeya nivîskî bêpar hatibin hiştin jî di wêjeya devkî de gelekî pêşketî bûne û di nav bîra dengbêjiya kurdan de cihê dengbêjên jin girîng e.

Tevî ku mêr û sîstemê xwestine dengê jinê bibirin û bitepisînin jî bi ser neketine. Jinan bi awayekî çalak stran gotine û afirandine. Her wiha êşên xwe, kêfxweşî, kul û xemgîniyên xwe, bi dengê xwe anine ziman.
Di govendan de li dîwanxaneyan li ber dergûşa zarokên xwe, li ser paleyiyê û di ber gelek kar û xebatên xwe re stran, dûrik, zêmar, lorîk, çîrok û mesele gotine.
Ji ew jinên hunermend yek jê jî Elmas Xanê ye. Li gorî lêkolîner Zeynep Yaş, yekem jina kurd a ku dengê xwe li ser qawanê tomar dike Elmas Xan e(Elmas Mihemed). Elmas Mihemed di sala 1894'an de li gundê Xargulê bi ser navçeya Qilebanê ya girêdayî Şirnexê ji dayik bûye. Bi navê xwe yê hunerî jî wek Elmas Kurdî tê nasîn.

Elmas Mihemed dotmama dengbeja navdar Meryem Xan e. Ew wekî malbat ji aliyê zargotin, huner û wêjeyê de têr û tije bûne.
Elmas Xan û malbata xwe di sala 1915'an de ji ber fermanên Osmaniyan derbasî Zaxoyê bûne. Dema diçin Zaxoyê têkiliya wan û bi gelek kesên ku ji bakurê Kurdistanê diçin başûrê Kurdistanê re çêdibe.

Li Zaxoyê gelek rewşenbîr û dengbêjan nas dikin. Elmas Xanê ji zarokatiya  xwe de ji gotina stranan hez dikir. Elmas Xan tênê ne bi dengê xwe, bi zanebûn û jîrbûna xwe jî jineke kêrhatî bûye. Ew jineke hunermend, rewşenbîr, pêşketî û dildara stranên kurdî bûye. Nêzî bîst û sê çar salan di radyoya Bexdayê de bi zaravayê kurmancî stran gotine û xebitiye.

Di arşîva muzîka kurdî de çar qawanên ku dengê xwe lê tomar kirine hene. Herwiha keda wê li ser dotmama wê Meryem Xan jî heye.

Bi kurtasî be jî dixazim behsa jineke din ya dengbêj bikim ku gelek ji me bi navê wê nehesiyane. Belê her çiqasî heta niha me dengê wê nebîhistibe jî, diya nemir Mihemed Arifê Cizrawî, Edlayê jî li herema Cizîra Botan dengbêjeke navdar bûye.

Ji ber ku dengê jinê wek eyb û guneh hatiye dîtin, gelek dengên ku me nebihîstine û nehatıne tomarkirin hene. Edlayê jî yek ji wan jinan e ku ji ber dengê wê nehatiye tomarkirin, me guhdariya wê nekiriye. Cizra Botan, warê alim, zana, hunermend û dengbêjiyê ye. Yek ji wan kesên hunermend û dengbêj jî dayika Mihemed Arif Cizîrî, Edlayê bûye. Dayîîka Edlayê li Cizra Botan bi starn, çîrok û qesîdeyan, bi dengê xwe yê xweş nav û deng bû.

Mihemed Arif Cizirî, gelek stran ji dayika xwe hîn bûye, li her aliyê Kurdistanê tê nasîn, lê wek me li jor jî anî ziman ji ber ku dengê dayika Edlayê nehatiye tomarkirin di nav civaka me de nehatiye naskirin. Hîn jî gelek jinên dengbêj hene ku civaka me wan nas nake. Ger lêkolîneke berfireh çêbîbe ew ê navê gelek jinên dengbêj, helbestvan û hunermendin dekeve ser dikê. Ger heta kurdan îro li himberî ewqas dagirkerî, talan û tunehesibandinê jî karibûne xwe biparêzin, ev bi saya wêjeyê ye. Çi nivîskî, çi jî devkî.

# HESEN Û MÊRANÎ

## AXA KURDİKÎ

Li Welatê Beroj merivekî bi navê Hesen hebû. Hesen merivekî gir, xurt û qerase bû. Li wê deverê mêrekî ku bikarîba pişta wî bida erdê tunebû . Dema xwe bi nêçîrvaniyê derbas dikir. Ji sibê heta êvarê li seydê digeriya û gelek caran jî bê seyd vedigeriya malê. Her cara ku bi destê vala vedigeriya mala xwe jina wî Mekiyayê pê re pevdiçinî û digot: Mêre xelkê diherin ji bona rizqê zar û zêçê xwe dixebitin, tu jî diherî bi tiştên vala de dikevî!
Qene te seydek bihanîya.
Yek ji wê yek ji wî şer gur dibû û Hesen tifing di ber guhê Mekiyayê re diteqant û digot: Tu çawa dikarî min û mêrê xelkê bidî ber hev!? Li vî welatî ez tu mêran di ser xwe re nabînim. Ka mêrekî ji min xurtir û jêhatîtir nîşanî
min bide. Her wiha ev rewş bi rojan , bi mehan, bi salan dewam dike.
Rojekê ji rojan dêya Mekiyayê tê serdana wê û dibîne ku guhên Mekiyayê ker bûne.
Dipirse : Keça min çi bite hatiye? Ev çi bi te hatiye, guhên te wisa ker bûne? Mekiya serpêhatiya xwe ji serî heta
dawiyê ji dêya xwe re vedibêje.
Dêya wê dibêje : Keça min heke Hesen careke din li te wisa kir. Tu bibêje li Çiyayê Qerejdaxê Şivanê Dirêj heye.
Ew ji te girtir, xurtir û mêrtir e. Û jê bigere.
Rojekê Hesenî dîsa bê seyd vedigere malê û bêhna wî jî zaf teng e. Mekiya wek her caran dîsa pê de dibêje û
dibe qirecira wan. Hesenî tifinga xwe radike û di ber guhan de diteqîne û dibêje: Hene ûlan di ser min re mêr ? Tu dîsa mêrê xelkê didî ber pozê min. Bes e êdî bes.



Mekiya dibêje : De tu jî xwe mêr dihesibînî? Wa yê dibêjin li Qerejdaxê Şivanê Dirêj heye. Ew ji te girtir, xurtir, û mêrtir e.
Hesenî dibêje: Çawa tu dikarî peyvên wisa bibêjî ? Şivanê Dirêj e çi quzilkurt e? Çawa dikare jî min mêrtir bibe?
Ez ê herim wî bikujim. Hingî tu yê bibîni ka kî mêr e an ne mêr e.
Hesenî wê şevê derdikeve û ber bi Çiyayê Qerejdaxê ve diçe . Bi destê sibê re digihêje Çiyayê Qerjdaxê. Dibîne
ku keriyek pez li ser bîrê mexel hatiye û şivan jî dî nav kulêv de pal daye. Hewl dide ku bi satilê avê ji bîrê bikişîne û vexwe, lê dike nake nikare satila avê ji bîrê bikişîne jor .
Şivan radibe tê cem Hesen û bendê satilê ji destê Hesen digire û bi carê de kaş deke jor .
Hesenî dibîne ku satila avê bi qasê beroşa kergê mezin e û şivan jî du qatê wî ye.
Hesenî cara yekem e ku merivekî ewqas mezin dibîne.
Şivan jê dipirse : Bira! Tu çi kes î , ji ku têyî kuda diçî?
Hesen dibêje : Navê min Hesen e. Ez ji Welatê Beroj têm û dibêjin li van deran merivekî bi navê Şivanê Dirêj heye. Ez hatime wî bikujim.
Şivan dibêje: Çi zirara Şivanê Dirêj gihîştiye te, tu ji bo çi dixwazî wî bikujî?
Hesen dibêje: Ez di ser xwe re mêra naxwazim Îca dibêjin ku Şivanê Dirêj jî mêrekî di ser pozê xwe re ye. Ji me Herduwan yek li vê dinyayê zêde ye. Divê ez wî bikujim. Da ku di ser min re tu mêr nemînin.
Şivan dibêje: Şivanê Dirêj ez im. De ka were kî kê dikuje. Û radihêlin hev û hevdû dibin û dihînin û Şivan zor Hesen dibe. Hesen dinihêre rewşa wî xirab e firsendê dibîne û ji destê Şivîn difilite û xirp û baz dide. Hesen direve û Şivanê Dirêj jî li dû. Bireve ha bireve.
De de axirê xwe digihîne cotkariyekî, dibêje: Cotkariyo! Ez ketime bextê te û Xwedê. Şivanê Dirêj li pey min ê û bigihêje min wê min bikuje. Tu çi dikî bike min jê bixelisîne.
Cotkarî , Hesenî digire û dixe devê xwe û di şûna diranê xwe yê şikiyayî de ci didiyê.
Piştî ku Şivanê Dirêj ji wan dibuhure diçe, Çotkarî, Hesenî ji foqa diranê xwe derdixe û datîne erdê, dibêje : wa ye Şivanê Dirêj derbas bû çû.
Êdî rehet be.
Hesenî , piştî ku spasiya Cotkarî dike û gelekî dia jê re dike , dipirse: Gelo ev diranê te çi pê hatiye? Min bala xwe dayê kurm – mirm lê neketibûn . Dibê qey şikiyaye?
Cotkarî dibêje: Erê, şikiyaye. Zemanekî ez û du hevalan ji xebatê vedigeriyan gundê xwe ,di rê de sir û seqem û berf û bahozek dijwar bi ser me de hat. Ji bo em neqefilin em ji xwe re li stargehekê geriyan. Me dît ku qafê (kilox) merivekî li ber zinarekî ye. Em her sê heval ketin hundurê wê qafikê bi wê sayê em ji qefilandinê xelas bûn.

Piştî pûkê hê me xwe amade dikir ku em derkevin herin, me hew nihêrî ku şivanekî rahişt wê qafê ku em tê de ne û xist kevkaniya xwe û li ba kir û avêt û em tev wî qafî li erdê ketin û ev diranê min şikiya.
Hesen dibêje: Haho ! Min jî digot qey di ser min re mêr tune ne. Lê ez rastî Şivanê Dirêj hatim ku du qatî min bû, paşê ez rastî te hatim ku ez di foqa diranê te hil têm . Û tu jî dibêjî ez û du hevalan ketine hundurê hestiyê serê mirovekî û hê yekî jî ew kiriye kevkaniya xwe û avêtiye.
Hesen berê xwe dide malê û diçe malê. Ji Mekiyayê lêborîna xwe dixwaze û êdî ji wê rojê şûn de qet qala mêraniyê nake.

# ZEYNELABİDÎN ZİNAR

## ZIRRA KERÊ Û LOTA DEVÊ

***Kerê Reş bîstikek li rê çû, hema xwe avêt erdê, nigên xwe kirin cot û xwe li mirîtî danî.***

Carekê ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran. Lê ji xeynî mar û mişkên li qulên diwaran.
Hebû tunebû, dibêjin carekê kerekî reş hebû. Rojekê kerê Reş ha ku dît wa ye deriyê axurê vekirî ye, hema rabû derket derva û bi çolê ve çû.
Kerê Reş çû û çû, giha mêrgekê. Li wirê dît ku va ye huşturek jî li wirê diçêre. Hema ras çû ba huşturê, rojbaşî dayê û her du li mêrgê çêriyan, demeke dirêj bi hev re man, kêfa xwe pir ji hevûdu re anîn û piştre jî bûn xwişk û birayê hev.
Kerê Reş û Huştur li wê mêrgê man û çêriyan heta ku bû serê havînê.  Êdî çêreya şîn li mêrgê qediya û hemû hişk bû.

Piştre Kerê Reş û Huştur rabûn çûn zozanan û ketin nava mêrgan, çêra teze xwarin, ava hênik ji kanîsarkan vexwarin û kêfa xwe serkêf kirin.
Ha wisa demek bihurî, Kerê Reş û Huşturê,  pirî ku giyayên pirtexlît û nefela sêbelgî li zozên dixwarin û di ser de jî diçûn ava hênik vexdiwarin, dîsa vedigeriyan diçûn giya, keta teze û nefel dixwarin, ji goşt zibittî bûn. Kerê Reş û Huştur herdu wisa qelew bûbûn ku êdî çirç di laşê wan de nemabûn, noqên wan dûz bûbûn û gewdê wan ji  goşt û bez nedihatin libatê. Li zozên gava li Ker û Huşturê dibû şev, herdu diçûn li devereke asê, yan li ber taldeyê zinarekî bilind mexel dihatin û pişta xwe didan hevûdu, hêj radiketin, da gur û hirç nikaribin bi hêsanî êrîş bibin ser wan.

Kerê Reş û Huşturê jiyana xwe li zozên her didomandin, geh dixwarin û vedixwarin, geh jî bihna xwe berdidan û
radiketin. Di wê navê re şevekê di derengiya şevê de Huşturê got Kerê Reş:
- Ha birayê Ker!
Kerê Reş bersiv da û got:
- Fermo, xwişkê tu çi dibêjî?
Huşturê got:
- Îşev ez pir di mexel de mame, divê ku ez rabim hin lottik bidim!
Kerê Reş bi Huşturê keniya û got:
- Eger tu rabî lottikan, ez ê jî bizzirrim.
Huşturê got:
- Na, na birayê Ker! Eger ez lottik bidim jî, zêde deng dernakeve! Lê eger tu bizzirî, wê dengê zirrîna te pir dûr here. Ha wa ye riya karwaniyan jî di biniya me re dibihure. Îcar eger hin karwanî di rê de hebin û dengê zirrîna te seh bikin, dê werin û me bibin têxin binê baran! Ha tu dibînî jî ku em ji hilgirtina baran filitîne û li van zozanên xweş gihane azadiya xwe. Çima tu yê rabî û di vê şevê de bizirrî? Dengê xwe meke, kes nizane ku em li virê ne.
Kerê Reş guhdarîya pendên xwişka xwe Huşturê nekir, hema rabû ser herdu nigên xwe yên dawî û herdu guhên xwe mûç kirin, serê xwe tîk bilind kir û zirriya.
Gava Kerê Reş zirriya, Huştur jî hema rabû ser nigan û çû gez dan Kerê Reş, da ew dev ji zîrrîna xwe berde. Lê belê Kerê Reş li zirrînê domand û ranewestiya. Gava Kerê Reş zirriya, demçax şev bû, şeveke bê his û pis bû, pêjn û xiştînî ji deverekê nedihilatin. Dengê zirrîna Kerê Reş di wê şevê de olam da. Ew deng li hemû gelî û baniyan belavbû û li zinaran dengvedêrî kir. Li wê herêmê ew şev çiqas jîndarên ku hebûn, hemû dengê zirrîna Kerê Reş dibihîst. Di wê şevê de karwanek li riya nêzê Ker û Huşturê diçû. Barê kerekî karwaniyan jî pir giran bûye û ker ji rêveçûnê ketiye. Îcar karwanî tev ji bo wî bar û Kerî heyirî mane.

Lê gava karwaniyan dengê zirrîna Kerê Reş bihîzt, kêfa wan pir hat û hema du peya rabûn rast berê xwe dan bi aliyê dengê zirîna Kerê Reş ve û çûn, da wî kerê zirrek bibînin û bînin da barê kerê xwe yê westiyayî lê bikin.
Herdu peya gava çûn, dîtin ku va ye kerekî reş e û huşturek jî li ba wî ye. Herdu zilam Kerê Reş û Huşturê dan pêşiya xwe û ew ajotin, birin çûn ba hevalên xwe.
Karwanvaniyan kurtanê kerê westiyayî li Kerê Reş kirin û barê wî jî avêtin ser pişta Kerê Reş. Piştre hevsarek jî xistin serê Huşturê û serê hevsêr bi kurtanê Kerê Reş ve girêdan, ew ajotin û li riya xwe çûn.
Hilgirtina wî barê giran, pir li Kerê Reş zor û zehmet dihat. Lewra demeke dirêj bihurîbû ku Kerê Reş neketibû binê baran û bi serbestî, bi serfirazî li mêrg û çîmenan geriyabû û çêreya şîn xwaribû.
Kerê Reş bîstikek li rê çû, xwe bi xwe sêwirî ka wê çi bike da ji wî barê giran xilas bibe. Carekê hema hat bîra Kerê Reş, eger ew xwe li nexweşînê deyne, wê karibe xwe ji hilgirtina barê giran rizgar bike. Kerê Reş bîstikek li rê çû, hema xwe avêt erdê, nigên xwe kirin cot û xwe li mirîtî danî. Zilamên karwanvanî kirin û nekirin Kerê Reş ranebû ser nigan.
Zilam rabûn ew barê giran ji ser pişta Kerê Reş hildan û avêtin ser pişta Huşturê. Kerê Reş jî rakirin ser nigan û hêdî hêdî li pey Huşturê ajotin. Kerê Reş bîstikeke din li rê çû, dîsa xwe avêt erdê û kire terrm. Zilaman vê carê Kerê Reş jî avêtin ser barê li pişta Huşturê û çûn. Barê li ser pişta Huşturê pir giran bûbû. Huştur ji ber wî barê giran ket nava xewn û tavilan, ew zozanê geş, ew mêrgên xweş, ew ava kaniyên hênik tev hatin bîra wê. Huştur pir hêrs bû, hema bangê Kerê Reş kir û gotê:
- Ha Kero!
Kerê Reş bi kêf û ken li ser pişta Huşturê bersiv da û got:
- Ha xwişkê! Tu çi dibêjî?

Huşturê got:
- Îşev te ya xwe bi min kir! Ez ji ber zirrîna te ketim binê vî barê giran. Lê eger çaxê lotta min jî hat, ji xwe tu yê bibînî! Ew çax ez ê zirrîna di nîvê şevê de bînim bîra te!
Kerê Reş dîsa bi ken got Huşturê:
- Heydê, de li riya xwe here, bila kes jî bi vê gotina te nehise. Huşturê deng nekir û di binê wî barê giran de çû, heta ku dinya ruhnî bû, tîrêjên rojê avêtin û her dever rind hate xuyakirin.
Huşturê ha ku dît, wa ye rê giha ser sirûmê newaleke kûr a bi kaş û kendal. Gava li jêrê nihêrî, dît ku di kaşê serberjêr de tev xîçir û kevirên berezî yên sertûj hene, li binê wan jî dît ku kemên stirî û yên dirrîreşkan in.
Huşturyê xwe bi xwe got: "Derb û keys îro ya min e ku ez niha tola xwe ji Kerê Reş hilînim! Eger na, ez êdî devereke wisa xeter hew dibînim!"
Huştur çû xwe da ser pozê jora kaşê bilind û bangê Kerê Reş kir, got:
- Ha Kerê Zirrek!
Kerê Reş di xewê de bû û bi dengê Huşturê veciniqî, serê xwe hilda û bi dengekî nermiçoqî got:
- Fermo, xwişka Huştur! Tu çi dibêjî?
Huşturê got:
- Ka li vê newala kûr binihêre!
Gava Kerê Reş çavên xwe vekirin û li jêrê nihêrî, dît ku va ye Huştur li ser sirûmê newaleke kûr a bi kaş û kevir e.
Li berpalê newalê xîçir û kevirên berezî yên sertûj hene ku mîna nişterê tûj in. Li jêra wan jî kemên stirî û dirrikan hene. Li binê dirrikan jî çemekî boş diçe. Kerê Reş pir ji wê xwezayê tirsiya, hema qîr da, hêvî û lava ji Huşturê kir, pê ve zarî kirin û got:
- Ez ketime bextê te! Min xirabî bi te kiriye, lê tu xirabî bi min neke.

Huşturê jî got Kerê Reş:
- Zirra te di nîvê şevê de hat, va ye lotta min jî di serê sibê de tê. Xwe rind bigire da tu nekevî, ez niha radibim lottkan.Huşturê lottik avêtin û di şûna xwe de reqisê, lottik dan û xwe pê re jî hilavêt, çend caran xwe qilopanî jî kir, dîsa rabû reqsê û lottik avêtin. Kerê Reş û ew barê li ser pişta Huşturê herdu jî pekiyan û di wî kaşî de gêndir bûn, teqle li ser teqlê dan, heta ku çûn jêrê.
Karwanvaniyan carekê dît ku wa ye Barê Huşturê terabûye û tevî Kerê Reş di kaşik de berjêr diçin.
Çend zilam bi bez li dû bar û Kerê Reş çûn jêrê, dîtin ku va ye bar ji hev pişkilîye û Kerê Reş jî feşiliye. Zilaman ew barê ku ji hev pişkilî bû, dîsa dane hev, termê Kerê Reş li wirê hiştin û hatin jorê, karwanê xwe ajotin û li riya xwe domandin.
Karwanî li oxira xwe çûn û gihan malê, bi jin û zarûkên xwe şad bûn.
Çîroka min jî çû nava dar û deviyan. Rehma Xwedê li dê û û bavên me hemiyan.






# Baranê Qereyazîyê

## Şev tarî bû

Şev tarî bû
Stêrk li ezmana bû
Hîva tijî Kurdîstan ronahî dikir
Ez ketim xeyaleke şîrîn
Min dît Kurdîstan ava bûye
Ala Kesk û sor û zer asimana ye
Çar perçê Kurdistanê bûye yek
Bêedaletî û zilm ruyê cîhanê rabû ye
Zarokê birçî û tezî nemane
Azadî û aşitî hatîye Kurdîstana rengîn
Neyartî û xaînî nava me rabûye
Xaîn û dijminê dora me belav bûne
Çîyayê sîpanê û şengalê roja azadîyê pîroz dikin
Kulîlkê serê çîya kilamê azadîyê dibêjin
Çîyayê Agirî hêsrê şabûnê dibarîne
Sîpan û xelat hevdu hemîz dikin
Firat û dîcle coş bi coş dikişe
Dibistan û zanîngehê Kurdî vebûne
Zarok û xortê me zimanê dayîkê dipeyivin
Bav û kalê me klamê mêranî dibêjin
Xuşk û dayîkê me govenda azadîyê digirin
Paşê dengê dayika xwe rabûm û xewna şîrîn hişyar bûm.
Min fêm kir ku ev tiştê xweşik xewneke şîrîn û daxazîyê bêdawî bû.

# Ciwan Serwer

## Çi Yê Me Ma



Can li me kirin wêran,
Em ji welat kirin,
Xwîn çandin çîyayê me,
Ne pir, ne jî hindikê me ma.

Bi koçberî em ketin rêyan,
Bi xatirxwestina ji çîyayan,
Em ketin bayê evdên zalim,
Ne şop, ne jî talaza me ma.

Tune hesibandin zimanê me,
Kêm xistin dînê me,
Em her yek ji hev kirin,
Ne kakil ne jî peyva me ma.

Çima ku em li dij zilmê rabûn,
Çima ku em li ber zalim sekinîn,
Çima ku em bûn yar bo mezlûm,
Ne çav ne jî rûyê me ma.

Her ku mirin em her roj bi nemirînê,
Her ku girîyan em bêyî hêsirbarandinê,
Berî ku kefenê li xwe bilefînin,
Ne pot ne jî paçê me ma.

Ji bo ku ji mirinan vejin,
Ji bo ku hebin di her biharê de,
Ji bo ku bigihîjin bêdawîtîyê,
Ne zivistan ne jî havîna me ma.

Min got Ciwan tu jî evd î,
Tu yê bibînî derman bo derdê xwe,
Gote min, bila dinyaya gewrik ya we be,
Ne xêr ne tehm ma tê de.

# Bahadin Robar

## TU YÎ

Ji Cûdî û Gabarî, tu bilbil û baz î
Li erd û asîmanan her efsûn û raz î
Di dilê evîndar de wek tembûr û saz î
Hêvî û armanc tu yî hêvîdar ez im


Komstêrk û roniya asîmanêm tu yî
Keywan û gelawêja ruhûcanêm tu yî
Di dil de hemû xezîne û mircanêm tu yî
Belengaz û derwêş û evîndar ez im

Tu Îştar û Sîn, Kîbele û Xec û Zîn î
Qible û perestgeh, bawerî, ol dîn î
Tu Xatûn û Şirîn, hemû eşq û evîn î
Zembîlfiroş, sirgûn û tobedar ez im

Gelek xweşiktir î ji keybano û Nefertîtî
Tu ar û agirê eşqa Afrodît î
Di dil de birc û keleh û pramîd î
Rêwî û sêwî û xizmetkar ez im

Cîhan û jiyan, welat û dîroka min tu yî
Raman û roman, helbest û çîroka min tu yî
Horî û perî, guldexwîn û şekroka min tu yî
Qaçax û revende û stûxwar ez im

Tu yî Jiyan û Hêvî, mebest û mirad
Dîcle û Firad, Mûnzûr û Mûrad
Tu yî mey û peyale, qazî û dad
Feqe û şagirt, sakî û gunehkar ez im...



# Jİ MİN GOTİN Û Jİ WE JÎ ŞÎROVE

## FARÛQÊ FEROYÎ



Di dem û dewranên berê de, qewmê qedîm, xwedî zagon û dil birahm...

Ji wan zagonên vî qewmî yek, di derheqê rêbertiya wan de ye: Ev qewmê qedîm û dil birahm, ji çend salan çarekê ji nav xwe rêberekî hildibijêrin û ji wî ra wiha dibêjin;

-Ji îro pêve tu rêberê me yî. Tu serê me û em jî lingê te. Tu yê rê nîşanî me bide û em ê jî bimeşin. Tu ji me ra bêje bimre, emê bimrin û tu bibêjî bimîne em ê bimînin...

Rêber; bikêrhatî çi ji destê wî tê,  ji bo qewmê xwe têdikoşe û wan ji xetereyan diparêze. Hetanî ku dikire di her warî de ji bo dewlemendiya qewmê xwe dikeve nav hewldanên bêhempa...

Çend salan bi serkeftî vê rêbertiyê bi kêfxweşî û dilşadî didomîne.

Êvareke ji êvarên bi xatirxwestina rojê re; êleke kinc reş û li ser pişta hespan, ji nişkan ve li vî qewimî dibin mêvan...

Rûsipiyên civakê û rêber bi hev ra vê êlê; bi mêvanperwerî pêşwazî dikin û mazûvaniya wan dikin. Cî nîşanî wan dikin û koça vê êlê bi war dikin...

Paşê; Rêberê qewmê qedîm û Rûsipiyên civakê li hev vedihebin û dibêjin;

-Ka em herin van mêvanên xwe ji nêz ve nas bikin...

Qewmê mêvanperwer;
Ji dilê xwe yê rast bibawer,
dimeşin û diherikin nav êlê. Kesên êlê yek bi yek vedihebin û kom dibin, qor digrin li hawîrdora mazûvan...

Rêberê qewmê qedîm dest bi axaftinê dike û dibêje:

-Em mazûvan û hûn jî mêvan.
Daxwaza mazûvan;
nasîna mêvan e...

Jîrekê êlê dibêje;

-Em êleke ji qewmê gur in. Ango dayika me dêlegur û bavên me jî gur e. Em hetanî aniha li Asya Navîn dijîn. Lê mixabin; cînê dîwarên bilind dan pêşiya me.

Em man li pişt wî dîwarî,
wan ji me ra nehiştin tu rê û derî.
Aniha; em tî, birçî û neçar hatin, li warên we bûn mêvan...

Rêberê qewmê qedîm dibêje:
-belê heyran;
Em mazûvan û hûn jî mêvan,
em xwedî û hûn jî cenan,
em Niştecih û hûn jî koçer,
di zagona qewmê qedîm de,
tu cûdayî tuneye ji mirovan re
lê dîsa jî hûn bi xêr hatin...
her azad û bextewar bin
wek hûn li mala xwe bin.

Piştî vê hevnasînê; mazûvan Pişta xwe didin êla guran û pê ve, jîrik û êla xwe kêfa belek dikin...

Jirîkê êla guran dibêje;

-Me cî da lingên xwe. Îjar divê em li gorî eslê xwe tevbigerin...

Kesên li jîrik guhdarî dikin; di ber axaftina wî ra dibêjin:

-Divê em pilanên qirkirina wan pê de bikin!

Jîrik dîsa dibêje;

-hûn bi baldarî tevbigerin û di destpêkê de divê em rûsipiyê wan ji xwe ra bikin hevkar û xirpikekê ji rêberê wan ra bikolin...

Jîrikê gurxenêq; eyarê miyê li xwe dike û dadikeve nav qewmê qedîm. Digihîje kîjan rûsipî; di derheqê wan û qewmê wan de, di derheqê rêberê wan de tiştên herî baş dibêje. Pesnê wan û qenciya wan dide. Hetanî xwe di nav wan de bi cî dike û pê ve; îjar dest bi paşgotinî û fesadiya rêveberiya wan dike ku Rêber li ber çavên civakê reş bike!!!

Çi derew û bêbextiyên ku civakê pê birîndar bibe, pê bihêşe bera stûyê Rêber dide!!!

Bi dek û dolavan , roj bi roj civakê li dijî Rêber, bê bawer dikin...

Rojekê ji rojan;

Sibê zû dibe gurmegurma defê li ber deriyê Rêber. Rêber bi kelhêcan ji hindurê malê derdikeve û dinêre ku gel tev li pêşiya mala wî, li hawîrdora kerekî civîyane. Matmayî dimîne û dipirse;

-We xêre? Vê sibê zû?
Rûsipiyên qewm dibêjin;
-Îro dema rêbertiya te bi dawî bû!!!

Bi vê gotina rûsipî ra ; sê-çar xort, bi lez, wek gurên ku dadin miyekê ra dihêlin Rêber û paşpaşîko li ser pişta kerê siwar dikin. Berê wî didin çiyayê ajalên dirinde...

Jîrik û êla xwe jî li derdora ker direqisin û diranan disûn...

Piştî ewqas ked û fedakariya Rêber; qewmê wî jê ra dibe neyar û wî dikin êm ê gur, hirç û keftaran!!!

do
em
mazûvan
ew
mêvan
em
xwedî
ew
Cenan
lê
Îro?




# M. ZAHİR KAYAN

## Êvar Tê

êvar tê,
vedibin lêvên mohr û dax kirî
êvar tê,
xem û kovan pê re tê
êvar tê,
wek hecheckeke xeydok rih ji qalibê min
dertê
êvar tê,
zirze li derê dil dikeve, qeşayî li hêratiya
çavan dikeve
êvar tê,
birîn li ser sewtê, hewar li ser şextê, qijik
li ser mewtê
Waxxx waye êvar tê,
yarê qesra xwe ruxandiye, ji bo kuştina
min tê.

# KURDGAL NAMEK, PİRTÛKEKE DÎROKÎ YA KÊMPEYDA Lİ SER KURD Û BELUÇ E YAN BELGENAMEYEKE SAXTE- ÇÊKİRÎ?

**Soran Hemereş (سۆران حەمەڕەش)**

**Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr**

Hê nû min pirtûka "Kurd Kêye?" nivîsandibû. Rojekê hevalekî birêz , pêvendî bi min re danîn û got; pirtûkeke gellekî kêmpeyda heye li ser dîroka kurdan, divê tu bibînî û wî bi xwe zehmetî kişand û ji Birîtanyayê bi postê ji min re şand. Wexta min pirtûk vekir û hinekî raçav kir, di destpêkê de hest bi min re çêbû ku min gewherekî giring ne girtiye dest û ser re derbaz bûme li ser dîroka kurdan. Min lome ji xwe kirin ku berî nivîsandina pirtûka xwe diviyabû min ew pirtûka gewherîn bixwendaya. Ev nêrîna min destpêkê û ya wê gavê bû. Piştre min hê bi hûrgilîtir lê nihêrî û dahoran. Di gelek wan pirtûkên dîrokî de ku wexta wan dixwînim, çi kevnar û çi nû , hewl didim bizanim bê kê nivîsandiye û çima nivîsandiye û bi ser kîjan neteweyî ye. Ji bilî vê heke ew pirtûk hinekî kevin be, hewl didim bizanim bê çawa kopiya wê hatiye parastin û bidest ketiye û heta çi radeyî rastiya wê heye.





Ev pirtûk dilxwede nêzîkî çar sed sal berî niha ji aliyê Axwend Miḧemed Saleḧ Zengene Beluç ve hatiye nivîsandin ku kesekî Beluç bûye. Îca dema lê hûrbûm û piştre li şopa destnivîsê geriyam, ketim nav gumanan. Li gorî pirtûkê , dema di sala 1943yan de dîroknûsê Beluç, mamoste Esîrxan Ehmed Zeyî, li deverekî li Beluçistanê destninivîs li cem Qazî Ebdulhemdîd ku yekemîn care dîtiye, Mîr Nesîrxan daxwaza destninivîsê jê dike, lêbelê bê sûde û nadiyê. Ji ber nebûna amêra kopîyê, ji naçarî ew kopiyekî din ji ber dinivîse.



Ango, pirtûk her çiqasî dilxwede nêzîkî çar sed salî kevin e, lêbelê bi sedema wê pirsgirêkê destnivîs wenda bûye û nû ye. Ev, bi zelalî derdixîne holê ku ew destnivîsnû ye û di sedeya bîstemîn de hatiye nivîsandin. Hetanî vê derê jî serbarê gumanê ye lêbelê dike ku tiştê wisa rû bidin û rû jî dane. Piştre ku min bi hurgilî zanyarî xwendin, yekser zelal bûye ku pirtûk di sedeya bîstemîn de ji aliyê kesekî ve hatiye nivîsandin ku hay ji dîrok hebûye lêbelê ne dîroknûsekî baş bûye, ji ber ku çewtiyê wî pir beloq û berçav in. Nivîskarî pirtûkê di destpêkê de behsa koka xwe dike û piştî nivîsandina sedan tiştên binemala xwe, vêca dibeğe:

"Ji hoza kurd a Zengene me ku tîreyekî(bavikek) hoza kurdê "Bud" e û ji aliyê nijadî ve jî ji Kurd e û nêzî Biraxoyîyan e. Bapîrê mezin yê van du tîreyan(bavikan) "Bud" e û hoza "Budî" jî yek ji heft hozên Med e. "

Piştretir berdewam dike û dibêje:
"Di destpêkê de pêvendîyên kurdan berî desthilatiya Keyqubad û damezrîna dewlata Mad, bi desthilatdariya "Şumîr", Akad", "Kilde", "Aşur" û "'Îlam" û piştre bi "Pîşdadî"yan ve pêvenddar bûye"

Yê ku hinekî haya wî ji dîroknûsînê hebedizane ew gotinên li jorê ne yê çar sed sal berî niha nin. Di serî de dîroknûsek çar sed sal berî niha le hemû rojhelê de nebûye ku behsa Medan bi hûrhilî kiribe, bi taybetî kes nebûye behsa tîreya(bavikê) Medî kiribe. Heke em dev ji vê jî berdin û dike ku kesek çavkaniyên wî yê taybetî hebûne, vaye yekdîroknûsek jî tuneye di hemû cîhanê de hetanî nêzîkî sedeya nozdehemîn û bîstemîn behsa Sumerîyan kiribe. Ji ber ku ew şarstanî bi rêya dîtina şûnewarên wan ve hatine peydakirin, di yek belgenameya tomarkirirî ya dîrokî de, berî dîtina şûnewarên wan, nehatibûn naskirin.

Di vir de, di vê gotarê her ewqas tê gotin lêbelê bi zelalî diyare ew belgename di sedeya bîstemîn de ji aliyê kesekî ve hatiye nivîsandin kuhevnasîna wî bi tomarên dîroknûsînîya sedeya bîstemîn hebûye û herweha haya wî dîroka serdemên Farsan hebûye û her du jî têkel û pêkel kirine. Lêbelê ji bo kesekî ku hay ji dîrokê hebe, ne giran e ku were zanîn ew belgenamesaxteye(çêkirî ye) û berhema sedeya bîstemîn e neku ya çar sed sal berî niha .

Pirs ev e, çima Beluçiyan ew pirtûk çêkirine?

Beluçî neteweyekî dabeşkirî ne, beşeke wan di nav Îranê de ye, beşek jê di nav Pakistanê û beşek jî di nav Efxanistanê de ye. Ew jî weke kurd çimkî bê dewlet in û welatê wan hatiye dabeşkirin, dîroka wan li gor daxwaza xelkê û amatorî hatiye nivîsandin û tiştêkî wan yê nivîskî yê wisa tuneye. Ew ketine bin bandora xebat û şert û mercên kurdan û kurdan jî wek modêlekî şoreşgerî ji xwe re dibînin û hin hozên kurd jî di dîrokê de ketine Beluçistanê ku ev diçe derveyî vê mijarê. Ango dîroknûsekî sedeya bîstemîn ê Beluç xwestiye ku belgenameyekî ji bo Beluçan li hev bîne daku karibe dîrokekî ron ji bo neteweya xwe çêke-binivîse û bi şêweyekî girêdaye bi Med û Kurd ve.

Di belavkirina vê belgenameyê de em lomeyan ji kê bikin?
Gellekî giring e ku di pêvajoya fêmkirina me ya dîroka Kurd de em bala xwe bidin ser çavkaniyên rast û durist. Çavkanîyênnerast her çiqasî çeng û baskê kurdan bilind bike jî, lêbelê hevkariya me nake ku pê têbigihêjin. Mebesta min a serekî jî di vê hewldanê de ye. Îca bi nêrîna min wergêr kek Hîwa Mihemed Zendî wek wergêr karê xwe pêk aniye û karê wî ziman bûye . Wî, ew pirtûk giring dîtiye ku li ser kurdan hatiye nivîsandin, xwestiye wê belgenameyê wergerîne ser zimanê kurdî daku sûd jê were wergirtin.

Herweha şandiye ji Doktor Cemal Nebez ku rewanşad dîroknûs û navdar bûye . Doktor Cemal pêşgotinek li ser nivîsiye û di beşekî de dibêje :
"Îca heke Şerefname wekçavkanîyekî gellekî girîng a dîrokî hatibe naskirin jî, bêguman giringîya Kurdgal Namek ji ya Şerefnameyê ne kêmtir e."

Ango Doktor Cemal ew pirtûk di asta şerefnameyê de daniye ku binêrîna min gewherêkî mezin ê dîroka kurde. Ji ber vê ku ew rastî ji bo min zelal bûye, bi sedema ku hin têkilî û nameguherînên me bi Doktor Cemal re hebû, wî camêrî gellek caran dîtinên xwe li ser mijarên min dinivîsand û min nivîsên wî dixwendin. Ji ber wê min peyamek jê re şand û haydar kir ku ev nêrîna mine û ew pirtûk saxteye(çêkirî ye). Min jê xwest, wek kesekî ku pêşgotin ji bo wê pirtûkê nivîsîbû, bersiva wî bizanim. Mamoste Cemal, bersiva wî nebû, piştre careke din me peyam jêre şand lê bervîs nebû. Vêca min babeteke din jê re şand, demildest bersiv da. Hingê têgihiştim ku Doktor Cemal naxwaze behsa wê meseleyê bike. Min jî wek rêzgirtin ji bo temen û hewl û dilsozî, di wê derê de min dawî bi meseleyê anî. Her ji ber heman sedemê bû hetanî mamoste dijiya min ev zanyarî belav nekir. Ji bo kurdiya wê pirtûkê, diviyabû Doktor Cemal bêyî xwendinekî hûrgilî pêşgotin ji bo wê pirtûkê nenivîsandibûya .
Wergêr erka xwe bicih aniye û şandiye ji Doktor Cemal re ku dîroknûs bûye, ji ber wê lome dikeve ser Doktor Cemal Nebez ku wî jî jê dilrihet im ji dilsozî û bi mebestekî baş ew kiriye.

Raxistina vê rastiyê bi mebesta rêgirtina li belgenameyekî saxte ku bikeve nav pirtûkxaneya kurdî û zêdetir bibe sedema jihevkirina dîroka Kurd û Kurdistanê. Ji ber ku bikaranîna van belgenameyan wek çavkanî ziyanekîgellekî mezin dide proseya me ya têgehiştina dîroka kurd.

Îca ev pirtûk di nav xelkî de belav bûye û hin nivîskarên kurd vê wekçavkanîyekî giring dihesibînin, ji ber wê dema wê hatiye ku ev rastî were zanîn ku ev pirtûk belgenameyekî saxteye(çêkirî) û divê wisa jî nêzîkatî lê were kirin û bi tu awayî nabe wek çavkanîyekî dîrokî were dîtin. Di heman demê de divê dîroknûs ku pêşgotinekî ji bo pirtûkekê binivîsin, divê hê bi hûrgilî bin û bingehê wê pirtûka ku li ber destê wan e vekolin. Ji ber ku erka serekî ya şîroveya wan pirtûkan dikeve ser milê dîroknûsan, neku wergêr.

Têbînî:

- Tevî ku nêrîna min li ser xebatên Mamoste Cemal Nebez heye jî, lêbelê gellekî rêza min ji bo rewanşad û hewldanên wî yên di biwarê ziman û dîrokê de heye. Ev babet jî tu carê rêzgirtina min a ji mamoste re kêm nake û her ji bo xatirê mamoste ku heta di jiyanê de bû, min belav nekir.

-Wextekî pirtûka Sînohe li kurdistanê li ser rûberga wê hatibû nivîsandin “çîroka rasteqîn”. Dilxwede ew pirtûke çar hezar sal berî niha Doktorêkî Misrî nivîsiye. Bi peydakirina çavkanîyan, di gotarekê de min zelal kir ku ew pirtûk çîrokekî xeyalî ye û dûre ji rastîyê û ew romanadîrokîye. Ew kesê ku ew çewtî kiribû bi hêrsî bersiva min da û gotinên min qebûl nedikir. Di çapên dinde êdî nenivîsand “çîroka rasteqîn” û kir çîroka dîrokî (romanî dîrokî). Ev pirtûk jî divê li ser rûberga wê were nivîsandin di sedeya bîstemîn de aliyê kesekî ve hatiye nivîsandin, ji ber dibewek çavkanîyaji bo lêkolînên dîrokî, divê wek xwe were naskirin neku bi çewtî.

- Bi nêrîna min wergêrê vê pirtûke karê xwe bi dilsozî pêk aniye û arasteyî dîroknûsekî navdar û kurd kiriye û di wir de erka wergêr temam bûye. Ez bawer dikim ku bi vî karî re gellekî westiyaye bêyî ku tiştek lê bihesile ji bilî westandinê. Ji bo wê ev gotar rêz li hewldana wî birêzî digire û mijar jî pêvendîya bi wî birêzî re tuneye ku zimannasî ye û zêdetir aliyê dîrokî ye di warê mamosta Cemal Nebez ê rewanşad de bûye.

# CEMİL IBRAHİM

## WERİN EM ZİMANÊ XWE BİPARÊZİN



Di destpêkê de ez dixwazim bêjim ko, bi rastî, ez bi xwe, ez xwe nabînim ew kesê herî zana û pispor di warê rêzimana zimanê Kurdî de, yan jî xwediyê axaftin û nivîsandina herî rast, û bê kêmanî û bê şaşî me; lê li gorî zanebûna xwe ezê çend xal û têbîniyan bêjim, ko ew weke şaşî û neduristiya nivîsandin û axaftina bi zimanê Kurdî têne jimartin, û dibin hokarên şêwandin û xerakirina zimanê me, bi taybetî di nivîsandinê de, di pirtûk û kovarên ko têne çapkirin û belavkirin de, yan jî di wan nivîsên Eliktronî de, di malperan de û di fêsbûkê de; bi nêrîna min, nivîskarên me yên birêz, li
vir yan li dera han, dikevin gelek şaşiyên ko zimanê me birîndar dikin, diêşînin, yan jî, eger bikêr bê ko em bêjin, xeradikin; îcar ya herî giring ew e ko em zimanê xwe biparêzin, heya ji me bê em xwe ji şaşiyan dûrbixin, wan serrast bikin, û bê dudilî, bê ko em ji hev şerm bikin, em wan şaşiyan ji hev re bêjin, û deynin ber çavên hev, û em nerînên xwe di vî biwarî de ji hev re eşkere bikin, bi hev biguherin; ez dibêjim ev erkê her kesî ji me ye, û bi

taybetî ew kesên xwe nivîskar dibînin; ev nayê wateya ko em hestê ti kesî birîn bikin, yan wî biêşînin …

XELEKA YEKEMÎN
Di pêşî de, ezê li ser wergera sirûda me ya netewî (Ey reqîb) bo zaravê Kurmancî rawestim, nêrîna xwe li ser vê wergerê bêjim:
Ev sirûd li ser zimanê her Kurdekî ye, cihê rêz û şanaziya wî ye, li cih û di demên herî giring û hestyar de tê gotin, loma bandora wê li ser her kesî heye, bi tabetî li ser biçûkan; îcar gava ko şaşî tê de(di wergera Kurmancî de) hebin, ew şaşî dikevin zimanê me de, dikevin nivîsên me de; ji bo ko ez dirêj nekim, ez wan şaşiyan wilo dibînim:
1- Gorbuhiştî helbestvanê navdar (Dildar), ê ko ev sirûd bi zaravê Soranî nivîsiye, di malikên pêşî de, dibêje:
Ey reqîb her mawe qewmî Kurd ziman
Nayşikênê danerî topî zeman
Kes nelê Kurd mirdiwe, Kurd zinduwe
Zinduwe qet nanewê alakeman.
Em bi kurmancî gerek wilo bêjin:
Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman
Naşikînin danerê topê zeman
Kes nebê Kurd miriye, Kurd zindî ye
Zindî ye qet nakeve ala Kurdan.
Bi min gelekî şaş e ko em bêjin( Kurd dimirin, Kurd jîn dibin), mane li cem me jî dibêjin(zindî), û min nebihîstiye ko kesekî gotiye( ew jîn dibe), em dibêjin(ew dijî, ew jiyaye, ew jiyabû), wek çawa kes nabêje( ew mirin dike, ew mirin dibe), em dibêjin( ew mir, ew miriye, ew miribû) h.d; bi zaravê Soranî(mirdiwe) tê wateya (miriye), ango di dema bûrî de miriye, lê ko em bêjin (dimirin), wate di dema niha de dimire, û ev jî ne wergereke rast û durist e, gerek e em serrastbikin û bêjin(miriye) .
2- Di malikên di pey re,(Dildar) dibêje:
Ême roley rengî sûr û şoreş în
Seyrîke xwênawî ye rabirdûman. Role, bi zaravê Soranî, tê wateya kur yan xort, gava ko gazî xortekî nûhatî dikin, û dibêjin (role), weke ko li cem me dibêjin:(kuro); û rabirdû jî bi wateya dema bûrî tê, em jî karin vê gotinê(rabirdû), bi heman wateyê bi kar bînin, mane her Kurdî ye; di encamê de, û ji bo ko ev malikên helbestê terazûyên wan neşkên, gerek em bêjin:



*Ême kurên rengê sor û şoreş in*
Lê binêr, xwînawiye rabirdûman.
3- Piştre dibêje:
Lawî Kurd hestaye ser pê wek dilêr
Ta bi xwên nexşî bike tacî jiyan.
Gereke em bêjin:
Xortê Kurd( yan jî lawê Kurd)
rabûye ser pê wek şêran
Da bi xwînê neqş bike taca jiyan.
4- Piştre dibêje:
Ême roley Mîdiya û Keyxusrew în
Dîniman ayîniman her niştîman.
Gerke em bêjin:
Ême kurên Mîdiya û Keyxusro ne
Dînê me, ayina me her niştîman.
5- Piştre dibêje:
Lawî Kurd her hazir û amade ye
Giyan fîda ye, giyan fîda, her giyan
fîdan. Gereke em bêjin:
Xortên kurd her hazir û amade ne
Can fîda ne can fîda her canfîdan .

Berî salekê, û hinekî bêtir jî, min hunermendê navdar Şivan Perwer li cihekî serexoşiyê dît, min jêre got ko ev wergera sirûda (Ey reqîb) hinek şaşiyên ziman têde hene, eger bêne serrastkirin wê baş be, gote min ko cara pêşî min ev werger durist kiriye, û stiraye, de ka nêrîna xwe binivîse û ji min re bişîne; roja din min jê re li ser Watssapê nivîsî, û jêre şand, lê ciwanmêro heya niha jî ti bersiv nedaye min, û tiştek ji min re negotiye; îcar bangewaza min ji hunermendên me ên birêz re, ko li van têbîniyên ko ez dibêjim binêrin, li ser wan rawestin, û eger pê bawer bûn, û weke ko dibêjin, ev têbînî ketin serên wan, bera, li gorî wan, van şaşiyan serrast bikin, ji nû ve sirûda me ya netewî bistirên, û bi şêweyekî rast û durist bêjin ….

# BERXWEDANA GİLÎDAXÊ Û DU KİLAMÊN Lİ SER GELÎYÊ ZÎLAN

NİHAT GÜLTEKİN

*Di salên ji 1926'an heta 1932'ya li Serhedê navbera hêzên kurd û dewleta tirka di çîyayên Gilîdaxê gelek bûyerên mezin pêk hat. Piştî tekçûna serhildana Şêx Seîd dewletê qirar girtî bû ku gelek axa, beg û serokeşîrên kurd ji erdên bav û kalên wan bişîne sirgunîye. Di bajarên wek Amed, Merdîn, Wan, Muş, Bitlîs û yên mayîn gelek kes bi minesebata tevlêbûna serhildanê bi tev zar- zêçên xwe di nava zivistanê de şandin bajarên Tirakya û Anadolîyê sirgunîye. Gelek kes di rêyên sirgunîyê de, di sar-sermayê de, di bin berf-baranê de jîyana xwe wenda kirin ketin bin axa sar. Gelek kes jî hatin girtin, Di nav wan de hîn kes hebûn eleqa wan tevlêbûna serhildana Şêx Seîd çênebûn. Li Bazîdê jî dixwestin gelek axa, beg û serokêşîran ber bi bajarên Tirka, rojaavayê Tirkîyeyê sirgun bikin. Di nav wan kesan de Biroyê Heskî Tellî jî hebû. Îbrahim axa jî yek ji wan serokeşîrên kurd e ku di dema serhildana Şêx Seîd de, li Serhedê tev serhildana nebûye. Bixwe ew çax Serhadê bêdengîyek hebûye, haya kesî bûyera Şêx Seîd nînbûye. Di berîya wan qirarê sirgunkirinê, Biro û hevalên wî li dijî artêşa rûs şer dikin. Alîkarîyê dewletê re dikin. Mala Biro hem li gund hebûyê, hem jî li bajarê Bazîdê. Li bajar bi karên dikana xwe re mijûl bûye. Lê dewletê dîsa jî dev ji Biro bernedaye. Biro hemberî qirarara dewletê nerazîbûna xwe tîne ziman û teslîm nabe. Berê xwe dide çiyayên Gilîdaxê û hemberî dewletê agirê berxwedanê vedixe û îsyan dike. Gelek kes der dorên Bazîdê, taybetî jî pismamên Biroyê Heskî Tellî tevlê berxwedanê dibin. Paşê êşîrên Celalî, Heyderan û Zîlan û yên mayîn serokên wan jî tev li serhildanê dibûn. Li aliyê İranê jî gelek kes û êşîr heta dawîye piştgirîyê didine berxwedana Gilîdaxê. Her diçe hemû deran zêdetir tevlebûn çêdibe.*

*Hîn kesên berîya serhildana Gilîdaxê dewletê re şer kirine, neketine dest dewletê, ewana jî rêyekê dibînin û digihêjin çiyayê Gilîdaxê. Di demeke kurt de gelek şêx, axa û serokêşîr û pêşengên Kurdan ên ku hatibûn sirgunkirin jî vedigerin wê derê û piştgirîya berxwedanê dikin. Sala 1927an di dîroka kurdan de bûyerek gelek girîng, Rêxistina Xoybûnê tê damezirandin. Gelek kes bi İhsan Nurî Paşa ve tevlî berxwedana Gilîdaxê dibe. İhsan Nurî pêşengtîya berxwedanê hildide ser milê xwe. Di warê siyasî û leşkerî de gelek guhertin pêk tê. Bi navê Hikûmata Agirî konseyek ava dibe, gor şert û mercên konseyê her diçe meydana şer fireh dibe. Her desteyek, cihên cûda cûda kar û barên şer hildidin ser milê xwe. Ronakbîr û pêşêngên berxwedanê rojnameyekê bi navê Agirî derdixin. Di dema sala 1928- 1929an de êdî li heremên Serhedê, li bajarên Wan, Qers, Erzurum, Bingol, Agirî, Bitlîs, Muşê bûyerên berxwedanê tên bihîstinê. Şer di nava kurdan û dewleta tirk de her diçe zêde dibe. Di wan bajaran de şervanên Gilîdaxê şûbeyên rêxistina Xoybûne vedikin. Propaganda şere Gilîdaxê û Rêxistina Xoybûnê dikin. Paşê bi wan salan çiyayê Tendurek dibe qerargaha duyêmîn. Êdî heremên nêzikî çîyayê Tendurekê wek Erdîş, Gelîyê Zîlan, Panos, Bazîdaxa, Begirî, û navçên din û gundan ji vir aliyê revebirên qerargeha Tendurekê tê birêvebirin. Berxwederên çiyayê Gilîdaxê li gelek alîyan û geleh cîhan erîş dibirin li ser qereqolên dewletê. Dewlet di wan dema dixwest wê mesele bi vir derawan encam bike. Ji bona wan hêvîyên xwe dixwest rêvebirên berxwedanê re bê cem hev. Çend cara Pira Belek tên cem hev, hev dû re nameyan dişînin.*

*Di dawîyê de dewlet aliyê hiqûqî û sîyasî tu encam nagire. Piştî wan hewldanên dewletê şer her diçe fireh dibe. Dewlet, ji bo ku bikaribe di demeka kin de serhildana Gilîdaxê bifetisîne, zêdetir li ser diplomasîyê disekine. Dewletên İngilizan, Sovyetê û Îranê gelek piştgirî digire. Di wan dema de dewlet Gilîdaxa biçûk hildide di nav sînorên xwe, alîyê Wanê jî hin erdê xwe dide dewleta Îranê. Bi deh hezaran leşker, bi dehan top, mitralyoz û balafirên xwe va xwe dispêre Çiyayê Gilîdaxê. Li Erdişê jî cîhê balafirgehe tê avakirinê.*

Gelîyê Zîlan nêzî çiyayên Eledaxê û Tendurekê ye. Gelek zozanên wê yên xweşik hene. Mirov dikare bibêje bihûşta zozana ye. Di wan zozanan gelek êşîr cî û war dibin. Sê çîqên Gelîyê Zîlan jî li ser navên eşîran hatine binavkirin. Îhsan Nûrî Paşa û endamên berxwedana Çîyayê Gilîdaxê ji bo ku li herêma Zîlan jî şer dest pê bike, Mihemed Beg, Nadir Beg û Seyît Resûl dişînin heremê. Bernameya ji bo destpikirina şer şer amade dikin. Li herêma Zîlan, li Çaldiran, Melazgirt, Adilcewaz, Erçîş û Patnosê, ji bo destpêkirina şer biryar digirin. Dewlet jî plansazîyekê komkujiyê di herema Gelîyê Zîlan de dixwaze pêk bîne. Dixwaze çavên şervanan û milet kurd bitirsîne. Dewletê bi pêşengtîya Dewrêş Beg û milîsên heremê hazirana sala 1930a de giranîya erîşên xwe didin herêma Gelîyê Zîlan. Di pûşpera sala 1930'yî de İhsan Nurî Paşa hêzên Gelîyê Zîlanê re fermanekê fermî dişîne. Di fermanê de jî şervanan dixwaze ku di çarê Tîrmehê de şer dest pê bike û wiha pê de diçe;"Me ji her tiştî agahdar bikin"

Lê mixabin, berî fermana İhsan Nurî Paşa 15 rojan bi pêş de bê wext şer dest pê dike. Encamê de armancên li Zîlanê hatin danîn bi dest nekeve. A girîngtir di vê heyama şer de Komîteya Berxwedêr a Gilîdaxê ji tu tiştî agahdar nabe. Li herêma Gelîyê Zîlan 80 gund tê werankirin û şewitandin. Li wê deverê kevir li ser kevira namîne. Ev rûdan wekî tê zanîn bi navê Komkujiya Gelîyê Zîlan derbasî dîrokê bûye. Şahidên ew komkujî dîtine dibêjin ku çemên li herêma Gelîyê Zîlan tev xwîn diherikîn. Xwîna hemû çeman tevî Behra Wanê dibû û gol sorgevez kiribû. Pêrtax, Newala Kuştîyan, Hesenevdal, Adaxeybê, *Milk, Newala Fedê, Newala Bebo, Çakirbeg ev nav tev navên gelî û newalên cîhê komkujîya Gelîyê Zîlan in. Li gorî salixdayîna dewletê herî kêm 15 hezar meriv hatine qetilkirin, bi sedan xanî û gund hatine şewitandin. Di wê serdemê de rojnameya dewletê a nîv fermî, rojnameya Cumhuriyetê, hejmara 16'ê Tîrmeha sala 1930'î yî derbarê komkujîyê de wiha dinivîsî; 2" Gundên ku tevî eşqîyayên Agirîyê bûbûn tev hatin şewitandin û niştecîyên gundan ji bo bicîkirinê şandin Erdîşê. Di tevgera leşkerî de hejmara eşqîyayên hatine îmhakirin jî 15 hezaran zêdetir e. li Gelîyê Zîlan şer pir çetin derbas bûye û gelî bi cinazeyan xitimîye."*

*Piştî komkujîyê gund tên valakirin, şewitandin û rûxandin. Qanûna niştecîyan ku di pêncê Gulana 1932'yan de dikeve merîyetê, ji Zîlanîyan re dibe xebera sirgunkirinê. Bi vê qanûnê herêma Zîlan qedexe dibe û hetanî 20 salan ketina van gundan tê qedexekirin. Bi vê qedexeyê ew herêm dibe cîyê di bin qontrola dewletê de. Bi vê qanûnê malbatên naskirî ên eşîrên herema Zîlanê tev tên sirgûnkirin. Di sala 1980'yî de biryara Kenan Evren li gundekî herêma Gelîyê Zîlan Qirgiz tên bicîkirin. Ew gund a niha wekî gundê Ulupamîr tê nasîn.*

Kesên jî komkujîya Gelîyê Zîlan filitîn sirgunî herêmên Derya Spî, Ege, Trakya û Rojavayê Anatolîyayê kirin. Ji du hezarî zêdetir Kurd sirgunî Edeneyê kirin û di Dadgehên Îstîklalê de hatin darizandin. Rojnameya Cumhurîyetê a hejmara 28'ê Mijdara 1931'ê wiha dinivîsand; "Ji şakîyan Agirîyê, darizandina 700 kesî wê vê hefteyê li Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê dest pê bike. Hetanî niha 192 kes hatine bajêr. Darizandina şakîyên Agirîyê wê di nav vê hefteyê de dest pê bike". Bi sedan kesên din jî di zindanên Edeneyê de bi nexweşiya tayê mirin. Ên din jî hetanî sala 1948'an di zîndanên Edene, Sînop û Manîsayê de man. Piranîya wan jî birçûbûnê û bi sipîyan mirin. Çend kesên ku ji zîndanê sax derketin jî zêde nejîyan û mirin. Dîroka kurdan da dengbêjan roleka giran hildayê ser milên xwe. Mirov dikare pênase bike ku dengbêj bîra civata me ne.

*Dengbêjan bi hunera xwe va derheqa berxwedana Glidaxê gelek agahîyên dîrokî anîne roja îro em tê da dijîn. Em niha jî du kilamên derheqê şerê Gilîdaxê û Gelîyê Zîlan nivîsara xwe dawî bikin…*

## Gelîyê Zîlan3

Li minê hayê, li minê hayê
Lê lê Henîfe rebenê, bihar e, şerek li me qewimiye li zozanê Sûtê
Li bereka Avcewazê, li Norşîna Seydo, li warê
Husêyn Paşa, li rûbarê xelatê
Agirê kulê bikeve mala dewrêş Begê, li pey da
zol anî mala Şero, digerîne îzê û teqîbatê
Memo bi Nado va mane li Îranê, kes tune here
Qeysera wêran birawo ser mîratê.

Eva şerê par havînê li Bilanixê kê û kê kir
Şêx Taho mixbûriya mala Şero kir
Mihemedê Hecî Elî bi destê xwe kir
Qadilê Bilê, Hesenê Bilê xelqê Bazîdê
ji keska, li tanga Gurdê pêçiya Paşê bona gustîleka zêr berda jêkir.

Li warê Horzemirê, li dîhara
Hela galê galê şiberek şiwetkiyê qûmandara
Îro gulle dibarin ji teyara
Cinaza dikevin bi hezara
Hespê me wan e ji wê da tênê, zengiyê wanî
xwîn e, zînê wanî vala
Rûyê min nagire, kanê malxwê li ber mala
Hera herine Gelîyê Zîlan guhê xwe bidine sewta birîndara
Gelle cinaze mane li kokê dara
Jinê mala Şero stûyê xwe xar kirine,
Birango, mane li ber dîwara.
Li minê lê wayê, korê nemayê
Mala Dewrêş begê ji nava mala dayê
Bi singûya ketiye nava hêsîrê Gelîyê Zîlan,
ji nav dernayê
Ez bi çavê hêsir, dilê şkestî çûme kokê dara,
ez bala xwe didimê nalê- nalê bûkê Hemoya
li Gelîyê Zîlan xewa min nayê
Ez pey mêrkê camêr ra gelo nemînim li dunyayê.

## *Gelîyê Zîlan4*

Dayê dayê dayê…
Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye li ser eşîra Geliyê Zîla
Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê5, Kaniya Dîradê, Delavê Hêrîyoyê6
wey la reben im lawo îro nizanim sebeb kî bû, kê bi kê kir
kula Xwedê bi kul be lawo têkeve mala doquzincî alayê
firqa walîyê Bazîdê Dewrêş Beg7 pêra
Mihemedê Hesê Hecî Elî li kaviliya Sarisûyê8
Şêx Tahir dayê rûniştin di heqê Geliyê Zîla da fesadî kir
heyfa mi nayê li qira Gelîyê Zîla
kuştina tazoxlanê Mala Şero Bavê Mizefer
Dewrêş Begê ûrt û ocaxê xwe li dunyayê qelandî lawo
derbek li tazoxlanê mala Şero daye Efê delalî
ji bona xelekek zêr e eza hêsîr im tiliya
Ûsiv Begê delal di ber da jê kir…

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye li ser eşîra Geliyê Zîla
Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîradê, Delavê Hêrîyoyê
reben ez im lawo qewimîye li orta herdu rêyan e
heyfa mi nayê li qira Gelîyê Zîla
kula Xwedê bi kul be lawo têkeve mala doquzincî alayê
firqa walîyê Bazîdê Dewrêş Beg pê ra
Mihemedê Hupê Hecî Elî li kaviliya Sarisûyê
Şêx Tahir danê pêşîyê ji êvar da ez hêsîr im lawo
devê topan û tometîkan û mawzerya li hêsîrê Geliyê Zîla girêdane
heyfa mi nayê li qira Gelîyê Zîla, kuştina tazoxlanê Mala Şero
heyfa mi nayê li wê heyfê zarê di serê sungûya da şûrê di qirika jina da
heyfa mi tê ki wê heyfê tê li wê
dewrêş Begê ûrt û ocaxê ji dunyayê qelandiye
hezar û pêncsed nifûsê Gelîyê Zîlan tov kiriye ji êvar da
biriye li orta Kindûk9 û Milkê10 di nav da kirin qesabxane.

*Hacê digo Huco Fêrîdê lawo ez nemînim ji kê ra*
nizanim bigirîm ji halê kîjan eşîrê ra
ez nemînim ji hêsîrê Geliyê Zîla ra
sêsid qîz û bûkê Gelîyê Zîla kirin
makine şandin nav duwala
le hela felek mala te mîrat biye kê ji te ra digo
Hacê Huco Fêrîdê her sê xweyînga sax bihêl di binê cendeka da
bira bimîne ji derdê dunyayê ra lawo
ezê îro ji xelkê Gelîyê Zîla ra bêjim
hêsîrê hêsîrê hêsîrê
lawo bi şevê royê ez hêsira tazoxlanê
Mala Şero Bavê Mizefer
gula xorta û Efê delalî ez bixwe me
felek hey wêl wêl..
Şahidê Gelîyê Zîlan li gundê Pertaxê Gulizer jî dema bûyerekê kal dikir, çawa gule berdabûne zikê bavê Silhedinê Evdî, hema hûr û rûviyên wî rijiyabûn erdê wiha kilam digot;
Wêrana Pêrtaxê li kelehokê,
Gulekê berdanê Ahmedê Silo birangê min qijikê
Terziya vekiriya xala ber bişkoşkê,
Heyfa min nayê bire min qijikê
Heyfa min tê li bavê Silhedîn
Durçik bikevine saqa vê sapokê.






1-Ağrı İsyanı, İhsan Nuri Paşa, Weşanxaneya Med, 1992
2- Şahidekî Komkujîya Gelîyê Zîlan Tahir Nas, Nihat Gültekin, Weşanxaneya Lîs 2020
3- Zargotina Kurdên Serhedê, Mehmet Gültekin- Weşanxaneya Avesta
4- Antolojiya Dengbêjan 1, Ömer Güneş- İbrahim Şahin- Weşanxaneya Nûbihar 2018

5- Zozanekî li etegê Sîpanê ye.
6- Devereke di navbera navçeya Panos û Erdîşê de ye.
7- Dewrêş Beg; Fermandarekî dewleta Tirkan e.
8- Navê herêmeke li Panosê, nêzîkê çiyayê Sîpanê ye.
9- Kindûk; Gundekî li ser navçeya Erdîşê ye.
10- Milk; Gundekî li ser navçeya Erdîşê ye.



# HELBESTÊN SİLÊMAN AZER ”TALDEYA TENAHIYÊ”

LOKMAN POLAT

Edebiyata/Wêjeya kurdî li rojavayê Kurdistanê pêşve çûye. Digel ku parçeya herî biçûk a Kurdistanê ye jî, di hêla xebatên çandî, edebî, weşangerî, ziman û afirandina berhemên wêjeyî ve pêngavên baş û berbipêş avêtine. Di hêla afirandina helbestê de herî dewlemend û pêşketî rojavayê Kurdistanê ye.
Tevahiya nivîskarên binxetê/rojava bi helbest û çîroknivîsînê dest pê kirine, paşê hinekên wan derbasê romannivîseriyê bûne. Lêbelê wek hejmar herî pir pirtûkên helbestan hatine weşandin û herî pir şaîr/helbestvan ji wir derketine.
Min bi dehan pirtûkên helbestên helbestvanên kurd ên binxetê/rojava xwendiye. Hema bibêj min temamê pirtûkên helbestên Cegerxwîn, ên Osman Sebrî, Tîrêj, Ehmed Huseynî, Cankurd, Nîzar Yosif, Azer Osî, Hêmen Kurdaxî, Vejîna Kurd û hwd, xwendiye.

**DÎ VÊ HELBESTÊ DE SEDEMÊN AWİRÊN SERSARİYÊ TÊ RAVE KİRİN.**


Û herweha min piraniya romanên romannivîserên kurd ên rojava xwendiye. (Yên ku mane ez ê vê zivistanê bixwînim. Spas ji birêz Kek Bashar  Mustafa re ku ji min re tevahiya romanên di nav weşanên Sersera de derketibû şiyandiye. Ez ê tevan bixwînim.) Herî dawî min pirtûka helbestên birêz Silêman Azer a bi navê ”Taldeya tenahiyê” xwend. Pirtûk di nav weşanên ”Sersera” de li Almanyayê hatiye weşandin. Pirtûk 110 rûpel e. Di pirtûkê de 48 helbest hene. Lê, çi heyf ku di pirtûkê de, di derbarê jînegeriya/jiyana nivîskar/helbestvan de tu agahdarî tune.



Tenê ji berhemên wî navê pirtûka wî a helbestan ku di sala 1996an de derketiye û navê romanek ku wergerandiye û di sala 2019an de hatiye weşandin, heye. Ji blî van herdu navên pirtûkan ”Awazên kelogirî / helbest” û ”Bînberdana germ / roman / wergerandin” başqe agahdarî tune. Helbestvan pirtûka xwe diyariyê Sara, Azer û Zerînê kiriye.
Pirtûka helbestên Silêman Azer bi helbesta sernavê wê ”Awirên sersar” dest pê dike. Di vê helbestê de sedemên awirên sersariyê tê rave kirin.
Di pirtûkê de helbestên derbarê mijarên curbecur de hene. Ji helbestên evînî bigir heta helbestên rave kirina hestûruhê/giyanê netewî bi şêweyeke hunerî hatine hunandin û pêşkêş kirin. Di helbesta sernavê wê ”Çiyayê Cudî” de hevokek/malikek gelek manedar, balkêş, li xweşa min çû.

”Hîna Cizîr
Bi xemla xwe ve
Bendewarî
Şahiya
Mem û Zîn e.”

Şahiya Mem û Zînê kîngê ye? Kîjan dem, kîjan wext dê bibe şahiya Mem û Zînê? Kîngê ku başurê Kurdistanê bibe dewleteke serbixwe, kîngê ku rojavayê Kurdistanê bibe dewleteke federe yan serbixwe, kîngê ku rojhilatê Kurdistanê bibe dewleteke federe yan serbixwe, kîngê ku bakurê Kurdistanê bibe dewleteke federe yan serbixwe û herî dawî kîngê ku herçar parçeyên Kurdistanê bibine yek, bibine xwedî yek alek, yek dewletek ew dem dema şahiya Mem û Zînê ye.



Di pirtûka helbestên helbestvan birêz Silêman Azer de mijara tenêtiyê, tenahiyê cihek girîng digre. Ji xwe ev mijare ku navê xwe jî daye pirtûkê. Di helbesta sernavê wê ”Dilbêjê tenêtiya xwe”de ev mijar tê rave kirin.
Dema min helbesta sernavê wê ”Lîstik”e xwend, biçûkiya min û di biçûkiyê de lîstikên ku ez û zarok bi hevre dilîstin û evîna biçûkahiyê, hezkirina zaroktiyê hatin bîra min. Bi xwendina vê helbestê, min zaroktiya xwe bi bîr anî.
Bi rastî jî me zaroktiya xwe (ên ku temenê me ji pêncî salî bihuriye) ji bîr kiriye.

”Me jibîr kirine
  Lîstikên zaroktî
  Û evîniyê
  Bi tenê
  Em dizanin lîstika
  Xweveşartinê.”

Weke min got, di pirtûka helbestên birêz Silêman Azer a bi navê ”Taldeya tenahiyê” de 48 helbest hene û hemû jî hêjayê xwendinê ne. Ez gotara xwe bi malika helbesta rûpela dawîn a pirtûkê de bi dawî tînim.

”Pêçayî me li teşiya tenahiyê
Li min têne ristin çaxên xilmaşbûyî
Li ser çoka vedana,
Ku serê xwe di binçengên şevan re der tîne
Û di zayina xwe ya qefilî de
Ji baweşikandinê
Lûs dibe banlîsoka wêrekiyê.”

# TÊNGÎZ SİYABENDÎ

## ROJA AZADİYÊ

Ez nizanim roja sibê
Ewê tev xwe çi bîne,
Lê dizanim wê rojekê
Azadiya welêt bîne.

Û wê rojê miletê min
Biçûk-mezin, mêr û jin
Bi def-zirne wê rabe
Govend bigire, bilîze.

Wê şev û roj şa bibe
Azadiya xwe pîroz ke
Û mizgîniya azadiyê
Cîhanê de belav bike.

Ew roj wê kengê bê
Tenê Xwedê dizane!
Îro, sibê yan dusibe
Ez bawer im, ewê bê.






# YUCEL ASLAN (KOÇER)

## PİLTAN

Piltan û Rihan mîna du keçên çardeh salî dema dest didin hev îmana xortan qila dikin, herdû  tên ba hev bandora wan zêdetir dibe, kêm kes hemberî wê bêhna wan ya bihuştî dikarin bêdeng bimînin. Berê dema em zarok bûn piltan xelateke pir bi qîmet bû, keç û xortên hev hezbikirina piltan dikirin nav desmalekî tevî desmalê diyarî hev dikirin. Mêr û jinên navsere jî ez bibêjim qasî nîskekî di nav laçikekî dialandin pêsîra kincê xwe, alıyê hundur da darda dikirin da ku ew bêhna efsûnî her tim li gel wan be.

Piltan kulîlkeke beyanî ye li erdê dêm hêşîn tê, herî zêde gelî, newal û rûbaran da xuya dike.
Rengê piltanê gewr e, bejna wê qasî du buhosta bilind dibe, serê wê berê bişkov digire paşê gulvedide, kulîlka serê wê zer e rengekî zêrîn û kulîlkeke pejal e, gelek devera ew bişkova nagre û lema jî kulîlk venabe.
Piltan dema ter be bêhna wê ewqas zêde tuneye lê dema dikelînin û careke din hişk dikin bêhneke bêemsal jê derdikeve.
Piltan heta wê bêhna xweş û bêhempa dide derdora xwe, çend merhela ra derbas dibe, hinek jî rihan dikeve nav piltanê li ber destê kesên pispor tê terbetbikirinê paşê wek diyarî tê belavkirin.

Keçikên cihêzê xwe amade dikirin teqez ba wan hebû, piltan dikirin nav tentene û qenevçeya lûr dikirin, dema derê sindoqê vedibû berê piltanê serê xwe bilind dikir çawa ku bibêje ez wa li vir im mîna berfîneke derbiharê berf û cemedê biqalişîne serê xwe tîk bike.
Pîr û kevaniyên malê jî gelek caran piltan di nav himayîlan da vedişartin, himayîl an di stûyê xwe de darda dikirin an jî di nav egalekî de pişta xwe girêdidan.

Dema mal ji zozana dadigeriyan, piştî çay, tehl, tirşên zozana û piştî galegalên hasil û rihela salê pirsa piltanê jî helbet dihate kirinê, heke piltan hebûya teqez ew ê di nav qîz û bûkan de bihata parvekirinê, helbet xortên azep û bervemiraz jî bêpar nediman.



# Rostem Xamoş

## Silavek

silavek ji dilê min
bo dayik û babê min

ez gelekê xweş hal im
zarokê nava mal im

mala me teĵî gol e
cî bextiyarî dil e

dayik û babê min şirîn in
bo min ronahiya ĵîn in

her hemî dem û gava
dibên hey xweştivyê sava

dibên tuy gola baxê ĵîn
zarokê ciwan û şirîn.

HELBEST: IXLAS FİRENSÎS


WERGÊR: MEHMÛD BADİLÎ

# Bêhrîkirin

Av di çavên min de hişyar kir
piştî ku roka asoyê mijankên xwe dahev
û ji ronîyê re lavêjek nivîsand
Beyrût
banga xwe radestî dûrahiyê kir
danek ji agir û kefê çinî
bêhrîkirina berdewam bi daxwazên xwe
yên hêlehêlkar radigihîne
û di pişika min de bi cih dibe
serpêhatiya demsalên koçbûyî diwênîne
bayê ji rojhilatê radibe bilind dike
bi navên zarokan nîşan kiriye
bi girîyê kolanan û çîrokên rêrexan
dagirtiye
westiyayî dilerize wek derîyekî kevin
û gewdek şewatê li xwe dike gumlikek
balavbûna wî ronî dike
tazî diherike
wek xewnekî di axê de vegevizî be
dasa demê wî çinî be
bîrdankê wî rapêça be
berî hilatinî xwe şikest
ji ava jiyanê hat dûr kirin
di himêza dayikê de sergûn bû
Beyrût di sergûnkirina xwe ya dawîn de
ye
û ez welatek ji xwînê me.



Iklas Francîs, nivîskareke Lubnanî ye, li gundê Elma Elşeeb li başûrê Lubnanê sala 1964an ji dayik bû ye, cenga Lubnanê ya navxweyî tev jiyan kiriye û gelekî zor pê bandor bûye, lê hezkirina wê ji jiyanê û qeşengiyê re herdem ji wê re bûye kopal ku gêdûkên hêvî û xewnê bi rengê giyanê xwe ronî bike, ew sala 2004an koçberî Emerîka dibe û li wir di warê fêrkariyê de dixebite.
Berhemên wê:
- Romana Daxwazên paşguhkirî / pirtûkek çîrok ji 28 çîrokên kurt ( Li ber derba maçekê ), pirtûkek çîrokên hevbeş ( Bendera serpêhatiyan ), pirtûkek gotar û çîrokên kurt li ser hala korona (Korona), pirtûkek helbest ( Û bi dînbûna xwe re dibûrim), pirtûkek helbestî hevbeş (welatê sitêran ), pirtûkek helbestî (Dema gul geş dibe) hevpeyvîneke evînî ye bi helbestvanê Sûrî  Merûf Azar re li ber çapê ye, Eşqa pîroz: 20 kesayetî ji pirtûka pîroz e.




# MİHEMED HESKO (BİRASOZ)

## PÊŞBERÎ

Tenê bo te..!
Payeyên balkêşiyên hestan çokên
xwe dînin
Û xwedawendên viyanê
Ên ku li sîbera bedewebûna te
Hîştin ku derbirîn rabiper e
Û rewanbêjî nikaribe xwe rabigihîn
e
Û nikaribim ji ber navgiranî
Û tîrêjên awirên çavên te birevim?
Çavên te yên ku, hemû wateyên
rastî û dilpakî yê
Û rengên pêşerojê û nameyên
yekbûnê
Tevî bawrmendiyê di xwe de
hewandin e
Û bawerî bi girnijînek e di dil de,
peyveke matmayî ye?
Herwiha çavên te, dînîtîya dildarî
yê jî dikolin
Û xêza pevgihîna lêvan
Çîrokên Sirat Elmisteqîm, dibêjin
Kengî dil û can ew katane ezber
kirin..!
Wê ji dojeha bêparî
Û xweşiya ramûsana herdu lêvan
rizgar bibe!?



# REWŞA GİŞTÎ YA BAJARÊN BAZÎD Û TÛLAYÊ AWİREK Lİ DÎROKA WELATÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ Û LEV TOLSTOYÎ

UMÎD DEMÎRHAN

Pêşek

Ji bo naskirina du kesayetên serdemekê, divê rewşa welat û bajarên ku li wan jiyane jî baş bê naskirin. Ji ber ku beriya berawirdkirina taybetmendiyên wan ên kesane divê derbarê welat û bajarên wan de çarçoveyeke giştî hebe ku berawirdkirineke rast û durist bê pêşkêşkirin. Lewre di vê xebatê de em ê ji bo naskirina serdema Mela Mehmûdê Bazîdî û Lev Tolstoyî dîroka her du bajarên Bazîd û Tûlayê berawird bikin; derbarê geşedanên cîhanî û herêmî de jî hinek zanyariyan bidin ku dîmena giştî ya serdemê baş xuya bike. Divê bê gotin ku ev nivîs beşa yekem a projeya rêzenivîsekê ye û nirxandina giştî ya serdema her du kesayetan dê bimîne beşên din re.

1. Bi kurtî Kurdistan û Rûsyaya sedsala 19an

Li cîhana sedsala 19an, ji ber du bûyerên girîng (Şoreşa Fransayê û Şoreşa Pîşesaziyê) Ewropa ber bi geşedaneke dîrokî ve diçe; ev bûyer bandorê li ser cînarên wê yên Rûsya û Dewleta Osmanî jî dikin; her wiha siya wan dikeve ser Îran, Hindistan, Japonya û Misirê jî. Ber bi dawiya sedsalê Misir dikeve destê xanedana kurd a Mihemed Elî Paşa û kurdên babanî yên li Rewanduzê jî gelekî xurt dibin.

Kurdistana sedsala 19an di navbera dewletên Osmanî, Îran û Rûsyayê de dabeşkirî ye; aloziya di navbera îranî û osmaniyan zêde dibe û deverên kurdistanî yên wekî Zohab û Silêmaniyê dibin xalên bingehîn ên vê aloziyê. Ji aliyê kurdan ve, pêşkeftina hera girîng a sedsalê raperîneke giştî ya li Kurdistanê ye ku di encamê de kesayetên siyasî-civakî yên wekî Bedirxan Begê Cizîrî, Seîd Beg, Îsmayîl Beg û Mihemedê Rewanduzî gihiştin hêzeke girîng. Derdora sala 1843an, mîrê Cizîrê Bedirxan Beg û mîrê Colemêrgê Nurullah Begî serî hildan; lê belê ev serhildan ji aliyê osmaniyan ve hatin tepeserkirin û serokên têkçûyî hatin sirgûnkirin. Ber bi dawiya sedsalê ve, kesayetên wekî Şêx Ubeydullahê Nehrî, Ceifer Axayê Şikakî û Şêx Mehmûdê Berzencî jî derdikevine qada neteweperweriyê. Pêşkeftineke girîng a din jî, di bin banê artêşên Rûsya û Osmaniyê de avakirina du artêşên kurd e ku Alayên Hemîdiyeyê berhema vê sedsalê ye.

Rûsyaya sedsala 19an bi qeyser Aleksanderê Yekem dest pê dike û bi kuştina qeyser Aleksanderê Sêyem ve diqede.  Ji heyama qeyser Aleksanderê Yekem pê ve hêza Rûsyayê digihêje Kafkasya û Asyaya Navîn; dewleta navendî ji nû ve tê sazkirin, kolejên ku Piyotrê Mezin vekiribûn vedigerin wezaretan, bi zêdebûne serjimariya welêt re ji bo milkiyeta erdê û pêşxistina pîşesaziyê reformên girîng tên sepandin. Her wiha di nava civaka rûsî de tevgerên siyasî yên wekî Populîst (Narodnîkî), Anarşîst û Marksîstan derdikevin holê. Di vê sedsalê de Rûsya bi Ewropa, Osmanî û Îranî re dikeve şerên hêzdariyê; li dijî osmaniyan serkeftinên girîng bi dest dixîne, di Deryaya Reş de artêşa xwe ya deryayî xurt dike, dibe endamê Kombenda Sê Împaratoriyan (Rûsya, Almanya, Awistirya-Macaristan).

2. Bazîd û Tûla: nasname û dîrok
2. a. Bazîd

Li ser navê bajêr

Keleh û bajarê ku kurdên herêmê wê bi navê “Bazîd”ê destnîşan dikin, di çavkaniyên heyama Romayê yên berî zayînê de wekî Basenia û Basean dihate nasîn; her wiha di hin nexşeyan de navê “Batazia”ê jî derbas dibe. Erdnîgarê ereb Şerîf El-Idrisî di sedsala 12an de navê “Badjasis”ê, qasidê qiralê Îspanyayê Clavio di sala 1403an de peyva “Vazît”ê û gerokê Brîtanî Sir Thomas Herbert jî di seyahatnameya xwe ya sala 1627an de navê “Baezd”ê bi kar tînin. Zanayê navdar Mela Mehmûdê Bazîdî jî di nîveka sedsala 19an de bajêr wekî “Bazîd” bi nav dike û wekî sancaqekê jî qala navê “Bayazîd”ê dike. Ji aliyekî din ve, hema hema hemû nimûneyên zargotina herêmê û tevahiya gelê Serhedê jî navê bajêr wekî “Bazîd” bi lêv dikin.

Dîroka bajêr:

Ji wêneyên şkeftan û kelefeyên hin avahiyan eşkere dibe ku dîroka kevneşopî ya herêma Bazîdê digihêje hezaran salên beriya zayînê. Li gelek cî û warên wekî Teperiz, Kêrtekela, Şorik, Arzep, Ziyaret, Kelareşk, Kelasor û yên mayîn hê hê jî şopên avahî û kelehên ku beriya 2-3 hezar salan hatine avakirin diyar in.
Gelek çavkanî destnîşanî dikin ku dîroka kurdên herêma Bazîdê û koka kevneşopiya çanda wan digihêje heyamên kevnare yên serdema Medan. Li gorî nivîsên Strabonî, niştecihên  doraliya çiyayên Araratê “Kardû” ne. Li gorî Moses von Choren jî, piştî hilweşandina dewleta Medan û kuştina qiral Ejdeha (Astyages), jina wî û bêtirî 10 hezar xizmên wî li derdorên Araratê li deverên wekî Dambat, Nexşewan û aliyê Basean/Bazîdê hatine bicihkirin.

Kurdnasê navdar Mînorskî jî van bûyerên dîrokî piştrast dike û kurdan wekî bineliyên devera herêma Araratê bi nav dike. Li gorî lêkolîneke Max Büdinger a derbarê dîroka Împaratoriya Romayê de herêma Bazîdê ji sedsala 1em a piştî zayinê pê ve warê kurdan bûye. Serbazê romayî yê bi navê Corbulo dema ku bi artêşekê êriş biriye ser mîrê ermenî yê bi navê Tiridates û gihîştiye nêzikî Elaşgirê, riya xwe guhertiye; bi ser Milazgirê re çûye aliyê Îranê û nexwestiye rastî kurdên Bazîdê were.

Di heyama belavbûna îslamê ya sedsala 7an de artêşên ereban gihîştine devera Araratê, li wir rastî kurdan (El-Ekrad) hatine. Her wisa gelek çavkanî radigihînin ku di serdema navîn de jî bineliyên Bazîd û tevahiya Serhedê bi nifûseke berfireh kurd bûne, di bin desthilatdariya bav û kalên Silheddîn Eyûbî yên Şedadî de serwerên xaka xwe bûne.

Ji sala 1054an pê ve komên selçûkî hatine herêmê; di sala 1071an de wan bi hevkariya kurdên şedadî û mîrên mayîn ên Serhedê bandora bîzansiyan şikandine û heta destpêka sedsala 10an li tevahiya herêmê serwerî kirine. Herêma Bazîdê jî wekî piraniya Kurdistanê û Anatoliyayê di nîvê duyem ê sedsala 14an de rastî êrişên Tîmûrê Leng hatiye; di salên 1386 û 1395an de du caran ji aliyê artêşa moxolî ve hatiye dagirkirin. Qasidê Qiralê Îspanyayê Clavio yê ku di sala 1403an de hatibûye Bazîdê, di bîranên xwe de agehiyên gelekî balkêş û kêrhatî dide. Ev keleha kevnare ya ku di heyama Ûrartûyan de hatibûye jenandin û li gorî çavkaniyan gelekî xurt-parastî bûye, piştî mirina Tîmûrî di meha gulanê ya sala 1421an de ji aliyê artêşa moxolî ya bi bin fermandariya Şahrûh de hatiye dagirkirin.

Zanyarê almanî Moritz Wagner di sala 1844an de derheqa vê kelehê de dibêje ku “avahiyeke bêqisûr e û tenê teyr û baz diwêrin li ser vî zinarî hêlîna xwe ava bikin”. Cara pêşîn arkeologê Fransî Charles Texier di sala 1836an de du destnîgareyên gelekî balkêş ên vê kelehê amade kirine: di yekê de keleh, bircên wê, çend mal û avahiyên bajêr xuya dibin; di ya din de jî du mirov li ber deriyê tirbekê ne, ji wan yek dua dike, yê din jî gopalek di dêst de ye û bizinek jî li ser dêrî xuya dibe.

Di şerên navbera osmanî û sefewiyan de Herêma Bazîdê ji sala 1467an pê ve pir caran ketiye bin serweriya qereqoyunlî, aq-qoyunlî û sefewiyan; lê ji sala 1502an şun de tevahiya Kurdistanê ji aliyê sefewiyan ve hatiye dagirkirin, di encamê de şerek di navbera artêşên osmanî-sefewî de derketiye û beşeke mîrên kurd alîkariya osmaniyan kiriye. Piştî şerê osmanî-sefewiyan, Sultan Selîmî çend malbatên serwer ên bazîdî di gel şerkarên wan birine û wekî serwerên Gurgumê/Mereşê bi cih kirine.

Piştî şerê Çaldiranê yê di navbera Qanûnî Sultan Suleyman û Şah Îsmayîl de, Dewleta Osmanî bi mîrên kurdan re peymanekê girêdide ku li ser wê bingehê her mîrektiyek wekî herêmeke xweser girêdayî dewletê bibe û bi vê peymana ku di Qanunnameya Humayûnê de jî cih girtibû, Bazîd dibe herêmeke xweser a bi destnîşana sancaqa “yurtluk ve ocaklik” (ango war û ocaxa bav-kalên niştecihan). Ansîklopediyeke almanî vê statûya Bazîd û mîrektiyên wekî wê yên di bin banê Dewleta Osmanî de wiha şîrove dike: “Li Kurdistanê sancaqên wekî Bazîd, Mûş, Wan, Colemêrg, Amêdî, Silêmanî, Qereçolan û Zaxoyê hene. Dewleta navendî ji van tenê serwerê Wanê tayîn dike.

Pêkhateya her sancaqekê gelek eşîrên ji vê neteweyê ye û ji aliyê mîrekî ji wan ve tê birêvebirin. Ev sancaq tenê di dema şeran de alîkariya dewleta navendî dikin; lê di dema aştiyê de jiyana xwe ya tam serbixwe didomînin."

Serdema serweriya mîrên silîvî
Hinek çavkaniyên osmanî û bi taybetî jî Şerefname neqil dikin ku piştî sala 1578an eşîra Zîlanê, binemalên Besyan û Bociyan ber bi Bazîdê ve tên, keleha wê zeft dikin û Şehsiwar Beg dibe mîrê herêmê; ji wê demê pê ve malbata vî mîrî heta nîvê duyem ê sedsala 19an li Bazîd û sancaqên wê serweriya herêmê meşandiye.

Gulvedana wêjeya kurdî li Bazîdê
Ji gelek berhemên edebî û nivîsên dîrokî diyar dibe ku Bazîd ji sedsala 17an pê ve bûye navendeke girîng a zanist û wêjeyê. Di medreseya ku şair û fîlozofê navdar Ehmedê Xanî (1651-1707) dabû avakirin de bi zimanê kurdî gelek beşên zanistî dihatin xwendin. Ev kevneşopî ji aliyê şair û dersdarên wekî Îsmayîlê Bazîdî, Muradxan Bazîdî, Mele Mehmûdê Bazîdî û yên piştre jî hatiye berdewamkirin. Dema Ehmedê Xanî di dawiya Mem û Zînê de bi rêzika "Botî, Mehmûdî û Silîvî" qala devokên kurmancî dike, mebesta wî ji "Silîvî" devoka herêma Bazîdê ye; wekî ku berê jî hate gotin, mîrên herêmê û eşîrên herêmê yên wekî Zîlan û Besyanê ji Silîvanê hatibûn û li vir cîwar bûbûn. Xanî di berhemên xwe de behsa du mîrên ji herêma Bazîdê dike. Yek ji wan Mîr Mihemedê Pirbela ye ku Xanî li ser mirina wî di sala 1681an de helbesteke bi sernivîsa "Medhiye û Mersiye"yê nivîsiye; her wiha di beşa çarem a "Mem û Zîn"ê de pesna mîrekî herêmî û hin taybetmendiyên wî daye ku navê wî Mîrza ye.

Ji fermaneke sala 1720î diyar e ku mîrê Bazîdê Mehmûd Paşa ye; ji xwe di çavkaniyên tirkî yên wekî "Sefernameya Rewanê" ya Mustafa Kemanî û "Dîroka Asim Efendî" de jî navê Mehmûd Paşayî gelek caran derbas dibe. Ji aliyekî din ve, Carsten Niebuhr ê danîmarkî di bîranînên xwe yên sala 1763an de li ser rewşa statûya Bazîdê ya heyama Mehmûd Paşayî wiha dinivîse: "Devereke din jî Bazîd e ku nêzîkî Wanê ye û ji aliyê paşayekî kurd ve bi baviksalarî (serweriya ku ji bavan digihêje kuran) tê birêvebirin. Rewşa Colemêrg û Bedlîsê çawa be, statûya Bazîdê jî bi heman şêweyî ye û ev xanedana kurd ji berê ve li vê deverê desthilatdar e."

Piştî mirina Mehmûd Paşayî ya sala 1767an, kurê wî yê bi navê Evdilfetah dewsa wî digire ku berê mîrê Elaşgirê bûye û di heman demê de Evdilah Paşa jî dibe mîrê Elaşgirê. Piştî Evdilfetah jî birayê wî Îshaq Paşa di sala 1771an da dibe serwerê deverê.

Bazîd di dema şerên Rûsya, Osmanî û Îranê de

Di destpêka sedsala 19an de artêşên Rûsyayê daketin başûrê Kafkasyayê û di demeke kurt de li pey hev Gurcistan, Ermenistan û mîrektiyên li Azerbaycanê zeft kirin. Heta van salan nifûseke giran û hêzdar a kurdan li başûrê Kafkasyayê akincih bû. Niştecihên bajarên wekî Rewan û yên mayîn bi piranî ji kurd, ermenî û tataran pêk dihatin. Wekî mînak: dema ku artêşa rûsî dorhêla Rewanê girt, 4000 şerkarên kurd li dijî dagirkirina Rewanê derketin; ev çalakiya Rûsyayê û berxwedana kurdan bû sedem ku dewletên Îran û Osmanî jî leşkerên xwe ber bi van herêman ve bişînin.

Di van salan de rûsan li gorî stratejiyeke dualî hem kurdên akincih ji başûrê Kafkasyayê koçberî aliyê Îran û Osmaniyan dikirin hem jî ermeniyên ji Îranê û herêmên Qers, Erzerom û Bazîdê dibirin û li dewsa wan bi cih dikirin ku bi wî awayî di nava çend salan de demografyaya van herêman guhartin.

Dema rûsan li başûrê Kafkasyayê desthilatdariya xwe xurt kir, osmaniyan jî dest bi bicihanîna Tanzîmatê kir ku li gorî bendên vê rêziknameyê diviyabû desthilatdariyên bav û kalan ên kurdan bihatana hilweşandin û êdî bi awayekî navendî bi destî walî û leşgeran bihatana rêvebirin.

Li gorî çavkaniyên osmanî û bi piranî jî gernameyên gerokên ewropî, piraniya nifûsa sancaqa Bazîdê ji kurdên misilman, pareke êzîdiyan û her wiha ji sê paran pareke ermeniyên file pêk dihat. Hatin û cîwarbûna hin komên tatarî, karapapakî û çerkezî li herêmên wekî Avkevir (Taşliçay) û Elaşgirê jî di nîvê duyem ê sedsala 19an de dest pê kiriye ku cîguhartina wan ji başûrê Kafkasyayê bi destê dewletê hatibû pêkanîn.

Derbarê eşîrên herêmê de Mehmet Hurşit Paşa (1848), Mela Mehmûdê Bazîdî (1857) û Dr. Oskar Blau (1858) lêkolînên berfireh amade kirine. Li gorî van xebatan ligel gelek êl-eşîrên mayîn eşîrên herî mezin ên herêmê Celalî, Zîlan, Heyderî û Sîpikî bûn. Ji ber ku serweriya herêmê êdî ji destê malbata qedîm derketibû û ketibû bin destê dewletê, êdî qaymeqaman bajar bi rê ve dibir; lê dîsa jî dewlet di pêvajoya sepandina sîstema xwe de bi dehan salan rastî gelek dijwariyan hat, ji ber ku gel pir caran ji serwerên dewletê re îteat nedikir û hema salê carekê ew qaymeqam dihatin guhartin. Dema ku Alayên Hemîdiyê di salên 1890î de hatin damezirandin, hema hema tevahiya eşîrên wekî Heyderî, Sîpikî, pareke zîlanî û celaliyan tê de beşdar bûn.

2. b. Tûla
Navê bajêr
Di bareya reh-rîşeyên navê bajarê “Tûla”yê de çend şîrove hene. Di ferhenga Vladîmîr Dahl de wateya “tûla”yê “cihekî veşartî û destpêneketî; paşperde; warê parastin, êwirîn û zindankirinê” ye. Di zimanê tirkî yê kevn de bêjeya “tûla”yê tê wateya “hildan, bi zorê girtin”ê; her wiha di heyama tatarên Konê Zêrîn (Altûn Orda) de jî bajarê Tûlayê aydî Taydûleya jina xanê tatarî Canîbegî bûye û dibe ku navê wê li bajêr hatibe kirin.

Dîroka kevnare ya Tûlayê
Ev dever berê di destê eşîreke slavî ya bi navê Vyatîçî de bûye ku di dawiya sedsala 10an de ketiye bin serweriya mîrekên Kiyevê; ji sala 1054an pê ve bûye pareke bakurê rojhilata mîrektiya Çernîgovê. Di dawiya sedsala 11an û destpêka 12an de mîrên Ryazanê di navbera çemên Tûlîtsa  û Ûpayê de keleheke xurt ava kiriye; bi riya vê keleha leşkerî ya li nava daristanê ji niştecihên Vyatîçî bac berhev kiriye û di sedsala 13an de jî dever ji destê mîrektiya Çernîgovê derxistiye. Di heyama êrişên tatarî de devera Tûlayê mertalekî xwezayî yê li ser riya Moskovayê bûye; lewre mîrên Moskovayê hertim xwestine xaka wê bi dest bixînin û ji ber vê yekê şerekî dirêj ê bi navê Şerê Kûlîkovoyê (1380) qewimiye.  Di sala 1382an de devera Tûlayê ketiye ber pêla êrişên Toktamîş Xanê tatarî; di heman salê de Dmîtry Donskoy û Mîrê Ryazanê Olegî li hev kiriye ku devera Tûlayê ya wêrane bi Mîrektiya Moskovayê ve were girêdan, bi vî awayî devera ku tu carî nebûbû mîrektiyeke serbixwe ji destê ryazaniyan derbasî moskoviyan bû û wekî keleheke parastina tixûbên başûrî yên Mîrektiya Moskovayê kar kir.

Di navbera sedsalên 16 – 18an de
Sala 1509an Vasîlîyê Sêyem ji bo xurtkirina tixûbê deverê keleheke darîn a nû li rexê çepê yê çemê Ûpayê da avakirin; lê vê kelehê nikaribû êrişên tatarî rawestîne.

Lewre di navbera şeş salan de (1514-1520) keleheke kevirîn hate jenîn û artêşa tatarî êdî nekarî bikeve nava kûrahiya mîrektiya Moskovayê. Bi vî awayî bajarekî xurt di nava dîwarên kelehê de pêk hat; malên fermandar û keşîşan, kargehên pîşekaran, dêr, navenda rêveberiyê tê de cih digirt. Her wiha tevahiya nifûsa deverê jî dikaribû xwe bispêre vê kelehê, xwe ji dorpêçkirin û êrişan biparêze.

Di vê navberê de kolan û qadên bazirganiyê hatin avakirin; li ser van kolan û qadan dikanên bazirganiyê, dezgehên pîşesaziyê, embar û kozik hatin bicihkirin. Di vê serdemê de xanê tatarî yê Kirimê Dewlet Gîrey bi artêşeke 30 hezar şervanî êrişî bajarê Tûlayê kir; lê heta ku artêşa qeyser Îvanê Xedar gihişte hawariyê, şêniyên bajêr berxwedaneke xurt nîşan da, hêza tatariyan şikand û sala din ji bo vê serfiraziyê Dêra Pêşeng hate jenîn.

Tûla di seranserî sedsala 16an de her gav rastî êrişan hat û gelek caran ji hêla artêşên Konê Zêrîn û tatarên Kirimê ve hate rûxandin. Di bûyernameyekê (kronîkekê) de rûdanên sala 1596an wiha tên vegotin: “Şervan şikiyan, gelek bajarok û gund hatin şewitandin; eşîr û rêveberên bajêr di gel jin û zarokên xwe dîl hatin girtin, zindan û bendîxane bi gundiyên ortodoks tijî bûn; min bi vî temenê dirêj û gelek bûyer dîtine, lê bi qasî vî şerê qirêj rastî bûyereke kirêt nehatime.” Di nîvê duyemîn ê sedsala 16an de, Dewlet Gîrey pênc caran bajar dorpêç kir û Tûlayê bi taybetî di sala 1552an de gelek êş kişandin. Li gorî efsaneyekê talankerekî bi navê Kûdeyar di sala 1571an de xanê Kirimê yê li Tûlayê dîl girtiye û ew revandiye Moskovayê.

Ji nîveka sedsala 16an pê ve, Mîrekiya Moskovayê dixwest çareseriyekê ji gef û êrişên tatarî re bibîne; lewre di vê çarçoveyê de dest bi çêkirina xeteke xurtkirî ya parastinê kir, hinek astengên xwezayî yên wekî xendeq û dîwaran danîn, li hin deveran jî kelehên darîn ên biçûk hatin dan avakirin û tê de leşker bi cih kirin.
Di sedsala 17an de xetek ji başûr ber bi bakur ve, ango ji Kalûgayê heta devera Ryazanê hate dirêjkirin; bi vê xeta xurtkirî ya parastinê devereke parastî hate sazkirin, êdî Tûlayê bi rêzekelehên li dora xwe ve vegeriya cihekî navendî, ewlehiya tixûbê xwe yê başûrî pêk anî û ji derbên sereke yên êrişan rizgar bû. Heman sedsalê di nava bajarê parastî yê Tûlayê de gelek dêrên darîn hatin jenîn; di sala 1595an de sih hesinkar li rexên çep û rastê yên çemê Ûpayê bi cih bûn û mafê devereke pîşesazîyê ya xweser bi dest xist. Di destpêkê de, ji ber vê rewşa tirs û sehmê piraniya niştecihên vê deverê leşker bûn, hejmara dikandar û bazirganan kêm bû; lê dîsa jî bajar hêdî hêdî vegeriya navendeke berbiçav a hilberînên hesinî, piraniya kanên hesinî yên li derdora Tûlayê hate dîtin, bi vê yekê re aboriya bajêr geş bû û êdî li ser çemên Oka û Volgayê keştiyên veguhestinê jî hatin çêkirin.

Di sedsala 17an de, li Tûlayê çend bûyerên siyasî qewimîn; di navbera leşkerên fermî û hêzên xwebexş ên herêmî de şer û pevçûnan dest pê kir. Di navbera salên 1605-1607an sê serhildanan rûda û her wiha sê caran jî ev serhildan rastî tepeserkirinê hatin; ji aliyekî din ve êrişên talankerên tatarî jî ranewestiyan. Fermandarê artêşa Mîrekiya Moskovayê Vasîlî Şûskî ji bo şikandina berxwedana dagirkeran serî li çareseriyeke awarte da; çemê Ûpayê berda ser bajarê Tûlayê û bi lehiyê bajar hilweşand. Di vê navberê de bajar bi Mîrekiya Moskovayê ve hate girêdan û vegeriya xeteke parastinê; her wiha ji ber ku biyargehe leşkerî li vê herêmê hate avakirin, rewşa bazirganî û pîşesaziyê ya bajêr bi pêş ket.

Pîşesaziya hesinkariyê gelekî geş bû, dîsa avahiyên xurt û çend dêrên mezin li bajêr hatin jenîn û di navbera dîwarên bajarê parastî de rengekî bazirganiyê yê geş hate dîtin. Di 1632an de karsazê holendî Viniyus destûr ji Qeyser Mîxayîl Fedorovîç stand ku yekem fabrîkaya çekan li Tûlayê ava bike; li pey wî, hevalên wî Peter Marselius û Philemon Akema jî li nêzikî Tûla fabrîkayên xwe saz kirin, hem keresteyên leşkerî hem jî pêwistiyên malan hilberandin.

Sedsala 18an di dîroka Tûlayê de gelekî girîng e; ji ber ku qeyserê rûsî cara pêşîn destûr daye pîşesazekî herêmî ku kargeha xwe ya çekan veke û dest bi hilberandina tivingan bike Di sala 1712an de fabrîkayeke çekan a rûsî jî hate vekirin; piştî wê Bataşev, Mosolov û pîşesazên din jî fabrîkayên xwe yên çeksaziyê ava kirin. Bi destpêkirina şerê swêdî-rûsî re, Qeyserîya Rûsyayê biryar da ku hilberîna çekên rûsî xurt bike; lê belê çeksazên li fabrîkayan  mehaneyên hindik distandin, ji ber vê yekê wan bi neçarî dest bi hilberandina pêdivî û amûrên malê yên metalî kir ku bi firotana van berheman aborîya xwe dabîn bikin. Piştî demekê, Qeyserîya Rûsyayê biryar da ku bi riya çêm Moskovayê bigihîne Deryaya Azov; li gorî vê biryarê heke çemên Oka, Ûpa û Şat bigihîştana Gola Îvan û çemê Donê vê yekê dê çarenûsa Tûlayê biguherta û ew bikira bajarê herî girîng ê li ser vê riya çêm. Her çiqas di sala 1707an de karwanê keştiyan ê yekem ji Tûlayê derbasî deryayê bûbû jî, berjewendiya hêvîkirî jê nehat bidestxistin û proje hate pişguhkirin.

Di vê navberê de, li ser li qeraxên çemê Ûpayê avahiyên aydî çeksazên zengîn xuya kir; bi bexşîşên vê çîna zengîn dêrên wekî Voznesenskî û Nîkola Zaretskî hatin jenîn, kelehên kevn ên darîn hatin hilweşandin, li şûna wan kelehên kevirîn hatin çêkirin û di dawiya sedsala 18an de Tûla wekî navendeke mezin a pîşesaziyê navdar bû. Her wiha Tûla wekî bajarê sereke yê eyaleta nû hate damezirandin û pîrozbahiyek ji bo vê bûyerê hate li darxistin. Piştî bidawîbûna pîrozbahiyan sazî gelemperî yên dewletê û avahiyên wan hatin çêkirin û di 30 salên paşîn de bajêr bi rengekî berbiçav dîmena xwe guhert. Ji aliyekî din ve, serjimariya bajêr a ku di 1777an nêzîkê 9 hezarî bû, di nava sedsalekê de gihîştibû 57 hezarî.

Tûla di navbera sedsalên 19 û 20an de
Di destpêka sedsala 19an de, pêla şerên bi Napolyonî re bilind dibe û girîngiya Tûlayê wekî navendeke pîşesaziyê ya hilberandina keresteyên pêwist û çekan zêdetir dibe. Bi vî awayî ev bajar dibe navenda sereke ya dabînkirina çekên artêşa Rûsyayê û çeksaz di seranserî şerên 1812an de bi xîret dixebitin; ji aliyekî din ve, kapasîteya çeksaziyê ya bajêr tê bilindkirin, kargehên taybet ên din jî tên vekirin, navendên perwerdehiya leşkeran tên vekirin. Di vê maweyê de hilberandina semaver û amûrên muzîkê jî pêş ketiye û ev berhem li seranserî Rûsyayê navdar bûne; lê belê li gel pêşketina pîşesazî û bazirganiyê, asta çandî û civakî ya bajêr gelekî nizm bûye. Lewre di sala 1830an de gelek saziyên perwerdehiyê li Tûlayê hatine avakirin; semînerên ayînî hatine lidarxistin, dibistaneke serbaziyê û pirtûkxaneyeke giştî hatine vekirin. Her wiha rojnameya parêzgehê ya bi navê “Guberskî Vedomostî” di sala 1838an de dest bi weşanê kiriye; di navbera salên 1870-1873an de gelek fabrîkayên tivingan hatine vekirin û kalîteya hilberandinê hatiye bilindkirin, atolyeyên semaveran bi lez cureyên xwe zêde kirine, têkiliyên aborî yên bajêr ji berê kûrtir û dirêjtir bûne.



Di dawiya sedsala 19an de, ne tenê saziyên perwerdehiyê yên asayî, lê her wiha pispor û dibistanên kevneşopî jî li Tûlayê kar dikir.

Di dawiya sedsala 19an de, ne tenê saziyên perwerdehiyê yên asayî, lê her wiha pispor û dibistanên kevneşopî jî li Tûlayê kar dikir; xwendingehên pîşekarîyê yên cebilxaneyan, peymangehên perwerdekirina çawîşên pispor, dibistanên li ser bikaranîna hesinî jî hebûn. Ji heyama sala 1856an heta sala 1897an serjimariya Tûlayê ji 114 hezar kesî derkete du qatî wê; ji bo sererastkirina rewşa darayî û aborî ya bajêr, bankên yekem derketin holê. Her wiha bi beşdariya fînansorên darayî yên ewropayî fabrîkayên berhemên hesinî, fabrîkayên metalan û santralên elektrîkê hatin avakirin.

# Çayan Okuduci



## Ji we re çi lazim e

min bi dilê xwe î germ
bi hindir xwe î kelecanî te maç kir
di navbera guh û milên te de
me hînek vexwarî bû pîçek em meyxweş bûn
û parîkî ji em birçî bûn
yeko yeko ji xwe daketin
em gihîştin kersexa bêav û bêsî

di fecabookê de tinê bû
li tîwîtire de ji min nedî
li helbestek weşandî de min denge te wê seh kir

ji me re 'ê' yek bi şewqe pêwist e
ji me re dengek lazim e
ji me re hestên bi ar û bêar lazim e
li kelekê dinya heye pêlî wî bike
dibe ku em ji dinyayê bişîqitin
hêvî li ser hêviyan top kiribû bo axek û avek azad

em ne mirovên wisan in ku bi dilrawestî bicehimin
em ne mirovên wisan in ku di nav ciyan de jî bimrin
em bi leneta ku li ser piyan dimrin em ji wan in
dê kerem ke: mirin û ez em û wan
tu behna xwe firekê

ji we re hînek ji beleya Mûşê gelek jî berf lazim e
ji we re ewe ku ne ji we nin sancoyên wan lazim e
ji we re di waletê xwe de çavek dîl ketî lazim e
ji we re mirinek bêveger lazim

em hemû pirçî bûn bo qedehek av
dê bes negrî min di hindere xwe te maç kir
em hemû serxweş bûn hindik bûn kêm bûn
min bol bol vexwarî bû ji êşên te î sedsalî.

# WELAT BAZÎDÎ


## Gazina Jinikê Li Mêrê Malê

- Tu qet alî min nakî, kar û barê malê giş di stûyê min de ye. Heta êvarê nig di bin xwe ve nakim. Sibê zû radibim, dewar-mewarê malê alif dikim, cî-miyan radikim, paşê xwarin-marinê hazir dikim, dûre hevîr dikim, nan-man lêdixim.

Piştî wê jî wexta bêriyê ye, diçim pez-mezê malê didoşim, kinc-mincên qilêrî dişom. Welhasil ji sibê heta êvarê pişta xwe rast nakim.
Tu jî wek mîra heta êvarê bi kêfa dilê xwe digerî, qet nabêjî welle hema ez jî destê xwe bavêjim ji karekî de.
Ma ez hesin im?
-Mêrê jinikê got:
-Xanimê, welle giliyên te giş rast in û di cî de ne. Hema ji îro şûnde emê karê malê bi helalî li hev par kin, nivî tuyê bikî û nîvî jî ezê bikim.
Jinikê got:
-Çawa?
Go:
-Sibê zû emê rabin, tuyê dewêr alif bikî, ezê jî mewêr, tuyê ciyan rakî, ezê jî miyan, hevîr tuyê bikî, mevîr jî ezê, xwarinê tuyê hazir bikî, marinê jî ezê bikim, kincên zarokan tuyê bişo, mincan jî ezê, nan tuyê lêxî, man jî ezê, pezê malê tuyê bidoşî, mez jî ezê bidoşim.

Yanî ji niha û pêve emê hemû karên xwe nîvî nîvî bikin, bila barê te jî hinekî sivik bibe...





# ŞEFÎQ ÎSA

## KURÊ DÊLAN

Kurê dêlan
çokên min diwestane
Ji danînê
Nema îdî
Diraxim tejbera çopê
Nama piştê didaqûlim
Ji tirsa agir û topê
Mi destê xwe dişuştiye ji laklakê
Mi pişta xwe girêdayê bi vê xakê
Werin..
Nikarê kes ji koka dil rehên jîna ebed rakê
Werin werin
Kurê dêlan
Cîhan pêkve
Li bihna goştê min şêlan
Lê xewnên we dibin şevbest
Û doza we dibe leylan
Ev e ya ku di pêşî de
Ji bo wê we dikir dîlan
Kurê dêlan
Werin ..werin
Bi saxî hûn mi nabînin
Di bin lingan
Bi kîna reş
Li min rakin hezar cengan
Dizanim ku leystoka we ava ye ji bedrengan
Lê rengê min
Buye awaz di nêv dengan
Bila bimrim
Heya kêla mi şanaz e
Di nav kêlan
Bila bimrim
Lê ne li gor werîsê we bibim hêlan
Kurê dêlan.


# Abdullah Yavuz
## Halê Min e Ev


Cihan dagirtiye ji şahî û kêf ê
Hezker direqsin li ber daholê defê
Qet haya te jê nine ku çendîn roj e
Min serî ranekiriye ji ser balîfê

Hêz nîne ez rabim dakevim jînê
Jana nebûna te rûniştiye li ser sînê
Dilê min dagirtiye ji elem û xwînê
Bêyî te heram e li min jîyan li vê
dinê

Ku da herim nikarim ji te bikim rev
Te dibînim bijangên min her diçin
ser hev
Westiyayî me bêxewim dîsa wekî
her şev
Ne gazinc e horiya xewna halê min
e ev.







# Kamran Simo Hedilî

## HELBEST Û FELSEFE


Mirov dikare bêje, helbestvan û feylezof hevalên hev yên li rêwîtiya dîrokê ne.
Ji destpêka dîrokê ve ew qasî nêzîk bi hev re meşîne, mirovan gelek caran ji helbestvanan re gotine feylezof û ji feylezofan re jî gotine helbestvan.
Mirov dikare peyamberan jî tevlî vê meşa helbestvan û feylezofan bike.

Peyamberan jî hemû peyamên xwe yên olî bi peyv û sembolên helbestwarî gotine û nêrînên xwe weke feylezofan anîne ziman. Lê mijar ne li ser têkiliyên helbest û peyamên olî ye. Mijar li ser têkiliyên helbestê û felsefê ye. Helbest û felsefe du amûrên ku ji destpêka dîrokê ve mirovan hizir û ramanên xwe bi wan bi pêş ve birine.

Bi pêşveçûna mirovan re, ew jî pêş ketine, xwe nû kirine û bûne du çavkaniyên pêşketina mirovahiyê.
Ji serdemên pêşî heta roja me, mirovan bi saya helbestvan û feylezofan hizir û ramanên xwe nû kirine û kirinên nû li kirinên xwe yên kevin zêde kirine.


Gelek kirinên xirab ji jiyana xwe derxistine û li cihê wan xisletên xirab yên qenc danîne. Hin kes felsefê ji helbestê cuda dikin û wisa bi peyvên hişk û ziwa tînin ziman, xwendevan di xwendina felsefê de diwestin. Hin jî helbestê ji felsefê cuda dikin û helbestê bêmebest, tenê bi peyvên xweşik nîşan didin. Di nêrîna min de ev nêrîn gelekî çewt in û zerarê didin xwendevanên felsefê û helbestê. Ez dihizirim ku felsefe û helbest her jiyana xweş, şad û serkeftî nîşanî me dikin. Ji ber ku erkê felsefê û helbestê çanda mirov, bîr û ramana mirov bi pêş ve birine. Helbest û felsefe têgihînan hemûyan bi hev re dibêjin. Lê di felsefê de pêşî aqil tê û di helbestê de hest tên. Her du jî, di noqta giştî de li zanîna tiştan, sedem û mebestan dinêrin. Em dizanin ku zanist, beşên pîşe û tiştan ji hev cuda dike û dide naskirin. Lê feylezof û helbestvan mijaran bi giştî digirin destên xwe. Bi hûrlênêrînê li sedeman dinêrin û pirsa mebestan dikin. Li vir divê ev jî were gotin, bi wekheviya wan re, cudabûna wan jî heye. Helbest strana dil e û felsefe ya aqil e. Helbest tevgera hestan dide destpêkirin û giraniya lept û daxwazên hestan li ser xuya dikin. Felsefe, tiştên ku dide naskirin, ji hev cuda dike, wan tênê hemberê hev, didarizîne û digihê zanîna dawî. Divê ev baş were zanîn ku helbest û felsefe du curên têgihîştinên cuda ne. Yek navê beşekî hunerî ye, ya din navê hizirkirina bipergal û zanîsta giştî ye. Helbest û felsefe bi xîzikên tûj ji hev cuda nebin jî û gelek layên wan weke hev bin jî, du beşên cuda ne.

Ev mijar, mijareke ku gelek caran tê ber çavên mirov. Di helbestê de huner li pêş be jî, di gelek helbestên hin helbestvanan de felsefe xwe derdixe pêş. An jî huner û felsefe bi hev re di nav helbestên wan de dimeşin. Helbestvan jî, mîna feylezofan pirsan ji yên berî xwe dikin û bersiva yên li paş tên didin. Helbestvan afirînerên pêşerojê ne û mafê wan e ku raboriyê rexne bikin. Mirov her tiştî deyne aliyekî, helbestvan jî temaşevanên dema xwe û ya vê jiyanê ne. Temaşevan qet nebe, leyîstike ku lê dinêrin ecibandin, an ne ecibandina leyîstikê mafên wan e. Dibe ku leyîstik li xweşa wan biçe an neçe.










Tê zanîn ku pirskirin karê feylezofan e. Ew bi pirsandixwazin bigihên armancê. Felsefa xwe li ser bingehê pirsan ava dikin. Lê helbestvan jî, pirsan dikin û dixwazin bersiva pêşerojê bidin. Ez kî me? Ez çi dikim? Di cîhanê de cihê min çi ye? Erkê min çi ye?

Ji bo çi têgihîştina me têra têgihîştina gerdûnê nake? Çima temenê mirov wisa kurt e? Di vî temenê kurt de mirov çi ji hev dixwazin? Çima di nav aştiyê de nikarin bijîn? Û weke van pirsan gelek pirsên din ji xwe dikin. Li nav pirsan digerin û dixwazin bersivekê bibînin. Li xwe dinêrin û li civata bêxem dinêrin.

Him pirs û bersivên xwe tînin ziman û him ji civata bêxem re dibêjin: “Serkaniya nexweşiyan di van pirsan de ye, hûn jî bi min re li wan bigerin.” Carinan pirsên helbestvan nayîn fêhmkirin.


Ji bo ku him bi dengê bilind dipirsin û him ser pirsên xwe dinixumînin. Heta ji wan tê bi sembolan pirsên xwe tînin ziman. Lucretius Carus ji bo têkiliyên felsefê û helbestê wisa dibêje; “Felsefe şerê Tîtanan e,(Ehrîman) helbest jî, di afirandinê de bi Yezdanan re di pêşbirkê de ye.”

# SEYFEDÎNÊ WELEKORÎ



## Navê Min

Navê min Efrîn e
xaka min pirr qedîm e
dîroka min zêrîn e
zimanê min nerm û şirîn e
peyvên wê bi Kurdî ne
çevên min zeytûnî ne
kiraseke li bejna min e
ji xemja qîza belga hêşîn e
dilê min bi kul û keder e
tev bi elem û birîn e
neyarên min ereb û ecem in
ser kêşê wan roma xayîn e
ne camêr ne jî mirov in
tev weke hirç û hov in
çewte çewte wan e
weke keftaran e
nizanin ew der axa Kurdan e
hêlîna teyrê baze li bilindan e
pir cangorî û egîtan e
ji bo wî canê xwe dane
bi sond be em ji bo te
canfeda ne canfeda ne.







# MEHMÛD RONÎDAR

## BERFÎN

Bi sirra êvar re
Bêhna te digirim

Bi bayê berbangê re
Dengê te dibihîsim

Çend mij û moran
Çend bahoz û boran
Bûn nêvanê paşila te
Nizanim
Lê ez diçim

Bi hemû xewn û xiyalên xwe ve
Diçim seyra ramiyarê

Li pelên te
Li pelên te yên nazdar
dinihêrim
Navê te distirêm bi şev û rojan
Bi meh, demsal û salan
Navê te tîb bi tîp
Navê te kîte kîte
Wek zincîrek qetiyayî
Di dilê min de
Belawelayî
Bê hewldan
Serberidayî
Bêxem
Berfîn.



# BÛBÊ ESER

## ZÎNDANA DİYARBEKİRÊ Û ENFAL

Li gor min di jiyana gelê me de du nokteyên reş, du nokteyên herî bi êş, du nokteyên herî hov û du nokteyên ku mînakên wan li vê cîhanê rû dabe tune ye. Ji wan yek zîndana Diyarbekirê ye ku ez bi xwe jî nêzî sê salan tê de jiyam (2-1-1980---19-05-1982) Ya din jî enfala ku li başûrê Kurdistanê pêk hatibû ye. (Min nêzîkî salekê li başûrê Kurdistanê li ser vê jî kar û xebat kirî ye û heta niha sê berhemên wan weşandiye û yek jî li ber çapê ye) Min xwest van herdu bûyer û kiryarên qirêj binim ba hev da ku em bikaribin fêm bikin bê çima ez dibêjim zîndan û enfal??? Min xwest hinekî rewşa wê zîndanê di vê nivîsê de vekim û sedema herdu bûyeran bînim ba hev û bi kurtasî vê şirove bikim.

Dema Ciwanên kurd piştî derbaya leşkerî ya di 12 îlona 1980 li tirkiyê û bakurê kurdistanê pêk hatibû, hatin girtin û ketin zîndanê. Armanc û hedefa dagirkeran jî ew bû; ji bona keç û xortên kurdan hemiyan li gel malbatên wan di wê zîndanê de û yên li derveyê wê zivêr ango aciz bikin ku yên di zîndanê de bûn bibim tirkê baş û malbatên wan jî dev ji doza kurd û Kurdistanê berdin. Lewra jî di wê zîndanê de hema çi şikil û metodên êşkencayan bêne bîra we û me, ew hemî di wê zîndanê de li me û li wan ciwanên girtiyên di virde ceribandin.

Bi saya wan êşkenceyan gelek kes di wê zîndanê de kuştin, gelek dîn û şêt kirin, piraniya wan seqet hiştin û yên mirov digot qey saxlem in, ew jî piştî demekê her yek ji wan bi nexweşiyekê ketin û ji nava me çûn. Hin hê jî dijîn di warê nefsî de ne zêde baş in.

Ev ne bes bû, bi sedan kesan di wê zîndanê de xadim kirin. Ji ber ku wan bi xwe digot: ”Piştî zîndanê heger tu zewicî be, êdî tê nikaribe here ba jina xwe, heger tu azib e,  êdî tê nikaribe bizewice”. Weha jî kirin.

Wan digotin: ”Piştî ku tu ji vê zîndanê derket, divê tu êdî zimanê xwe bi kar neyne, ji ber ku di virde me ew perwerdayî daye te. Hûn bixwazin jî hûnê êdî nikaribin bi zimanê xwe qise bikin, bixwînin û binivîsînin. Weha jî bû.

Wan digotin: ”Em ê li malbatên we, dê, bav, xuşk û brayên we weha bikin ku ew ji ber vê eziyeta ku em ê li wan bikin wê êdî ji doza hûn ji bona wê ketine vê zîndanê berdin. Weha jî bû.

Pir tişt hene ku divê mirov binivîsîne lê ez ê di vê nivîsê de weha nakim.

Kin dibêjim û hêvîdarim hûnê tê bigihêjin ku sedema vê nivîsê çi ye...

Tiştên min nivîsîn an ew gotin, helbet ne sedî sed e. Lê li gor min bi piranî dagirker û karbidestên wê zîndanê bi serketin.



*Enfalê çi anî û bir?*
Dema enfalê destpê kir, armanc û hedefa Seddam ew bû ku dema mêr nemînin wê jinên wan nikaribin zarokên bi çûk mezin bikin, ji bona jiyaneke nû berxwe bidin.
Çi digot Seddam? Wî her digot: ”Yên bûna bela serê me Barzanî ne, heger ez jinên wan bê mêr bihêlim, êdî ev doz jî têk dihare û ez ê bi serkevim”. Lê weha nebû.
Wî digot; ”Heger ez zilaman nehêlim wê êdî zorak çê nebin, piştê demeke dûr û dirêj çê jî bibin ewên bi min û terbiya ku ez ê bidim wan dê mezin bibin”. Lê weha nebû.
Seddam digot: ”Heger ez malên wan bi ser serê wan de xerab bikim, wê perîşan bibin, bê nan û av bimînin. Wê ji bona pariyek nan xwe bavêjin bextê min da ku ez wan efû bikim, nan û avê bidim wan da ku ew jî dev ji doza xwe berdin”.. Lê weha nebû.
Heger çiqasî girtiyên zîndana Diyarbekirê di wir de rastî lêdan, êşkence û kiryarên hovane hatin jî, çi tiştên xerab hatin serê me, hema bêjin ne kêmî wê diaînin serê zîyaretçiyên me jî. Armanca wan ji vê ev bû, me û malbatên me ji doza kurdistanê dûr bixin.
Loma ez dibêjim dagirkerên me, bi saya zilamên xwe yên berpirsiyarê wê zîndanê heger ne bi temamî jî be, bi serketin.
Ji ber ku piraniya kesên ji wê zîndanê derketin, wan bi xwe kurdî li xwe û li zarokên xwe û li malbatên xwe qedexe kirin. Bi tirkî xwendin û nivîsandin. Dema jiyan bû bi tirkî li gor wê jî mejî şikil digire û ew mejiyê ji bona kurdistaneke serbixwe ketibû wê zîndanê, dema derket ew doz û ew zîndan ji bîr kir.

Lê dema li başûrê kurdistanê enfalê ji Barzaniyan de destpêkir (31-07-1983) Heta jin û zarokên bi çûk, mabûn ku piştî demekê hatin ser hêşê xwe weke Seddam dixwest nekirin. Eksê wê wan iinên qehreman zarokên xwe bi ruhiyeta neteweyî weke pêşmêrge mezin kirin.
Her keç û xortekî temenî wî/ê bi ser 15-17 diket, dibûn pêşmêrge û direviyan nava pêşmêrgeyên li serê çiyan bûn.
Wan bi şer û tekoşîna xwe, bi hêz û qawetên xwe, bi îmkanên hema hema bêjin tune, berxwe dan, bi azadiya başûrê kurdistanê tola bav, ap, xal, xaltîk, û dêyên xwe bi ragihandin azadiya başûr kurdistanê hilanîn..
Lê yên ji wê zîndanên derketin li gel malbatên xwe çi kirin?
Dev ji zimanê xwe berdan, ew zimanê şêrîn wan bi dest û helwestên xwe kuştin. Ew kuştin lê zimanê tirkan xurt kirin.Berhemên xwe û siyaseta xwe êdî bi wî zimanê qirêj domandin û nivîsandin.
Ji ber vê ye, kesên ji wê zîndanê derketin, hema bêjin piraniya wan dixwazin wê ji bîr bikin. Loma em nikarin komîteyekê demazrînin ku doza wê zîndanê di qada navneteweyî de biparêzin û dagirkeran bidin mahkemên navneteweyî...
Ji ber ku dagirker baş dizanin; dema ziman nema gel jî namîne, doza kurdistaneke azad û serbixwe jî namîne. Lê...
Zîndana Diyarbekirê û enfala li başûrê Kurdistanê pêk hatibû dê tu caran neyê ji bîr kirin. Loma divê em kar û xebatê bikin da ku dagirkeran di qada navneteweyî de bixin mahkeman û wan herduyan bi vî sucî bidin cezakirinê.

# KEYHAN MİHEMEDÎNİJAD

### DİLDARÊ HELBESTVAN Û WELATHEZÎ Û NÎŞTİMANPERWERİYA WÎ



Ey reqîb maye qewmê Kurd ziman, naşikê û danayê bi topê zeman.
Helbestek ku ji aliyê “Yûnis Reûf” naskirî bi “Dildar” ve hate afirandin bû bi sirûda netewî ya netewa Kurd.
Bajarê Koye ku ser bi Başûrê Kurdistanê ye, nêzî 20 helbestvanên navdar têde hilkevtine. Ev bajar ê Hacî Qadir Koyî û Melay Gewre û Dildar e.
“Yûnis Reûf” naskirî bi “Dildar” helbestvanê welathez û nîştimanperwer di bajarê Koyê de, li sala 1918`an hatiye dinê.
“Yûnis Reûf” an jî mamoste “Dildar”, li sala 1927an diçe dibistanê û dest bi dersxwandinê dike. Sala 1941an di warê yasayî de bo zanîngeha Bexdayê derdiçe.
Sala 1945an xwendina xwe ya zanîngehê dawî pê tîne. Piştî sê salan û li rêketa 11`ê Kanûna Yekem a sala 1948an li Hewlêrê canê xwe ji dest dide. Belkî di gotarek wiha de mirov nekare bi başî Dildarê helbestvan binirxîne, lê emê hin bandorên wî li ser netewa Kurd û jiyana wî bi we xwenerên hêja re bas bikin.

Dildar xet û nivîseke ciwan hebûye, bilî zimanê Kurdî, zimanê Erebî, Tirkî, Farsî û Îngilîsî bi başî zaniye û heta qasekê jî zimanê Feranseyî jî zaniye.
Ew di nivîsîna latînî de jî gelek şarezar bûye. Wî gelek hez li stranên folklorî kiriye û nemaze lawik û heyran gelek pê xweş bûye. Mamoste Dildar ne tenê bi hest û sozeke nazik yan jî bi helbest, xeyalên xwe yên pir hêvî û nalebar pirsgirêkên Kurdan çareser dikirin, belkî wekî gelek xortên xebatkar hate nav meydana têkoşîna pir metirsî ya siyasî. Pêka pertûka mamoste “Ebdullxaliq Elaedîn” a bi navê “Dildar Şaîrî Şereşgerê Kurd”: Mamoste Dildar di sala 1938an de tevlî Partiya “Hîva” bûye û her bi sedema jêhatî û bi şiyanbûna wî, ew di heyameke kin de bû bi sekreterê vê Partiyê. Wî hewil û zehmeteke zêde di pêxema pêşxistin û bihêzkirina wê Rêkxistinê de da.
Piştî hin arîşeryan ku di sala 1944an de Partiya Hîva ji nav diçe, lê Dildar roj bi roj hestên wî bihêztir dibûn û her ew bûne sedem ku Dildar rêbazeke din a siyasî bigire berahîka xwe û li sala 1946an de tevlî Partiya “Teheror” wate “Partiya Rizgarî” bû û ew di wê Partiyê de yek ji endamê bikêrhatî û xwedan hizir bû.
Ew di nav xelkê xwe de stêrkek ronahî bû. Ew hemû çalakiyên siyasî yên ku Dildar têde dijiya, bû bi sedemê vê ku bîr û hizra netewî li cem wî helbestvanê zêdetir geşe bike û roj li pey rojê hesta wî bo ax û nîştimanê zêdetir bin. Dildarê helbestvan li derheq bîreveriyên xwe û xwepêgihandina xwe li warê dîroka Kurdayetî de wiha nivîsiye:

Min bi hesteke hemasî ve di pirtûkxaneya birayê xwe Seidî de dest bi xwendinê kir, û min li pêş hemû tiştekê de dîroka Feranse û Yûnan bi zimanê Tirkî xwand, piştre min her sê cildên pirtûka Îstîqbal a Celal Nûrî xwand û dîroka Kurd û Kurdistan a Emîn Zekî Beg û dîroka Baban û Soran û Mokriyanî ya Seyîd Husên Suznî bi Kurdî xwend. Wan pirtûkan siloganên derbasbûyî anîne ber çavên min û min digel xwe beravird dikir. Êdî min got ez hêdî hêdî mêjiyê xwe vekim û nirxandina dîrokê bikim”.
Dildarê helbestvan pêş vê ku biçe nav dinyaya helbestnivîsînê, bi xwe di vê derheqê de wiha nivîsiye: “Min dîwana Nalî gelek bi hûrî dixwand û helbestên ciwan ên Nalî digel helbestên bi soz yên Hacî Qadir di nav mêjiyê min de li ser serweriya wêjeyê şer dikirin. Di vê şerê de tiştek bi min re hate bexşîn, gelek xeyalên wisa di mêjiyê min de hebûn ku min hez dikir di nav xelkê de bînime ziman, min xwe ceriband ku ez dikarim helbestan vehûnînim. Ez şevekê heta direngê şevê nerazam û min karî qesîdeyeke 15 beytî bivehûnînim, min di nav helbesta xwe de li ser dayîkekê nivîsîbû ku bo xortê xwe yê hatî kuştin çawa digiriya!  Eva yekem helbest bû ku min vehûnandiye, ma min his nebû? Yan jî genc nebûm? Belê min hem his hebû û hem jî ez genc bûm. Lê dema ku Nalî ez bo dildariyê radikêşandim û wê demê Hacî Qadir jî ez bo nîştmanperweriyê radikêşandim, wan du helbestvanan bi awayên cuda bandora xwe li ser dilê min hebûn. Lê xwendina dîrok û dilê min ê bi soz û his û xizmetkirina min, bo aliyê Hacî Qadir ve dibir. Her ku min dixwest xezeleke dildarî bêjim, dengê pîroz ê Hacî Qadir bi ser min de dihate qîrandin û digot:
"Basî zolfî dirêj û çavî bexew Nebirawe bûwe trrî xesrewe”
Êdî ez neçar dibûm û min destê xwe yê pênûs têde şil dikir û hizra xwe diguherî”. Mamoste Dildar gelek hêvî bi paşeroja netewa xwe hebû. Ew hertimî hêvîxwazê bexteweriya gel û azadiya nîştimana xwe bûye. Dildar helbestvanekî hilkevtî yê bilind û bi behre bû. Tiştek sereke û bingehîn ku bandordar bû li ser helbestên Dildar, dîmenên xweşik û xemlîn yên Kurdistanê ku bi radeyekê hest, soz û bîr di xeyalên wî de afirand, û wekî dildarekê germiya ciwaniya wî hejandiye ku ew jî di wê helbesta wî de bi ciwanî derdikeve.

Kurdistan xoş nîştîmanî ciwan
Tu qîblegahî min î bê guman
Çavim pişkevtûy şaxekanit e
Fêrî jiyanî baxekanit e
Dengî şimşalî şivanekanit
Qaspey kewanî qed kêwekant
Xorî avekey nişîvekant
Emane hemûy goya kirdimewe
Hêvînî şî`irî diliyan girtimewe

An jî Dildarê helbestvan bi afirandina helbesta xwe ya bi navê “Ey Kurd”, basa bê dewletiya Kurd û paremayiya Kurdistanê dike û tê de gotiye hemû welat gihan bi serbixweyiya xwe lê her tenê tu mayî.
Helbesta Dildar a bi navê “Ey Reqîb” mînaka herî bilind a helbestên siyasî yên Dildarê helbestvan e. Dildarê helbestvan herçiqas 30 sal jiya, Lê wî karî cihê tiliyên xwe li ser tevgera dîroka helbestên hevçerx yên Kurdî bi cih bêhle û zêdetir bi helbestvanekî şoreşvanê Kurd bê nasîn. “Ey Rqîb” ku wekî sirûda netewî di nav netewa Kurd de bi nav û bang e, bûye sembola netewî û ev hindeyê din Dildarê helbestvan mezintir kiriye. Sirûda netewayetiya “Ey Reqîb” li serdemê Komara Kurdistanê de bû sirûda neteweyî û heta niha jî Ey Reqîb di her çar parçên Kurdistanê de sirûda neteweyî û nîştimaniya Kurd e. Ew sirûda, bas ji bûna Kurd dike, ji ber vê yekê bûye sirûda neteweyî. Dildar di pileya yekem a jiyana xwe de serkevt, lê di pileya duyem de ecelê pêsêra wî girt û nehêla di pileya duyem a jiyana xwe de serkevtî be. Wî gelek hêvî digel xwe birin li jêr axê û wekî Hacî Qadir Koyî gotî:
“Merg û jîn mîslî sêber û taw e – Evey baqî bimênê her nav e”.
Belê ya ku niha maye, nav û huner û welatparêziya navdarê Kurd mamoste Dildar e.
**Çavkanî:** Pirtûka mamoste “Ebdullxaliq Elaedîn” a bi navê “Dildar Şaîrî Şoreşgerê Kurd”

# Ji bo çêkirina e- kovaran.

# MÎTANNÎ AJANS

## Ji bo Têkîlî:

mitanniajans@gmail.com

